

NÛDEM

No 11 1994



Kovara Hunerî, Edebî û Çandî

ŞEVÊN SPI

Dostoyevski

Weger: Riza Ömer



SEDEM

Digel ku ev zêdeyî sed salî ye di ser Dostoyevskî re derbas bûye jî, hê ew bi zewq û heyecan tê xwendin, berhemên wî mîna piyes li ser dik û sehneyên çîhanê bi xurtî têne lêstin, ji aliyê temaşevanên ve bi balkêşî têne temaşekirin.

Sedema ku heta niha Dostoyevskî aktuelbûna xwe parastîye ew e, ku ew ji peyvên pûç û vala, ji gotinên tûj û sloganî dûr, lê bi gotinên tije mane, mîna psikologekî jûr dadikeve kûraniya ruhuyeta kesên û dibe şîrkê rebenî û perîşaniya wan.

Di Şevên Spî de Dostoyevskî perîşani, şerpezeftî, tenêftî, rebenî û evîna du mirovên dilpak; Nastenkaya hîvdeh salî û xortekî bîst û şeş salî, bi hosteftî tîne ziman.

Weşanxaneya me pirtûkxaneya kurdî kiriye xwediyê vê berhema hêja.

Bi hêviya ku wê bi dilê we be...



MIŞK Û MIROV

John Steinbeck

Weger: Riza Ömer



SEDEM

Xelatgirê Nobelê yê 1962'an John Steinbeck, yek ji nivîskarên çîhanê yê bi nav û deng û xwediyê cihêkî bi rûmet e. Herçiqas ew bêtir bi romana xwe The Grapes of Wrath "Tiriyên Xezebê" di nava xwendevanên kurd de tê naskirin jî, lê bêtir vê romana wî Of Mice and Men "Mişk û Mirov" ew kiriye xwediyê cihêkî bilind û navekî gerdûnî. Mişk û Mirov di derheqa du karkerên çîftûkan; Georgeê hûrik û bîaqil û Lennieê gîrs û kêmaqil de ye. Herdu heval jî hev naqetin, ew mîna goşt û neyrukê bi hev ve ne, her tiştên xwe bi hev re par ve dikin, heta ew şîrkên xewn û xeyalên hev in jî.

Ev romana kurt, resimekî jiyana karkeran yê Amerîkaya salên sihî radixe ber çavan. Weşanxaneya me, vê romana ku derbasî zîmanê kurdî bûye, bi serbîlîndahî pêşkêşî xwendevanên kurd dike.



HÊZ Û BEDEWIYA PÊNÛSÊ

Mehmed Uzun



SEDEM

Ev pirtûka ku nivîskar bi "Hêz û Bedewiya Pênûsê" navandîye, ji nivîsên wî yên ku berê di kovar û rojnameyên kurdan de hatibûn weşandin, pêk tê. Herçiqas ev nivîs berê hatibûn weşandin jî, ez bawer im ku wê haya gelek hevwelatîyên me jî van nivîsan tune be.

Ji ber ku gelek ji van nivîsan jî zû ve, an jî di destpêka salên 80 de hatine weşandin. Nivîskar di van nivîsarên xwe de bi giranî li ser rewş û rola ronakbûrên kurd di sekine û di gelek waran de nêrînen balkêş pêşkêş dike.

Rohat di sala 1955'an de li qeza Qersê, Kağızmanê hatiye dinyayê. Di 74'an de li Ankarayê, di Fakulteya Perwerdiyê de beşa psikolojiyê xelas kiriye. Di sala 1978'an de welatê xwe terk dike û koçî Ewropayê dike. Niha li Swêdê dijî.

Nivîskariya Rohat digihîje salên wî yên zaroktiyê.

Lê xebata Rohat li derveyî welêt bêtir kemilî. Ji bilî berpirsiyarî û endametiya redaksiyonên hin kovarên kurdî, wî bêtî rawestan di kovar û rojnameyên kurdan de nivîsandîye û hê jî dinivîsîne. Herweha Rohat yek ji nivîskarên kurd yê bi ber e. Wî heta niha bi kurdî û tirkî nêzikî deh pirtûkan nivîsandîye.

Ev pirtûka ku berê hin beşên wê di kovara NÛDEM'ê de derketibûn, lêkolîneke cidî ya tema jinan di folklorê de ye.

DI FOLKLORA KURDÎ DE SERDESTIYEKE JINAN

Rohat




SEDEM

Her çar pirtûk di nava Weşanên Nûdemê de derketine û dikarin ji navişana Nûdemê bîne xwestin. Her du werger liba wan bi 40 Kronî, yên din jî bi 50 Kronên Swêdî ne. Ji bo aboneyên Nûdem jî sedî 10 erantzîr e.

NÜDEM

N. 11 1994



Xwedî û Bepirsiyarê Giştî:
Chief Editor
Firat CEWERÎ

Hejmar: 11
Payiz: 1994

Şertên abonetiye (salek)
Swêd: 190 Kron
Welatên din 39 \$
Postgiro: 636 36 25-2
ISSN: 1103-1964


Wêneya bergê: Bişar Îsa
Pergela rûpelan: NÜDEM

Desteka nivîskarên: Mehmed
Uzun, Nacî Kutlay, Rohat, Zeynela-
bidîn Zinar, Xelîl Duhokî, Mehfûz
Mayî, Hesenê Metê, Husên Düzen,
Sebrî Botanî, Ilaviz-Qazî, Şahîne
B. Soreklî, Bedirxan Epözdemir.

Navnîşan
Termov. 52, 2tr.
175 77 Järfälla
SWEDEN
Tel û Fax:
8-583 564 68

NAVEROK

- MÛSA ANTER / *Firat CEWERÎ* 3
JI BO KEKÊ MÛSA ANTER / *Yaşar KAYA* 15
WEYTÎ APÊ MUSA ANTER, WEYTÎ! / *Medenî FERHO* 18
HAWARA MIN / *MARGERETA* 24
BÎRANÎNA CEGERXWÎN / *Sebrî BOTANÎ* 26
DU HELBEST JI / *Arjen ARÎ* 40
WELLE / *Hesenê METÊ* 41
HELBESTVANEK Û PÊNC HELBEST / *M. BÊKES* 45
KÛTO / *Şahîne Bekirê SOREKLÎ* 46
ŞAGIRTÊ JÎR / *Kamran HACO* 50
ÇEND TEKST JI YUNANA ANTÎK / *Wergêr: Mustafa DÜZGÜN* 52
MIROV Û HEVRIKÎ DI TABLOYÊN HUNERMEND "Ednan ŞÎNO" DE /
Xelîl DUHOKÎ 59
VEDÎTIN / *Varlîn STANSEV* / *Wergêr: Zagrosê HACO* 62
BÊDENGİYA KEVİRÊN DEMÊ / *Mervanê KELEŞ* 64
BAYÊ AZADIYÊ / *Rojhat AZADÎ* 66
MARX Û EDEBIYAT / *Paul LAFARGUE* /
Wergêr: Dr. POLOÇO 69
HEVPEYVÎN BI FEQÎ HUSEYN RE / *Bedirxan EPÖZDEMİR* 72
QÎZA GENERAL / *Xelîlê ÇAÇAN* 76
SED Û DU NIVÎSKAR / *Zeynelabidîn ZINAR* 80
BI ALAV ALATLÎ RE JI HER ALÎ VE / *Abdullah KESKÎN* 84
TEVGERA HUNERÎ LI ZAXOKA BEHDÎNAN / *Beşîr BOTANÎ* 94
HEVPEYVÎN BI XORTEKÎ 75 SALÎ RE / *F. CEWERÎ* 96
BIBLİOGRAFYA Û ÇIROKÊN HAWAR, RONAIÎ Û ROJA NÛ /
Ferhad PÎRBAL 100
SIWARÊN ÊŞÊ / *ROHAT* 109
SAZEK JI ÇAVÊN KURDISTANÊ RE / *Fethulla HUSEYNÎ* 110
PALA BÊŞOP / *Lokman POLAT* 111



İsmail Yıldırım / Mûsa Anter - 1992

MÛSA ANTER

Firat CEWERÎ



Mûsa Anter di pêşgotina pirtûka bîranînên xwe de xwe wilo dide naskirin: " *Kurdistan herêma Tirkîyeyê ya herî lipaşmayî ye; Mêrdînê bajarê Tirkîyeyê yê herî lipaşmayî ye; Nisêbînê qeza Mêrdînê ya herî bi derd e; Stîlîlê nehiya Nisêbînê ya herî belengaz e; Zivingê gundê Stîlîlê yê herî lipaşmayî ye. Li gorî nifûsa min ez li şikefta jimar dido ya vî gundî hatime dinyayê*".

Erê, mîna ku Mûsa Anter jî dibêje, bi awira pêşî mirov dikare bibêje; ma wê çi ji vî zarokê şikeftê derkeve? Lê belê ev zarokê ku li şikeftê tê dinyayê û dibe xwediye navekî nemir, ev çil pêncî salên dawiyê ji rojeva Tirkîyeyê demeket.

Mûsa Anter hê di zaroktiya xwe de bavê xwe wenda dike, li ber destên diya xwe digihê. Diya wî, ya ku ew ê heta mirinê ji bîr neke û di bin tesîra wê de bimîne; pişfî

mirina bavê wî, ew Mûsakê piçûk bi tenê nahêle, hem jê re bavtîyê, hem jî dayik-tîyê dike. Ev dayika şareza ya ku paşê di nava malbatê de bi zana û mêrxas tête navandin, dibe muxtarê gund û gelek caran ji peyan bêtir xwe dide pêş. Tu gundî vê yeka han ji wê re kêmasî nabînin, berevajiya wê, gelek ji jin û peyayên gundiyan dilê xwe dibijînin jiyana wê, xatir û qûmeteke bêpîvan didine vê jinebiyê. Lê belê her çawan be, Mûsakê piçûk xwe di nava heval û hogirên xwe de stûxwar dibîne, ji ber tunebûna bavê her tim bi fikir û raman e. Lê carinan be jî ew xwe ji wan fikir û ramanan bi dûr dixê, xwe serserî berdide nava gund, bi zarokên gundiyan re li hev dicive, ji xwe re bi veşartokê, xezalê, holî, qijimkal, çirê û hwd dileyize. Di listikên xwe de fenan nake, lê mîna ku di listikekê de bi ser bikeve, ew ê xelatê bistîne, xwe bi hemû hêza xwe dide listikan, bi serfirazî rojên xwe dibe serî.

Roj derbas dibin, çûyan û hatina esker û tehsildaran ya gund zêde dibin, diya wî ji ber nezaniya zimanê tirkî xwe lal hîs dike, li hemberî esker û tehsildaran devê wê dikeve hev; çiqas dipirse, digere, yekî tirkîzan nabîne, ji ber vê yekê ew biryara xwe dide û Mûsakê piçûk di sala 1927'an de dişîne dibistana Kercewsê. Gelek gundî li ber vê yekê dikevin, dibêjin wê Mûsayê mulahîm û hurmetgir bi xwendinê xerab bibe, li ser serê me bibe efendî û tade û zilmê li me bike. Piştî ku Mûsa salekê li Kercewsê dixwîne, paşê derbasî dibistana Mêrdînê dibe. Dibistana Mêrdînê ji 90 xwendevanan pêk dihat. Zarokên eşîr û serokeşîrên Omeriya, Surgûciyan, Kîkanan, Dêrika Çiyayê Mazî, Tilermen,

Mahsertê, Şermixê û hwd...bû. Ew yeka han, piştî avakirina Cumhûriyetê, metodeke asimilasyonê bû. Dewletê dixwest bi asimilekirina axa û serokeşîran kurdan, kurdan asîmîle bikin û bi wê yekê ji pîrsa ku îro jî bela serê wan e, xelas bibin.

Mûsa bi jîrî dibistana xwe dixwîne, di demeke kurt de fêrî tirkî dibe, êdî wergêra gundî û eskeran dike, diya xwe jî ji wê bêzariyê azad dike. Diya xwe azad dike, lê hêdî hêdî bi zilm û stema leşkerên tirkan ya bêsedem dihese. Ji ber wê zilma wan ya nedîtî ji bêçaretîya xwe di hundurê xwe de dişewite. Eskerên siwarî yên ku carinan ji nişka ve digirin ser gundê wan, bêsedem dewarên xelkê dikuvin, mirîşk û heywanên navmalê didin ber singûyan, ger di ber bîstanan re derbas bibin, bi sedan petêx û şebeşên nûgihîştî didin ber singûyan, û bi wê yekê dixwazin gundiyan çavtirsandinî bikin, da ew ji dewlet û hêza dewletê bitirsin. Wê zilma nedîtî û bêmane kir ku Mûsa Anter li sedemê wê bigire, lê bi salên xwe yên biçûk, dikir nedikir tiştek ji hev dernedixist.

Mûsa Anter bêhawe ji dibistanê hez dikir. Ji xwendinê hez dikir. Ji ber hezkirina xwe ya xwendin û dibistanê bû, ku ew bûbû yek ji şagirtên dibistanê yê herî jîr. Wî xwe zû dixist çavên mamostayên xwe, mamostayên wî jî ji ber jîrî û xwendinheza wî zû meyla xwe berdidan ser wî, jê hez dikirin, destên xwe di ser serê wî re dibirin û pê didan zanîn ku ew ê di pêşerojê de bibe mirovekî zana, mezin û bi qûmet. Vê zanebûn û şarezabûna wî ya dibistanê bala diya wî jî dikişand, loma wê jê dixwest ku ji ber pîrbûna xwe, êdî divê ew têkeve şûna wê. Mûsa herçiqas neketibû şûna wê, yanî nebûbû muxtarê gund jî, ew her

tim li pêşiya eskeran radibû, bi tirkî bi wan re dipeyvî, derd û kulên gundiyan bi wan didane zanîn. Gundî bi tirkîpeyivandina Mûsa gelekî ecêbmayî diman, hinan jê tika û lava dikirin ku wî zimanî hînî wan jî bike, da ew jî ji zimanê dewletê fêhm bikin. Vî zimanê dewletê ku armanca wê ji navêrakirina kurdan bû, bi kêrî Mûsa Anter dihat, wî piştî dibistana destpêkê, rojekê mîna lawê axayekî xwe girê dide, li hespê siwar dibe, xula nekî malbatê jî bi qantirê dide kêleka xwe û ji bo xwe li dibistana navîn binivîsîne berê xwe dide bajarê Mêrdînê. Ew li Mêrdînê dikeve îmtihana dibistana navîn û lîseyê û piştî bi du mehan ji rojnameyan dibihîze ku wî lîseyaya Edenê qezenc kiriye.

Ew êdî xort e, çardeh salî ye; diya wî doza zewacê lê dike, lê ew ji ber hezkirin û evîndariya xwe ya xwendinê pêşniyaza diya xwe bi xemgînî bi paş ve vedigerîne, biryara xwe ya xwendinê dide, dixwaze bixwîne, zana bibe, da meriv û gundiyan xwe ji wê nezani û cehaletê rizgar bike. Lê belê diya wî li hemberî wê biryara wî derdikeve û naxwaze lawê wê dev ji gund berde, wan bi tenê bihêle û heta bajarê Edenê here.

Mûsa Anter gelekî li ber wê biryara diya xwe derdikeve, digirî, difikire, li riyekê digere ku diya xwe serwext bike û here bajarê Edenê. Gelo çi bike, çi neke, rojekê radihêje rojnameya ku navê wî û yên din ku dibistan qezenc kirine lê de ye û diçe ba midûrê Nehiyê. Bi wê xortaniya xwe li wir jî hêşiran dirijîne, dilê midûr gelekî bi vî xortê çeleng û evîndarê xwendinê dişewite û jê re soz dide ku ew ê wî bi awayekî ji bo xwendinê bişîne bajarê

Edenê. Midûr li ba xwe senaryoyekê çêdike, bangî diya wî dike, Mûsa bi diya xwe re dikeve odeya midûr, midûr ji cihê xwe radibe, xêrhatinê dide diya wî, wê dide rûniştandin, jê re dibêje ku hetanî niha wî ew li emberî dewletê parastine, lê ji niha pê ve, yanî ger ew Mûsa neşînin dibistanê, ew nema dikare wê û zaroyên wê li hemberî dewletê biparêze; paşê midûr daqûl dibe, ji çavîka maseya xwe destyek kaxez datîne ser masê û dibêje ev ewraqên han ji Ankarayê hatine, di ewraqan de dewlet dide xuyakirin ku Mûsa neçe dibistanê, dê hemû malbat ji cih û warên xwe bêne surgûnkirin. Feslaya reben li ber midûr digere, bi stûxwarî jê re dibêje, ma me çi xerabî bi dewletê kiriye ku ew ê me surgûn bike? Herçawan be midûr rola xwe baş dike, dixê serê xaltiya Feslayê û ji bo xwendinê berê Mûsa didine bajarê Edenê. Mûsa ji kêfan difire, di serê xwe de dinyayek xeyal û fenteziyan çêdike. Gava Mûsayê xort û meraqdar li stasyona Edenê ji tirênê dadikeve, ji ber rêwîtiya dirêj û cihê nexweş, gelekî westiyaye; lê ew dîsan jî mîna cinan çavên xwe li der û dora xwe digerîne, ew bajarê Edenê yê mezin, avahiyên bilind, tirimpêl û mirovên pir wî ecêbmayî dihêlin. Baholên wî di destên wî de ne û di nava bajarê Edenê de dimeşe. Her tişt li vî bajarî bala wî dikişînin, ew nivîsên li ser lewhiyên dikanan yek bi yek dixwîne, di wê navê de gava çav li xortekî ku şevqakî xwendevanan li serî ye dikeve, hema bi lez nêzikî wî dibe û bi tirkîyeke devoka Mêrdînê jê pirsar: "Ma tu xwendevan î?" dike. Lawîkê xwendevan ku ew jî ji Mêrdînê ye, li ser daxwaza wî, wî digihîne dibistanê. Yek ji berpirsiyarên dibistanê ji bo derengmayîna Mûsa

pê re dixeyide, erza wî dişikîne û pê dide xuyakirin ku ew ê nikaribe li wê dibistanê bixwîne. Mûsayê ku bi hêviyên mezin berê xwe dabû wî bajarê dûr û mezin, ji ber gotin û tewrên berpîrsiyêr gelekî li ber xwe dikeve, rûyê wî sor dibe, hêviya wî ya xurt û geş ji bo kurtedemekê be jî, dişikê. Lê pir tê re naçe, ji ber nûçeya ku midûr didiyê, kêfa wî difûre û Mûsayê Zivingî li bajarê Edenê dest bi xwendina xwe dike.

Destpêka xwendina wî ya li Edenê dibe destpêka jiyana wî ya siyasî jî. Ji ber ku ew ji gund hatiye û lixwekirina wî ne mîna ya bajariyan e, hin xortên dibistanê zimandirêjiya dikin, qerf û henekê xwe pê dikin, lê Mûsa bi jîrî û jêhatîbûna xwe, xwe zû dixê çavên mamostayên xwe, wê nêrîn û tewra şaş ya xwendevanan ji ser xwe davêje û di deineke kurt de dibe yek ji bokê sinifê.

Rojên Mûsa Anter li Edenê xweş derbas dibin, dersên wî baş in, kêfa wî li cih e. Di her nameya ku ew ji diya xwe re dişîne, ew behsa başbûn û xweşbûna dersên xwe û bajarê Edenê dike. Diya wî ji ber wî serbilind dibe, bi serê wî sond dixwe û êdî çavên wê li riya inirovekî xwende û mezin e. Guhên Mûsa jî li bajarê Edenê her li ser xwendinê ye. Ew ji bilî dersên xwe yên dibistanê dest bi xwendina pirtûkên felsefî jî dike. Ew hê di wê demê de Rousseau, Kant, Bergson, Feuerbach, Nietzsche û Shchopenhaur dixwîne. Ew filosofên Yunan yên mîna Sokrat, Eflatun, Aristo dixwîne. Victor Hugo û Puşkîn dixwîne. Hema çî bigire heinû klasîkên rûs û fransîzîan dixwîne. Bi kurtî ew gurekî xwendinê ye; tiştê dixwîne jî inîna Beduîzeman Seîdê Kurdî di bîra wî de dimîne. Ew ji

xwe bawer, piştî demekê dikeve îmtihana beşa felsefeyê ya mamostetiya bilind ya Stembolê. Li hemû Tirkîyeyê tenê sê kes vê dibistanê qezenc dikin û ji van sê kesan jî yek jê Mûsa Anter e.


Lê her çawan be, Mûsa Anter kurd e, welatê wî li paş maye, miletê wî nezan û belengaz e; her ku zanebûna Mûsa Anter zêde dibe, ew bêtir bi rewşa gel û miletê xwe haydar dibe, bêtir têdigihê ku kurd e, xwediyê zimanekî cihê, kultureke cihê, cografiyeke cihê ye. Ew nêrîna han dike ku Mûsa Anter di pîrsa kurdan de hessas bibe, li hemberfî her celeb zulm û tadeyiya li ser kurdan derkeve, bixwaze kurdan jî bike xwedî maf û rûnet.

Mûsa Anter zarokê demeke wilo ye, ku her ji çend salan carekê bûyereke mezin li der û dora wî qewimî ye. Cumhûriyet nû ava dibe, serhildana Şêx Seîd dest pê dike, serhildana Dêrsinê dest pê dike, lê ji bêhêzî û bêalîkariya kurdan, kurd dişikên. Ev serhildan û liberxwedanên kurdan ji nivêşê xwenda û nûgihîştî re dibe şoperiyek û armanceke pîroz. Mûsa jî dide ser wê riyê, ji ber wê yekê bi hin xwendevanên dibistanê re pevdiçe, tê girtin û di nava destên polîsan de gelek heqaret lê tete kirin.

Sal dibe 1941. Mûsa Anter di gel rojên xweş û nexweş lîseya xwe li Edenê bi dawî tîne. Ew êdî bûye narkomanê xwendinê, nikane dev ji xwendinê berde û vegere gund, lê ji bo xwendina unîversîteyê berê xwe dide Stembolê. Çawan gava ew ji Nisêbînê çûbû Edenê, Edene jê re mezin û ecêb hatibû, gava ew ji Edenê jî diçe Stembolê, Stembol jê re bêhawe mezin û xweş tê. Ew li Stembolê dest bi xwendina fakulteya edebiyatê dike.

Kêfa wî gelekî ji xwendina fakulteyê re tê. Piştî ku ew li wir bi gelek xwendevanên kurd re dibe dost, ew bêtir bi dibistanê ve tête girêdan. Yek ji hevalê wî yê pêşî siyasetvan û şairê kurd Faîk Bûcak e. Herdu xwendevan û aktivîstên kurd bi dîtina hev gelekî di lîşa dibin, hema ku ji dersan firsendê dibînin, li ser rewşa kurdan bi giştî, li ser rewşa xwendevanên kurd li Stembolê û li ser Kurdistanê gelek sohbet û gotûbêjan dikin.

Meh û sal derbas dibin, Mûsa Anter ji jiyana gundîtiyê bi dûr dikeve, her diçe bi jiyana liv û tevgera xwe dibe mîna Stembolîyekî. Lê mîna Stembolîyekî bi kultur... Ew kultura xwe ya nûjen li ser kultura kevnare ava dike. Ew hem ji çîrok, stran û destanên kurdî hez dike, hem jî ji muzîka tirkî ya hunerî. Ew hem berhemên Ehmedê Xanî, Melayê Cizîrî û Feqiyê Teyran dixwîne, hem jî Balzak, Hugo û Tolstoy... Rohilat û roava di wî de digihên hev, dibe yek. Ev yeka han wî dike xwediyê zanebûneke kûr û perspektîveke fireh. Ew dibe demokratekî bêhempa û humanîstekî zarşîrîn. Rewşa wî ya taybetî hem wî bi heval û dostên wî şîrîn dike, hem jî gelekî bala keçikên Stembolê dikişîne. Heya wê demê jî,



herçiqas ew bi gelek keçikan re rabûye û rûniştîye, dîsan ji bilî Ayşeya Edeneyî wî ji kesî hez nekiriye. Lê keçên Stembolê ku ji neteweyên cuda pêkdihatî, xweşik bûn. Bejnên wan zirav, laşên wan li hev bûn. Ev keçên bedew li dora Mûsayê çeleng diçin û tîn; ji bo bi wî re bibin dost û heval can davêjin. Lê Mûsa

xwe ji wan diparêze, ew her dixwaze bi keçeke esil kurd re bizewice, zarokên wî ji jineke kurd bin. Ew çavên xwe digêrîne û dawiyê bi keça Abdurrahîm Rehmîyê Hekariyê, bi Stiya Haleyê re dizewice. Niha ji Hale Xanê sê zarokên wî yên mezin Anter, Dicle û Reşê hene. Hem her sê zarok, hem jî Xanima Hale li Swêdê dijîn.

Çawan destpêka jiyana Mûsa Anter ya Edenê destpêka hişyarbûna wî bû, destpêka jiyana Mûsa ya Stembolê jî, dibe destpêka jiyana wî ya rewşenbîrî. Piştî ku ew li Stembolê bi cih dibe, hem di xwendina xwe de, hem jî di nava komele û sazgehên xwendevanên kurdan de aktîv dixebite. Ji ber xebata xwe ya aktîv, ew her tim derdikeve pêş, di nava heval û hogirên xwe de dibe xwedî xatir û qîmet. Li Stembolê ew wextê xwe qet vala nabuhurîne, dixwîne, dinivîsîne, di-

xebite. Saetên xewa xwe kê m dike. Bi xwendevanên kurd re civat û civînan li dar dixê. Kurdan li mala xwe ya mezin û xweş ya li Stembolê, ku bi keda xwe bi dest xistibû, dicivîne, ji wan re behsa rewşa Kurdistanê, girîngiya ziman û kultura kurdî, hişyarî û yekîtiyê dike. Kes ji Mûsa Anter aciz nabin. Zimanê wî yê xweş, qerf û henekên wî, rûyê wî yê bi ken, nazikî û kubariya wî, hemû guhdaran dike heyrana xwe.

Mûsa Anter mezin dibe, ew loma bi mezinên kurdan re radibe û rûdine. Ew bi gelek navdarên mîna Abdurrahîm Zapsû, Şükrü Baban, Şêx Şefîk Arvasî, Mehmet Mihri Hilav, Doktor Mehmet Şükrü Sekban, Beduîzeman Seîdê Kurdî, Bedirxan, Raşîn Mûrat Beg, Şêx Selahetîn Înan, Şêx Alî Riza, Şêx Abdulbarî Kufrewî, Şêx Maşûk Efendî, Tevfîk Demiroğlu, Müftü Salih Efendî, Şêx Seyda, Nûrî Dersimî, Kamran Bedir-Xan, Edîp Karahan, Nacî Kutlay, Canip Yildirim, Tarîk Zîya Ekinci, Yaşar Kaya, Abdurrahman Qasemlû û bi sedan kesên din.

Ji xwe Abdurrahman Qasemlû, ji Kurdistana Îranê tê Stembolê û li ba Mûsa Anter û birayê xwe yê mezin bi cih dibe. Piştî ku demekê li wir dixwîne, dixwaze biçe Parîsê. Gelekî kêfa Mûsa Anter jê re tê, bi Kamiran Bedir-Xan, ku wê demê li Parîsê bû, dikeve danûstandinê û bi alîkariya Kamiran Beg Qasemlû diçe Parîsê.

Mûsa Anter ne tenê alîkariya Abdurrahman Qasemlû, wî alîkariya her kurdên bi rûmet dikir. Wî pariyê devê xwe dida wan, dilê wî her bi wan re bû. Heta berî şehîdbûna wî bi demeke kurt, gava mirov jê dipirsî û digot " Apê Mûsa çi bigire tu

di hemû kovar û rojnameyên kurdan de heyî", wî digot: "Lawo, ez weqfa kurdî me".

Ew bi rastî jî mîna weqfeke kurdî bû. Wî hemû hebûna xwe, malê xwe, canê xwe di riya kurdîtiyê de dida. Herçiqas ew bi çepîtî hatibû naskirin jî, di eslê xwe de wî ji bilî kurdîtiyê û standina mafê kurdan li tu ferqeke îdeolojîk nedinihêrî. Çepîtiya wî û danûstandinên wî yên bi komunîstan re jî, bi gotina wî, ji ber ku rastên Tirkiyeyê pîrsa kurdan qebûl nedikirin, kurd înkâr dikirin û pîrê caran nêrînên wan nêzîkî yên faşîstan bûn. Lê baweriya Mûsa Anter bi çep û komunîstên tirkan jî nedihat. Wî digot: " Ez dizanim ew di mesela kurdî de ne ji dil û semimî ne, lê belê çawan be ew behsa kurdan dikin, ev yeka han jî min têr dike".

Mûsa Anter ne şerxwaz bû, ew di her warê jiyana xwe de aşîxwaz bû. Wî dixwest mafê gelê kurd bi riyên aşî, bêî dilopek xwîn birije, bête dayin. Ew pîr caran li ser navên herdu gelan dipeyivî, behsa bihevrebûn û biratiya wan dikir. Lê belê behsa kurdan kirin, bi kurdî peyivîn bi serê xwe sûc bû, carinan jî sûcekî mezin bû. Ji ber vê yekê jî Mûsa Anter li ber çavên dewletê û karbidestên wê sûcdarek bû, diviya bû bihata cezekirin. Loma dewletê pêxîla wî bernedida, ew her dem digirt, diavêt pişt deriyên hesinî, zîndanên kûr, hucreyên teng. Lê Mûsa Anter li ber xwe dida, di mehkemeyan de bi zanûbûn doza xwe diparast, carinan wî henekê xwe bi hakim û sawciyan dikir, carinan jî bi gotinên xwe yên mizahî ew dikenandin.

Baweriya Mûsa Anter bi felsefeya belen-gaziyê nedihat. Wî feqîrî nametek nedidît. Wî dixwest rewşa her kurdî baş bibe, kurd

ji humalî, perîşanî û belengaziyê rizgar bibin; bixwînin, bixebitin, dewlemend bibin. Loma wî bi xwe di pratîkê de dikir. Ma gava ew ji Nisêbînê çû Edenê çiyê wî hebû? An jî gava ew ji Edenê çû Stembolê ma ji bilî du baholên pirtûkan çiyê wî hebû? Tiştêkî wî tune bû... Lê wî ji malên xwendevanan bigire, heta xwarinxane û restorantên mezin û luks vekirin. Ew di hemû karên xwe de jî bi ser diket. Li Stembolê perên wî pir bûbû, mala wî mezin û xweş bû, jiyana wî dewlemend bû; ew têra xwe navdar bû. Ger wî bixwesta, ew dikaribû di nava sosyeteya Stembolê de bibûya xwediyê cihekî xuyayî.

Lê gava piştî demeke dirêj ew seriyekî diçe welêt, rewşa welêt ya kambax dibîne, feqîrî, şerpezetî, xela û bêçaretîya welêt dibîne, agir bi dilê wî dikeve; bi hêrs û bi gîr berê xwe dide Stembolê û li xebat û keftelefta ji bo kurdan kar dibe. Ew hê bêtir bi doza welêt ve tete girêdan, dilê wî jî bo welat û welatîyên wî hê bêtir lê dide. Îcar ne tenê bi gotin, civîn û semîneran, lê ew bi pênûsa xwe, di kovar û rojnâmeyan de êrîşî polîtîkaya dewletê dike, ji bo çêkirina rê, avakirina kargehan, bi destxistina mafên mirovî û demokratîk yên kurdan, bala karbidestên dewletê dikişîne ser pîrsa, bi zimanê wê demê "şerqê".

Ji xwe rewş bi tevayî gelekî xerab e. hemû berxwedan û serhildanên kurdan ji aliyê dewletê ve bi erdê ve bûne yek. Heinû berpirsiyar û birêvebirên serhildan û liberxwedanan bi rê û metodên cihê hatine kuştin, zilm û stemkariyeke bêhempa li ser kurdên herêmên serhildanan bûye, ev zilm û stemkariya



nedîtî dipijiqe hemû deverên Kurdistanê, esker bêsedem digirin ser gundan, li gundiyan dixin, bi şeref û namûsa wan dileyizin, gund û malên wan xerab dikin. Ev hemû jî Mûsa Anter ve xuya ne, ew tavilê bi hevalin xwe re li hev rûdinên, bi hev re komîteyeke parastina mafê kurdan ava dikin. Ji bo ku komîteya wan ji aliyê çep û komunîstên tirkên ve şaş neyê fêhm kirin, ew di destûra xwe de didin xuyanî kirin ku armanca komîteya wan tenê parastina mafê kurdan e û ne dijminatîya gelên tirk, ereb û faris in.

Ji bo ku ew bikaribin dengê komîteya xwe bi raya giştî ve bigihîne, ew bi hevalên xwe Hüseyin Dikiciyê Diyarbekirî, Talat Saygın û Velî Doluyê Bidlîsî re hevdu dibînin, dûr û dirêj dipeyivin û bi hev re digihên biryara derxistina rojnâmeyekê. Ew navê rojnâmeya xwe jî dikin "Dicle Kaynağı" yanî "Çavkaniya Dicleyê".

Ji ber ku hevalên wî bêpere ne, Mûsa Anter hemû mesrefên rojnameyê digire ser xwe û dibe sernivîskarê rojnameyê. Ew di nivîsa xwe ya pêşî de bi firehî li ser rewşa Kurdistanê dinivîsîne û resînekî realîst yê Kurdistanê radixe. Herwisa ew bi rêzê li ser serîhildan û tevgerên Şêx Seîd, Agirî, Sason, Dêrsim, Pira Reş, bûyera Sî û Sisiyan, ku paşê dibe çavkaniya helbesta Ahmed Arif ya bi navê "Sî û Sê Gulle" dinivîsîne.

Êdî li Tirkîyeyê dem dihate guhertin. Tirkîye ji yekpartîtiyê derbasî pirpartîtiyê dibû. Yanî êdî xwedêgiravî dawîya dîktatoriya CHP' yê dihat, partiyeke din bi navê Partiya Demokrat (DP) ava dibû. Mûsa Anter jî bi niyeta ku êdî Dicle Kaynağı dema xwe dagirtiye, ew rojnameyê digire, lê piştî demeke kurt di Şûna wê de rojnameyê mehane bi navê *Şark Mecmuası* derdixe. Tenê du hejmarên *Şark Mecmuası* yê derketin, paşê ew jî hate rawestandî. Mîna Dicle Kaynağıyê, giraniya nivîsên *Şark Mecmuası* yê jî li ser rewşa kurdan û welatê wan Kurdistanê bû. Mûsa Anter êdî bêhawe diweste. Çi bigire berpirsiyariya pîrsa kurdî ji zaroktiya wî û heta salên pêncî mîna siwariyan li dû wî bû. Ji girtinê, ji taqîbên polîsan, ji karên pir mîna yê restoran û imalên xwendevanan, ji stres û leza bajarê Stembolê aciz bûbû. Wî dixwest bi niyeta ku bêtîr bi kêrî gelê xwe were, vegere welatê xwe û qet nebe çend salan jiyaneke bêdeng û bêstres bijî. Wî çapxaneyê xwe û gelek tiştên xwe yê din firotin û berê xwe da gundê zaroktiya xwe, Zivingê. Mûsa Anterê, mîna ku me li jor jî qal kiribû, narkomanê xwendin xebatê bû, nikane hema li gund xwe li ser piştê dirêj bike, tu

karî neke û bi teralî bijî. Ew traktoreke nû dikire û li gundê xwe dest bi çandiniyê dike. Jiyana gund jê re basîd, bêmane, lê heta cihekî hêsan tê. Ew çend salekî wisan dibuhurîne. Lê rojekê ji kevnedostên wî yê li Diyarbekirê pişniyaz tê û dixwazin ji bo avakirin û xebitandina hotêlekê Mûsa Anter dest ji gund berde û here Diyarbekirê. Mûsa Anter pêşniyaza dostên xwe Yusuf Azizoglyê parlementerê DP'ê û Abdullah Ekinci dipejirîne û li ser daxwaza wan dîsan gundê xwe dihêle û berê xwe dide Diyarbekirê. Li Diyarbekirê bi fikir û ramanên Mûsa Anter hotêlek tête avakirin. Mûsa Anter dibe midûrê hotêlê. Dekor, servîs û bi rêk û pêkbûna wê hotêlê dibe mîna yê Stembolê yê herî luks û mîna yê Ewrûpayê. Dibêjin wê demê li Diyarbekirê darên çaman tune bûne. Lê Mûsa Anter çil-pêncî daran ji der ve dide anîn û li der û dora hotêlê dide çandin. Bi xêra Mûsa Anter e ku îro bajarê Diyarbekirê tije darên çaman e.

Ew hotêla ku Mûsa Anter lê midûrtiyê dike, di demeke kurt de, nav û deng dide, êdî piştî demekê, ji parlementer, walî, kaymakam, Emerîkî û Ewrûpiyan pê ve, ji nebûna cih, hew kesî digirin hundur. Wê ji ber wê bi rêk û pêkbûnê be ku Stevensonê Emerîkî, ku bi ferqeke hindik serokatîya Emerîkayê wenda kiribû, piştî seredaneke hotêla Mûsa Anter, di deftera hotêlê de ev çend rêzên han nivîsandibûn: "Ez li rojhilat li bendî tiştêkî din bûm, lê min li Diyarbekirê xwe li New Yorkê hîs kir. Em çiqasî di derheqê rohilat de şaş fikirî ne. Ez di şexsiyeta Mûsa Anter de, hemû rohilatê û rohilatiyan pîroz dikim."

Di salên 54' an de reîsê cumhûr Celal Bayar jî li Mûsa Anter dibe mêvan û

gelek gotinên pesintîjî ji bo wî dibêje.

Lê armanca Mûsa Anter ne ew bû ku bi wê hotêlê kêfa siyasetvan û serokan bîne. Armanca wî bi wê hotêlê ew bû ku gaveke nûjen biavêje û berê welatîyên xwe ber bi jiyaneke nûjentir bike.

Piştî hîlbijartinan û biserketina Partiya Demokrat DP'ê, êdî hotêla Mûsa Anter dibe cihê hevdiîtina siyasetvanên kurdan. Li wê hotêlê gelek kombûn çêdibin, bingeh û planên gelek tiştan tête avêtin û herweha di navbera siyasetvanên kurdan de gelek şer û pevçûn jî derdikevin.

Erê dawîya dîktatoriya CHP'yê hatiye, lê rejîma DP jî ne ewçend ji CHP'yê çêtir e. Ger hin guhertinên biçûk çêbûbin jî, ji bo kurdan tu guhertinên ber bi çav çênabin. Welatê kurdan dîsan tune ye, hebûna kurdan dîsan tête înkarkirin, zimanê kurdî dîsan qedexe ye. Herweha zilûn û neheqîya li ser kurdan jî her berdewam e. Ev jî ber çavên Mûsa Anter narevin, hemû jê ve xuya ne. Loma ew dîsan dest davêje pê nûsa xwe û bi hevalin xwe re rojnameyeke bi navê Şark Postası (Posteya Şerqê) derdixe. Di Şark Postasiyê de quncikek bi navê Geciken Posta (Posteya derengmayî) ji Mûsa Anter re tête veqetandin. Mûsa Anter her roj di wê quncika xwe de bêtirs li ser rewşa Kurdistanê dinivîsîne û bi zimanekî tûj dewlet û berpirsiyaran rexne dike. Ji ber nivîsên Mûsa Anter tûraja rojnameyê ewçend bilind dibe ku tenê li Diyarbekirê hezar lib têne firotin. Gava rojnameya Hürriyetê pêncî lib jî nedihat firotin, firotina hezar libên Şark Postasiyê hejmareke pir bû.

Gava ew piştî rawestandina Şark Postasiyê bi çend salan bi Canip Yıldırım

re rojnameya Diyarbekirê İleri Yurtê jî nû ve vedijînin, ew jî eynî mîna rojnameyên din deng dide û di demeke kurt de bi hezaran tête firotin. Ji ber ku tu rojnameyên din rastiya kurdan nedinivîsandin. Tenê rojnameyên ku Mûsa Anter derdixistin dibûne dengê kurdan, hêvî û bawerî dida wan. Piraniya caran jî tenê ji bo ku Mûsa Anter dinivîsand ew rojname ewqasî dihatin firotin û ewqasî zû cihê xwe di nava kurdan de digirtin.

Di rojnameya İleri Yurtê (1958) de êdî Mûsa Anter dest pê dike û gotinên kurdî di nava nivîsên xwe de bi kar tîne. Gelek caran jî ew semivîsên xwe bi kurdî dafîne. Di wê demê de jî bi kurdînivîsandin, xwe bi saxî avêtina nava êgir bû. Loma êdî her nivîseke wî dibe mijara gelek munaqeseyan, çî bigire ji bo her nivîseke xwe mecbûr dimîne berê xwe dide dadgehên Tirkiyeyê. Her ku ew bi ser Mûsa Anter de diçin, Mûsa Anter ewçend lê gurr dibe. Carekê ew hê bêtir stûyê xwe dide ber kêrê û di rojnameya xwe de helbesteke kurdî bi navê "Qimil" dinivîsîne. Ew helbesta wî hemû Tirkiyeyê li nava hevdu dixîne. Di gelek kovar û rojnameyan de li ser Mûsa Anter û helbesta wî ya bi kurdî tête nivîsandin. Hin dibêjin, ma tiştê wilo dibe, çawan dikare bi kurdî bête nivîsandin, hin dibêjin, armanca wî perçekirina Tirkiyeyê ye, hin jî gelekî bi pêş de diçin û dibêjin, divê scrê wî bête jêkirin. Tek tûk kes jî dibêjin, bavo çî bû ye, helbestek e û hatiye nivîsandin.

Lê ew helbesta wî hem çapemeniya Tirkiyeyê demekê mijûl dike, hem jî dike ku Mûsa Anter li ber deriyên dadgehan bête kişkişandin. Di her dadgehan de jî ji bo parastina wî bêhejmar avûkatên welat-

hez beşdar dibin, ji bo piştgiriya wî jî ji her derê kurdên welathez berê xwe didin mehkemeyên Mûsa Anter. Êdî ew ji bo xelkê dibe mîna Ghandiyekî. Xelkê kurd azadiya xwe di şexsê Mûsa Anter de dibîne. Ew jîrîtiya wî, ew enerjîkbûn û toleransa wî, ew ruhiyeta wî ya têkoşer ji xelkê re dibe hêviya azadî û ji bindestiyê rizgarbûna wan.

Êdî ne tenê Mûsa Anter, lê di dema Mûsa Anter de û bi Mûsa Anter re tibabek rewşenbîrên kurd ên din jî gîha bûn. Ji nava kurdan gihîştina zana û rewşenbîran, herçiqas ji bo kurdan mizgîniya xêrê bû, ji bo serdestên kurdan jî nûşana tîrsê bû. Miletêkî bêî zana û rewşenbîr, miletekî kor e, bê dest û ling e, bawî ye. Lê belê êdî kurdan ji nava xwe rewşenbîrên xwe derdixistin; rewşenbîrên bîrewer, xwedî berpirsiyar û bi rûmet. Bi xêra wan rewşenbîran bû ku civaka kurdî di hundurê hişyarbûn û xweguhertineke bi lez de bû. Ev yeka han ji ber çavên dewletê nedireviya. Bi a hin berpirsiyarên dewletê diviya bû ev rewşenbîr ji navê rabûna da wan bikanîbûna, qet nebe çend deh salekî din jî kurdan di xew de bihêlin, paşê jî wan asûnîle bikin û wînda bikin. Dewlet bi xurtî derdikeve nêçîra rewşenbîrên kurd û pêncî kesên bijarte digire. Ew pêncî kesên ku niha bûye dîrok û bi navê "49'an" tete navandin, ji bo kurdan dibe darbeyeke mezin. Mûsa Anter jî di nava van pêncî kesan de ye. Hem di nava wan de ye û hem jî yek ji wan ye herî xuyayî ye. Ev pêncî rewşenbîrên kurd ku bi biryara Celal Beyar û Cevdet Sunay tene girtin, nêzîkî salekê di hucreyên teng de, di nava pisî û qirêjê de, bi rişk û spî derbas dikin. Gelek ji wan nexweş dikevin, dikevin

haletê mirinê. Emîn Batuyê Nisêbînî dimire. Ev 49 kesên ku dimînin, di wan şerdên nemirovane û xerab de bêtirs li ber xwe didin, carinan êrîşî yûzbaşî û binbaşîyan dikin, li hemberî wan serî hildidin, ji bo ku ji wê jiyana kirêt û wahşet xelas bibin, ji xwe re riya di riya welêt de şehîdbûnê dipejirînin.

Lê şerd çiqas xerab dibe bila bibe, îşkence çiqas hebe bila hebe, gava xwesteka jiyane, bawerî û berxwedan hebe, mirov dê bi ser bikeve. Ev 49 mirovên me jî, di gel ku bi mehên dirêj di hucreyên mirinê de mane jî, dîsan ew jiyane, hinan xebata xwe bi xurtî domandin, hin jî wextiyane û li malên xwe rûniştin. Yê ku ji ber gelek sedeman li malên xwe rûniştin jî, dîsan dilê wan ji bo kurdîtiyê lê didan, kengî ku fersend ketiye destên wan ew rabûne sergovendê.

Ger em salên Mûsa Anter yê Stîlîlê nehesibînin, ew her di nava xebat û kefteleftê de bû. Xebat û keftelefta wî jî ew her ajotiye ser girtin, îşkence û surgûnan. Gelo ji bo çi berpirsiyar evqasî bi tundî diçûn ser vî ronakbîrê kurd? Ma ev eşqiya bû, mêrkuj bû, xayin bû?... Na, ev welathez bû, nerm bû, aşîxwaz bû, li dijî şer û pevçûnan bû. Wî ji bo lihevhatina herdu gelan bi şev û roj bang dikir. Her destê wî yê ku ji bo aşîyê dirêj bûye, hatiye jêkirin, inêjiyê wî hatiye qeyd kirin. Ew hatiye girtin, hatiye berdan, lê tu carî jî hêviya xwe wenda nekiriye. Hem hêviya xwe wenda nekiriye, hein jî hêvî daye kurdên bêhêvî. Çep bûye, lê çepan nikanîbûne wî ji xeta wî ya milî bi dûr bixin. Enternasyonalîstbûna wî ne li ser înkarkirin an jî biçûkdîtina nasyona wî bû. Bi zûnanên din dizanîbû, lê kurdî ji

bo wî girîng bû. Ew hinekî Seîdê Kurdî, hinekî jî Bedîrxanî bû. Tije bû. Piyesa xwe "Qimil" ya ku ew di nava kurdan de kiriye navekî nemir, di zîndanê de, di şevê de nivîsandibû. Ferhenga xwe ya bi Kurdî-Tirkî di hundur de nivîsandibû.

Wî gelekî guh dida zimanê kurdî. Mîna Seîdê Kurdî dixwest li Kurdistanê dibistanên kurdî vebin. Mîna Celadet ziman yek ji şertên miletbûnê didît û pêk tanî.

Lê bi tenê bû, dilopek ji deryayê bû, bê piştgir û alîkar bû. Heta gelek kurdan bi xwe jî ew xebat û keftelefa wî ya ji bo ziman û edebiyata kurdî an biçûk didîtin, an jî bêmane... Ji xwe ji nava tirkan yên ku nêzikî wê fikra wî bibûna tune bûn. Kemalîstan kurd înkâr dikirin, dîndaran umet derdixistin pêşiya milet, komunîst jî xwedêgiravî enternasyonalîst bûn, wan jî mîna dîndaran enternasyonalîzîn derdixistin pêşiya nasyonalîzmê. Lê her çawan be, li gorî ku Mûsa Anter di bîranînê xwe de dibêje: Partiyên Tirkiyeyê hemû faşîst bûn, gelekî dûrî pîrsa kurdî bûn, jê ditirsiyan, jê direvîyan. Lê belê komunîstan xelasbûna kurdan jî di sosyalîzmê de didîtin. Yanî qet nebe wan hebûna kurdan qebûl dikirin.

Herçiqas Partiya Komunîst ya Tirkiyeyê li dû Mûsa Anter digere jî, ew nabe endamê wan. Lê belê ew komunîstên Tirkiyeyê yên sereke mîna; Nazım Hikmet, Mehmet Ali Aybar, Behice Boran, Aziz Nesin, Rıfat Ilgaz, Kemal Sülker, Dr. Hikmet Kıvılcımlı, Nihat Sargın, Sadun Eren, Mihri Belli û bi dehan kadro û serokên komunîstên tirkan nas dike, bi wan re dibe heval. Ew li ser pîrs û pîrs-girêkên dinyayê li hev dikin, lê di pîrsa kurdî de gelekî ji hev dûr difikirin. Mûsa

Anter pîrsa kurdî pîrseke bîngêhîn ya Tirkiyeyê dibîne û bêî çareserkirina vê pîrsa bîngêhîn, ew ne bawer e ku wê sosyalîzma ku komunîstên tirkan behs dikirin, bi cih were.

Wek me li jor jî gotibû, herçiqas fikrên Mûsa Anter milî bûn jî, wî ji çep û komunîstan wêdetir kes nedît, ku ew ji bo pîrsa kurdî bi wan re bixebite. Loma ew dikeve nava TÎP'ê (Partiya Karkerên Tirkiyeyê). Ew di nava TÎP'ê de ji dil dixebite û heta ku jê tê ew li ser Kurdistanê û riyên çareserkirina pîrsa kurdî endamên partiyê yên din agahdar dike. Ew di nava hevalên xwe yên partiyê de ewqas bi pêş de diçe ku, di hîlbijartina parlamentoyê ya 1965'an de, ji kandîdatiyê, ji wî pê ve kes nayên bîra partiyê. Ew jî wê pêşniyara partiyê dipejirîne û ji bo hevdana dengê kurdan xwe berdide nava gund û bajaran. Ew pîraniya propoganda xwe bi kurdî dike, piştî kurtedemekê ew ewqasî tê nas-kirin û hezkirin ku cihê ew diçiyê milet radibe ser piyan. Ew bi tîra hîlbijartina sê parlamentan dangan dide hev, lê listîka partiyê wî ji parlamentoyê bêpar dihêle.

Hemû jiyana Mûsa Anter ya bi rêkxistinî tenê ew kurtedema endametiya TÎP'ê bû. TÎP jî partiyeke legal bû. Di gel ewqas xebata siyasî û kulturî, ne berî wê, ne jî piştî wê ew nekete tu partîyan, di tu partîyan de kar û berpirsiyarî hilnegirt ser milên xwe. Heta gava di salên 60'î de DDKO (Devrimci Doğu Kültür Ocakları) ji aliyê kurdan ve tete avakirin, Mûsa Anter her alîkariyê pê dike, lê aktîv di nava wê de naxebite.

Herçiqas ew aktîv di nava DDKO'yê de cih negire jî, ew ji ber çavên dewletê nareve, hertîm di bin kontrolê de ye. Gava

di 12 Adara 70'yî de têtê girtin, ji ber kurdîtiya xwe îşkenceyên nedîtî dibîne. Êdî kal e, bê taqet e, lêdan û îşkence wî bêtaqettir dike. Gava tê berdan, ji hêrsan, ji westandinê, ji stresê, ji girtin û lêdanê xwe dide alî û li gundê xwe vedigere. Dixwaze çend salên ku maye, li gund, di nava nas û dostên xwe de derbas bike. Pêşî li Zivingê, paşê jî li Stîlîlê bi cih dibe. Ji xwe re li Sulîlê xaniyekî ava dike, erdan dajo, heywanan xwedî dike. Jiyan basît e, lê xweş e. Jiyana bi zanebûn xweştir e. Mûsa Anter xwedî zewq e, bi kultur e, dîtuye. Ew dixwaze li gund jiyaneke xweş ava bike. Bi xwezayê re bi yek be. Ew bexçê mala xwe dixemilîne, di hewşê de cihokên biçûk çêdike, tê de masiyên curbicur xwedî dike; mirîşkan, kiroşkan, pisîkan di hewşa xwe de xwedî dike. Ji zarokan hez dike, nerin e, rûbiken e. Xwarinên curbicur çêdike, gundiyan diezimîne, dixwaze qet nebe gundiyan xwe biguhere, wan hişyar û zana bike. Pêşî baş e, gundî lê guhdarî dikin, xatir û qîmet didinê. Paşê li jiyana vî peyayê ku zarokê herêmê ye, ecêbmayî dimînin. Hinek dibêjin Mûsa dîn e, hinek henekê xwe pê dikin, jê re xeberan didin. Mûsa dibîne ku ew ê nikanibe gundiyan biguhere, lê her ku diçe ew bi xwe tê guhertin, bi xwe di bin tesîra gundiyan de dimîne.

Ew gelek salên dirêj bêber, li gund rûdine. Ew nanivîsîne. An jî dinivîsîne lê çap nake. Tevger xurt e, partî û rêkxistinê kurdan ên îlegal pir bûne. Lê Mûsa Anter nakeve nava wan, li derveyî wan dimîne. Tu carî li dijî wan jî ranaweste, alîkariya ku dikeve ser milê wî, ew ji dil dike.

Carekê ku ew ketibe deftera dewletê bes

e, dewlet pêxîla wî bernade. Bi gotineke kevin, ew "mîmî" ye. Ji ber vê yekê her ku bûyere, protestoyek, an jî tevgerê li herêmê çêbibe, dewlet li deriyê Mûsa Anter dixê; şev be, roj be, ferq nake, wî bi wê kalîtiya (pîrîfî) wî ji malê dibin, bi rojan girtî dihêlin, heqareta dinyayekê lê dikin. Piştî bêdengiya 10-15 salan êdî Mûsa Anter hew debar dike, wê bêdengiya dirêj diçirîne û li kevnedosta xwe, yanî li pênuşa xwe vedigere. Lê vedigere û bêwestan dinivîsîne. Mîna ku tola salan hilîne, bi gîr dinivîsîne, xurt dinivîsîne, çî bigire ji hemû kovar û rojnameyên kurdan re dinivîsîne. Bi gotina Yaşar Kaya, dibe derwêşek. Li hemû civîn, kongre û konferansan amade ye. Mîna xortekî ye, enerjîk e, bêtirs e. Lê hêza neqenc dest ji vî qencî bernade, li dû wî ye, jê bi tirs e. Ji ber wê tîrsa xwe êdî debar nake, loma bi zanebûn, wî li serbarjê welatê wî bi xayintî dide kuştin. Mûsa Anter li kuçeyek ji kuçeyên bajarê Diyarbekirê, di nava xwîne de vedigevize; bi dilekî pak û wijdanekî rehet...

(Pirtûka Mûsa Anter Biranînê Min çavkaniya vê nivîsarê ye)

Rastkirin:

Di hejmara Nûdemê ya 8'an de, di nivîsa min ya li ser Celadet Bedir-Xan de, hatiye nivîsîn ku Celadet Beg dibistana herbiyê xwendiyê, lê li gorî agahdariyên ku M. Uzun dane min, wî dibistana herbiyê nexwendiyê. Herweha Celadet Beg tu caran nebûye piştgirê Kemal Atatürk jî. Ew avakerê Xoybûnê bû û di serhildana Agiriyê de, ew ne ji milê Îranê ve lê ji milê Sûriyê ve alîkariya serhildanê dikin. Heçî mirina Celadet Beg e, ew dikeve bîrê, lê bi carekê ve can nade. Bi parsiwên şikestî radikin nexweşxanê, li wir wefat dike.

Ji bo Kekê Mûsa ANTER



Yaşar KAYA

Li darê dinê de tu tiştî wekî wêna Kekê Mûsa Anter di nav sedyâ mirinê de dilê min neşewitand. Rûyê wî yê spî di nav xwîna sor de mabû. Agir bi min ket, solên wî di lingên wî de nebûn, lê belê li cem wî bûn. Te digot, ew nemiriye, radizê. Gelo ev çi neyarî, çi zordestî, çi hovîtu bû! Min bi xwe, ji xwe re got, "êdî Kekê Mûsa tune. Ç'a ku ez di nav cîhanê de tenê, bê xweyî û bêxwedan mame..."

Min li gelek ciyan got; kurdan Kekê

Mûsa nas nekir. Kurd divê ji bo wî gelekî bixwînin û binivîsînin di jiyana wî ya bêhempa de gelek alî ji bo welatparêziyê, ji bo fikrên netewayî, ji bo xebata şoreşgerî, dîrokvanî û niviskarî, feylesofî û derwêşî hene. Derwêşiya wî ji sebra wî dihat. Wî gelek mekteb û medrese dîtibûn. Ew zane bû, pispor bû. Di deh pêçiyên wî de deh huner hebûn. Di rojnameyêke tirkî de, bîranîneke wî derketibû, di wir de digot ku; "ez, Faîq Bucak, Remzî Bucak, Ziya Şerefhanoglu, Dr. Yusuf Azîzoğlu, em hatine cem hev, me armanca xwe kire yek, me partiyeke dizî damezirand. Me navê wê jî danî 'Partiya Xilasbûna Kurdîstanê', sal jî 1945 bû." Bi kurtasî gotina wî weha bû. Min rojname xwend û ez êvarê çûm mala wî, min got, "Kekê, ji bo çi te tiştêkî weha nişan kir û bala mirovan kişand?" Wî jî weha got, "birayê min, ev heval hemû çûne ber rehma Xwedê. Ez tenê mame. Ew hez dikin, bila min jî bikujim, xem nîn e. Lê belê mirin nêzik e, ez ê bimirim. Hûn ê ji kuderê bizanibin ku tiştêkî weha heye? bila qet nebe, di dîroka me de derbas be. Ev ji kuştina min hêjatir e. Hûn jî bizanibin, baş e." Heta nivê şevê me dan û standina xwe xelas kir û ez rabûm, hatim malê.

Eger meriv bikaribe hevpeyvîna wî û min a van bîst û pênc salan de binivîse, dibe weke 4-5 cîld pirtûk. Vê carê, beriya çûyîna wî ya Diyarbekra xopan, ez li nexweşxanê de radizam. Wî ji min re telefon vekir, mîna niha dengê wî di guhê min de ye; "Yaşar, bavê min, tu çawan î? Binê, ez ji te rîca dikim, henekeke sar bi me nekî ha!" Min got, "metirse, tiştêkî dilê min tune. Do doktoran li dilê min

nihêrîn, ew dibên baş e. Tu metirse.”

”Ez ê herime Diyarbekrê, xwezî me hevdu bidîta, baş bû.”

”Tu ji min pirs dikî, neçe Diyarbekrê, niha wexta çûyîna te nîn e. Tu dê herî çi bikî?”

”Lawo, tişteke nabe. Şewket Baysanoğlu jî diçe. Belediyê gazî me kiriye, ez ê herim çend pirtûkên xwe îmze bikim. Tişteke nabe.”

”Êdî tu dizanî, bi fikra min be, tu naçî.”

”Xwedê sihatê bide te, ez ê bêm, em ê hevdu bibînin.”

Çûyîn ew çûyîn bû. Me êdî hevdu nedît. Wî ji min re, ji hevalan re wisan digot; ”em ê di mala xwe ya mezin de bêne cem hev...” Ew çû mala me ya mezin. Ka em ê çi gavê herin, ew kifş nîn e.

Kekê Mûsa bû rûpela dîroka Kurdistanê. Jiyana wî mîna dîroka Kurdistanê bû. Ew di gelek tengasiyan de ma, lê belê wî hûre biçûk ji xwe re dikire best, çol, zozan, gund û avayî, wisan jî dijîya. Tûrê wî li piştê wî bû, dikarîbû sed salî li çolê bimeşîya. Meşa wî meşeke giran bû, dengê koça wî diçû dinê. Ez hez dikim, rojekê nivîskarekî kurd rûne, li ser nivîsarên wî bixebite, ji destpêkê heta mirinê, Kekê Mûsa çi nivîsîne, wan berhev bike, têxe pirtûkeke bêhempa. Ev ji bo dîroka me xizmeteke pir ewzel e. Di 12 Adar 1970'ê de, li mala Kekê Mûsa gerriyan, 3 pirtûkên wî birin. Navê yekê ”Hücre Hayatımız” bû ku min bi destê xwe kişandibû ser kaxizan. Ji bo vê yekê, ez dibêjim, Kekê Mûsa kirin 4 perçe, 3 perçên wî birin. Îro ew di destê me de bûna, wê çaxê we dê bidîta Kekê Anter çi nivîskar e û çi nivîsiye. Jixwe piştî wê talanê, wî digot, ”destê min pênuşê

nagire.” Wî rast digot, wî çend salan tişteke nenivîsî û çû li gundê xwe rûnişt.

Ein carina dihatin cem hev, me behsa wan pirtûkan dikir. Wî digot, ”Yaşar, xwezî tu çend şevan bêyî û bûnî bîra min. Ez dikarin wan di serî de binivîsim.” Lê belê, anegorî min, nivîskariya Anter birin, talan kirin, şûrtên Roma Reş.

Wî bîranînên xwe nivîsibûn û xelas kiribûn, ji min re digot, ”hewce ye ku tu pêşgotinekê binivîsî, ji te nêzîktir kesî min tune.” Rojekê heval hatin, li ser serê min sekinîn, di nav 15 deqîqan de, min ji bo Anter çi nivîsî, ew derket, ji mêjû û dilê min. Paşê hevalan jê re telefon vedikirin, digotin, kes weke kekê Mûsa aha baş nanivîse. Ew gelekî kêfxweş dibû. Di nav bîranînên wî de tişteki gelek kêmbû. Ez çûm û min jê re got ”van salên ku 49 di girtûgehê de bûn, wê çaxê çepîtî û rastî derketibû ortê. Lê belê ew û gorbehîşt Ziya Şerefhanoglu hatibûne hember hev. Me lê nihêrî nabe, gelek hevdu eşandin û navbera wan tehl bû. Me di nav xwe de dadgehek çêkir. Endamên dadgehê xort bûn. Ez îro dikarim navê gişkan bêjin; Ziya Acar, Medet Serhat, Fadil Budak, Yavuz Çamlıbel, Haydar Aksu û ez. Haydar Aksu ji Qereqoçanê bû, paşê bû awukat, bi trafikê mir. Fadil jî li Diyarbekrê bi ecelê xwe mir. Yê din dijîn.

Me şeva pêşîn li derve, di quncikeke tarî de îfada Kekê Mûsa girt. Wî got, ”lawo, ji bo min, dadgeha we dadgeheke dîrokî û ezîz e. Hûn çi cezê bidine min, ji bo min şerefeke mezin e.” Wî dest pê kir û îfada xwe da. Îfade di 2-3 şevan de xelas bû. Paşê me gazî Ziya begê kir. Wî got ”hûn kî ne, ez ê îfadê bidime we jî?” Ew ji

dadgehê reviya. Em jî bûne xwedî qene-
tekê. Min jê re got, "te ev kiriye. Ev ji bo
dîroka me ya neteweyî gelek muhîm e."
Wî got, "welleh tu rast dibêjî. Ev tenê nîn
e, gelek tişt ji bîra min çûne, min nenivi-
siye. Ez ê wan binivîsîm û bigihînime
çapa dudan..." Neyaran nehîşt.

Van salên paşîn, şerê azadiyê çiqas
bilind dibû, ew jî ewqasî xort bûbû. Wî
digot, "lawo, ez tu cara hez nakim, ez bi-
mirim. Lê baweriya min bi we heye, hûn
ê meşa azadî û serfraziyê bidomînin, lê ev
têkoşîn, ev xelasbûn hatiye cîkî wusa, ez
nikarim we bihêlim û herim." Ruhê wî,
çavê wî li jiyane bû. Şeva kokteyla
"Özgür Gündem"ê gelekî dilxweş bû, wî
gelek dost û hevalên xwe li wir dîtî. Ez
bi dil dikarim bêjîm ku roja wî ya xweş,
roja ku ew dihate Gündem"ê bû. Çawan ku
kalekî zarokekî xwe bibîne, ew bi her kesî
re kêfxweş dibû, bi dilekî xweş diçû mala
xwe.

Ew carina dihate "Özgür Gündem"ê, li
oda min rûdinişt. Wî rojekê li tabloya
"DENG"ê nihêrî, bala xwe dayê, weha
got; "lawo, me di 1963'an de, bi henek, ev
kovar derxist, lê belê ez niha lê dinêrim, ji
bo me bûye dîrok. Kî dizane, sibê
xwedîtiya "Özgür Gündem"ê di dîroka me
de ji bo we dê bibe şerefeke mezin,
rûmeteke mezin..."

Vebûna "Enstîtuya Kurdî" li Stenbolê,
ji bo wî, xewnek bû, gelekî kêfa wî dihate

cîh. Wî digot, "gunehê min di stûyê we de
be, kengê mueseseyeke kurdan çêbû,
gerek hûn heykelê Îsmail Beşikçi deynin
ber derî. Ev hinek jî wesiyeta min e. Ez
dizanim, hûn min ji bîr nakin." Bi rastî,
me ew ji bîr nekir. "Xelata Rojnameva-
niya Mûsa ANTER" me ji bo bîranîna wî
danî. Bi rastî, sala pêşîn baş pêk hat û
cîhê xwe girt. Ez bawer in ku her sal kurd
ê vê xelatê ji xwe re bikine armançek.

Kekê Mûsa di nav rojnamevaniya
kurdan de dijî. Bi rastî, ew mamostayê me
gişkan bû. Em ji şexsê wî gelek tiştan
hîn bûn. Wî dest bi nivîsîna kurdî kir,
serokê edebiyat, dîrok û zimanê kurdî bû.

Li girtîgeh Mamakê serma û zemherî
hebû. Zivistaneke gelekî sar bû, berf û
cemed heta akuşkên (pencerên) girtîgehê
hatibûn. Ji bilî kaxez û pênuşê di wê
jiyanê de tiştêkî din tune bû. Wî ferhenga
xwe, bi 12 hezar kelîman, nivîsî. Angorî
min, ev xebateke bêhempa bû.

Kekê Mûsa li Kurdistanê bû, ruhê wî
Kurdistanî bû, jiyana wî Kurdistanî bû.
Ew wusa jî çû. Kekê Mûsa li Kurdistanê
çiyayekî gelekî bilind bû, riya kê pê
biketa, mîna dayikekê, mîna bavekî, li
her kesî dibû xwedî. Ez bawer im, ji bo
Kekê Mûsa dê gelek tişt bînin nivîsin. Ew
di nav gelê kurd de dijî.

Ji bo wî mirin tune, ew ji şehîdên Kur-
distanê yê nemir e...

WEYTÎ APÊ MÛSA WEYTÎ !...



Medenî FERHO

Nivîsandina şûn mirinê, bi min nexweş tê . Dilê min dişewite . . . Zor e ! . . . Balam ew kes ku nasê te be, hê bêhtir zor û zehmet e . . . Kedxwerên li ser piştta me suwar, bîranîn û serpêhatiyên me jî şiluşatî kirine. Teva kuloke ne. . . Mîna jîyana me... Çawa jîyana me kuloke kirine, nahêlin kat bidê, bizir jê şîn bibe, bîranîn û serpêhatiyên me jî marazoyî, elemoyî kirine. Bê ked kirin e... Ne hêsan

e... Nexasim ku nivîsandin li ser gorbihiştîyan, bi Kurdî be!... Şînk û weyn e!... Xweş memyano ye!... Di bin sitûna azmên de, kes mîna Kurdan nikare bavêjê ser miriyên xwe. Ev hunera xas hêja, di nava Kurdan de pîrr pêş de çûye. Ez jî, kurê vî gelî me; xwîn û goşt û çav û gav û mêjîyê min bi çanda wî hatîye sitewihandin. Hevîr çawa hatibe hevîrkirin, xerc çawa hatibe lihevdan, avanî wilo derdikeve meydanê. Pîranîya caran, têhna min bi nivîsandinan jî naşikê. Helbest hê bêhtir dilgerm û kelgermiya hêrzên memyanan didin. Niha ku bo vî gorbihiştî helbestek ji min hatibaye xwestin, bi kelgermiya xwe bi dilşewatiya xwe, min ê galgalên hê ronahîya rojê nedîtî civandiban ser hev. Xêzikên têr hêstirên Kewa li dû hev rez kiribane. Mixabin tiştin hene ku di nava xêzikên helbestan de cî nagirin. Nikarin bikevin nava wê avanîyê de. Avanîya helbestan li xwe hal e! . . . Ya nivîsandinê, mîna miştaxê ye, bi dilê xwe raxe, dirêj bike, fere bike, zirav û qalîn bike; heya ji te re lazim e... Bihûne, birêse û here!.. Car din, bi qasî bi qasî helbestan hêrz nade.

Şora min li ser gorbihiştîyê Mûsa Anter e. Mûsa Anter nemirî ye. Mirin çi ye? Hundabûn e?... Tunebûn e?... Jibîrkirin e?... Di nava civatê de necî girtin e?... Veşartina bin fêş û axê ye?.. Xwendina terqêna mellê, yan jî pîrên Êzîdîyan e?.. Mûsa Anter, di nav me de ye. Di nava civata Kurdî de ye. Her roj, her kêlî, her wext, bi gilî û hewngîriya xwe bi me re dijî. Mûsa Anter sax e!... Bi me re dijî. Di kevçika dilê me de, di nava xêzik û hewnê me de... Di nava mêjîyê me de... Jîyana Mûsa Anter ya berdeyam

e. Wî ava jîyanê vexwariye. Di nava go-
venda Kurdî de ye. Nemir e!... Xwezî bi
wî, xwezî bi umr û baweriya wî. Sedem
ev e, ku rast û rê bangî wî dikim. Ne şerm
û ne ar e!... Ne qêl û ne lom e!... Gilî û
gazinên jîyanek têr qerqêşan in.

Mûsa Anter, destûbirakê hemû kurdan
bû. Kekê navseran, Apê xortan, xalê qîz û
ciwanikan bû... Merivek bi tenê, ku ji
xwe razî, hej ji xwe kirî, Kurd, tune ye,
ku bîranînek wî bi Mûsa Anter re tune ye.
Pirr- kê...

Waaa Apê Mûsa!...

- Gelo tu dengê min dikî?...

Hemberî Sinceqê!... Hemberî wê deşta
fere, cihê tirata hespên Medîyan,
Eyubîyan... Naveroka Mezopotamya!...
Pêgiha payîtexta Şahmaran, Bagokê ! . . .
Kêlên gorna te, mîna şewqa rojê, bi
çilûheft rengên pîrozî, bi xemla qozeqerî,
li nava Tora Hevêriya, li nava Omerîya, li
nava Bota bela dibe. Dibe dilgerm û
evîndariya qîz û xortên Kurdan...
Galgalên te, yek bi yek bûne kelemên serê
dar û devîyan... Bûne kulîlk û rihana ber
çem û gelfîyan... Bûne stranên dengbêjan,
bûne dengê bilûra Memê Şivan û Gavanê
Zerzan... Ew deng, hildikişe heya bi nava
Hesen û Heyderan ! . . .

Gelo tu dengê min dikî? . . . Ez ! . . . Ji
çarîyana Dîyarbêkrê bangî te dikim. Bi wî
dengê xortanî, bi awaza xwîngerinî...
Destpêka Havînî, ji devê çapxana "*Dengê
Dîyarbêkrê*" heya bi Pastexana Şêxmûs...
Sal 1965-66... Ew dem hem xweş bû hem
nexweş bû. Hingî kuştin nebû, sirgûn
nebû... Lê, hûn seymanê Kurdan, bi qasî
hejmara destan bûn. Hûn batlê zamanî
bûn.

- Bela xwe ji *exîstansiyalîzmê* û
ciwamêrê *Satre* veke. Ew bikêrî xwe tîn.
Yê bi tenê, yê belengaz, yê bêxwedî em
in. Tu bala xwe berde ser *Mem û Zînê*...
Kêfa min pirr ji helbesta te re hat. Dom
bike... Ew nivîsandina te jî xweş bû. Lê
ne ji me re ye. Ne li ser me ye. Her kes
exîstansiyalîzmê û *Satre* dinivîse. Lê li
ser *Mem û Zînê* kes nanivîse... (1)

Hingî min bi awirên vala, şaş tê negi-
hatî li devê te dînerî. Ku ew lêvên
şîrşekirî dilebitîn, gotinên dilgermî li
dûv hev dibûne rêz, guhdarî xweş bû. Ez
mabûme xar... Hinekî berxweketî...
Hinekî mûrşikestî... Mabûme dilehayî...
Ez xort bûm, min hêviya wesif û pesin ji
te dikir. Ez li hêviya galgalên bê rexne
bûm. Lê te rastî gote min. Ew rastî mîna
şeqaman li dev û ruwê min diket. Piştî,
piştî bi gelekî hê ji nû têgihîşûm, bê te
çi digote min. Şîreta têrxîret û rastî... Ew
rastî, rastiya demsalî bû. Rastiya îro...

Felek xayîn e!... Mixabin îro; ew
çavên kesp wê rudêna gilûgeş hertim
beşuş... Ketiye nava xemla jîyanê dixem-
mile, dikemilê, *bi Newroza Ciwanik* re
her sal tê lawên *Kawayê Hesinker* pîroz
dike. Bûye ax!... Axa têr rewa...
dipişkive, kat dide.. Kulîlk û reng dide! ..

- Kekê Mûsa, min ne ew helbesta te
dîtî bi tenê nivîsiye. Dora bîst heban e.
Lê ev rojnamên ku nivîsandinê min
diweşînin, ne li vir, ne li Mêrdînê, wan
naweşînin. Doza nivîsandinên rojê û
bêtirs dikin. Her roj li benda nûçeyekê,
yan maqalekê ne. Dabaşa bajêr, dabaşa
pirtûkan, hevpeyvînek bi kesan re,
wilo...

- Zorê li wan bike. Yek bi yekê ye!... Ji dehan, ji bîstan yek bê weşandin bes e.. Hê nin bersiv nedayî, te pirsî:

- Xwediyê rojnameya *Dengê Diyarbekirê* (2) got, em pera jî didinê. Kêfa min hat. Ev nîşaniya ku qedir didin te. Zorê li wan bike.

- Belê ezbenî, heftiyê du benqenot û nîvan didin min. Tê Cebrail (3) tu pera nade min. Ne min qal kir ne wî.

- Ew bêbavê Şamê Filehê Mêrdînê ye, ne henek e. Pirr dewlemend in jî. Xem nake... Tu bidomêne. Îro li Diyarbekrê, li Mêrdînê, Li Midyadê; (4) sibe, dusibe li bajarên mezin, di rojnamên mezin de...

Erêê, erêêê... Cîhanek têr qerqaşun e... Lewto ye!... Têr gemar e. Ne hêja ye!... Lê ewqasî jî xweş û geş e... Piştê ein rabûn çûne buroya *Pamuk Bababa* (5)... Çend heval û hogirên te rûniştû bûn. Her kesî ji dehma xwe de rêçik û şivîlên roiên ku bèn nîşan didan. Hey gidî gîdyano!... Hew tê hewnê min kengî bû. Li dikana Mamosta *Mehmet Emîn Bozarslan*, di wê pasaja kêleka otêl onur de... Sikak di navbera otêlê û pasajê de hebû. Pasaj hênîk bû... Tu û *Abdurrahman Durre* li devê derî li ser kursiyên biçûk rûniştûbûn. Mamosta Mehmet Emîn jî li hindirû bi mişteriyên xwe re lebikî bû. Çend xort bûn. Pirtûk dikirîn. Ji xwe, serdorên we teva xort bûn. Hûn qubletgeha xortan bûn. Hûn aqilmendê xortan bûn. Hûn rêzanê Kurdan bûn. Hûn sermiyanê Kurdan bûn.

Dem û dewran e!... Cîhan dizivire... Felek jî lîstika xwe dike... Wê salê bûme mamosta. Heya sala 1968 me hew hevdu

dit. Di 68'an de ku ez hatim xopana Sitembolê, bo ceribandina zanîngehê... Ez û çend hevalên xwe hatin ziyaretiya te. Mala te li Caddebostanê bû. Mala te li ser diyarê heşta bû. Xopana Sitembolê li ser heft diyara ye. Min mala te li ser diyarê heşta dihesiband. Tu bi xwe, tu bi tenê bi qasî çiya bû yî. Tu bi tenê di xopana bajarê Sitembolê de hilnedihaû. Tu derya bû yî. Lê kesî ji wan rojnamê Tirkan, rê neda te. Mefêr û ferece nedane te bo tu binivîsî. Bo tu, Cîhanê bi hewngîriya xwe tê ronahî bikî. Bo dewleta Tirkîyê bi dîlûn û rastiya xwe ber bi avaniyê bibî. Ber bi demokrasiya esasî bibî. Lê îro, em Kurd di rojnamê xwe yên rojê de, cî didine kesên Tirk. Rûpel rûpel nivîsandinê wan di rojnamê Kurdan de derdikevin. Mixabin, ew kes jî ha ha propaganda xwe dikin. Em, ji xwe re kirine palik. Pêl me dikin û bi hewa dikevin. Erê Kekê Mûsa... Cîhana gewrik dewra xwe dileyîze...

Sawa em runiştin tu rabuyî, bi rabuna xwe re te got:

- Dotnama we ne li mal e. Kebanî ez iin... Ez bi xwe xizmeta we dikim. Me da xwe, bo arîkariyê. Te nehişt...

Te kar dikir û di ber kar re te şor dikir.

- Car din ew bêbavê polîsan ketine mala min. Pirr tiştên hêja dizî ne. Ez berhev dikim ew didizin. Ev çend caran ku dizîya min dikin. Wan carên din ez ber tiştên xwe nediketim. Lê vê carê ez pirr bi tepsiyê êşiyam. Merivekî min î delal, ji hazira ne çetir, tepsiyek zîv, bi destan haû xilmetkirin, diyarî ji min re anîbû. Te guneh dikir lê bînerî. Pirr bedew û delal bû. Wan bêbavê Şamê, ew jî birin.

Tu dizanî Apê Mûsa, berî niha bi

çendekî li welatê biyanî, li payîtexta Ewrûpa, li Brukselê, li buroya DEP ê. Min û kekê *Yaşar Kaya*, qala wan polîsê ku diketin mala te û firaxên te didizîn, kir. Bi dilo jarê, bi heyf û mixabin me dabaşa te tanî meydanê: serpêhatiyên te, salifên te ji hev din re gotin. Parîkî jî, li ser "*12 Mart*" ê û hepisxanê sekinîn. Min çend bîranîn û rawa wan rojan kir. Giliyên te, giliyên gorbihîştîyê *Edip Karahan*, ê wan xortê devrût, giliyên *Muxtarê Siliv*. Ew roj, "*12 Îlon*" ê û îro dane ber hevûdin. Kekê *Yaşar Kaya* yek ji wan kesê ku pîrr nêzîkî te bû. We pîrr nanê kurmî bi hevûdin re xwariye, ava genî bi hevûdin re vexwariye. Pîrr qereçarşembe bi hevûdin re derbas kirin e. Îro, ew jî mîna pîrr aqilmend û serkêşên şoreşa Kurdî bazdayî ye, li welatê biyanî, li dûv doza xwe kar û xebatê dike. Şev û roja wî yek e. Ha bi vir de dibezê, ha bi wir de... Govend fere bûye. Govend çarpîne lê dixê. Heyfa min tê ji wê heyfê ku tu ne di serê govendê de yî. Dijminê harhare, hov, bêbext û bê ol nehiştin. Lê tu xweş bizanibe ku her govenda Kurdî bi navê te dest bi listîka xwe dike.

Tê bîra te, roja ez û gorbihîştîyê *Hecî Ebdulcelîl* anîne hepisxana Diyarbêkrê. 12 Adarê!... Ber êvarî bû, di pilabek xer-bende de, têra xwe ji hevûdin de ketî, westayî, şepirze, hinek perçiqandî anîn avêtin piştê tîlê tîr dirrihî. Apê min *Dr. Îsmet* pîrr ji min aciz bû. Çîna ez hatime girtin. Hêz bû, bi ser min hilket û got: "*Te eşîr bi ser hevûdin de veğerandin û tu hatî cem min.*" Tu kenîya... Lê di kenê de xeyd hebû. Te got: "*Lawoo lawoo!... Tu çirre wiha dibêjî? Kesî ji me eşîr bi ser hevûdin de venegerandine, heya ew*

veğerîne. Soza xwe anî cî. Her heftî dihate devê hepsê ziyaretiya te, lê ji me teva re name dişand, digot ez ji civata we dihesidim. Ew jî hat nava civatê. Dev ji Medenî berde. Bila Çeto û Xelîl Axa bi eşîran bilebikin." Te bi lez li dora xwe nerî û domand: "- *Lawoo wele tu aqilê min ji axatiya Çeto nagire. Pîrr tirsonek e!... Ku axayê me teva wiha bin, eşîrên kurdan bê sermîyan in.*"

Gorbihîştîyê *Hecî Ebdulcelîl* gotinek got.

Te şora wî ji devê wî girt.

"- *Kuro Hecî tu şor neke, ji nava eşîrên Hevêrka teva te Medenî tenê daye dûv xwe û tu hatiyî. Xuya ye xebata te hewqas e. Lê, herê û bê tu heciyê bi nav heciyî. Misilmantî jî bi heciyê mîna te jihevde ketî ye, xerbende ye.*"

Weytî, weytî ! . . .

Weytî Apê Mûsa Weytî!...

Heyf û mixabîna bejna delal!... Çavên zeytûnî!... Galalên bi zad û tîr şîranî!... Wê lepta maqûlî!... Çûkê çil zîman!... Weytî!.. Car din, car din, idî car din bi bêbextî sermîyanek ji me Kurdan kuştin car din, car din, gidî car din Kurd hiştin sêwî û bêxwedî... Ev bêbextiya kes nedî... Wilo naçe serî... Divê hebe çareserî... Divê hebe yekî... Yekî... Yekî... Yekî...

Rewşen destên xwe li ser hevûdin danîn û got: "Ez ê bêjim û belênim. Yekî weke Xalê min Mûsa Anter kuştine.

Xirabo, xiraboo ! . . .

Roja ew mizgîniya ne xêrê hat!... Li mala Bedreddînê Usîfê Haco, Rewşen a Xwarzê (6) got beland. Ew der ne cihê şînk û weynê bû. Welatê biyanî, hawara

Xwedê û bi tenê!... Li cem Kurdan şînk
 û weyn adet e!... Li kambaxa Ewrûpa
 kinê e!... Îcar ne em dikarin tor û tola
 xwe bi cî bînin, ne ya wan. Em mane di
 navbera Xelo û Celo de. (7) Em wilo bikin
 xerab e, em nekin yekcar kambax e.... Lê
 Rawşen nemerdî nekir. Hew xwe girt.
 Şewata dilê wê di navbera lêvên wê re der-
 ketin. "Çawa, çawa destên wan bêbextan
 lê geriya. Çawa, çawa tiliya wî bêmiradî,
 wî kezzebherhilî lingê xopana demançê
 kişand? Çawa, çawa ew bêxwedîka ji ber
 xwediyê xwe maye demançê teqiya?
 Çawa, çawa?!... Gidî gidiano, hew destên
 min li kar diçin. Îro hûn ê binînin bê
 xwarin." Bedreddîn ma dilehayî, reş bû; (ji
 xwe reş e, yekcar qener bû), di hûrê xwe
 de fehmî; dawî: "Ev nebe çirçirkê Jon
 Tirkan e, ne henek in." (8)

- Xalê Mûsa Kuştin/ Bejna zirav ji ruwê
 erdê miştin/ Hawar em bê zana û xal hiştin/
 Lo gidî geli Kurduno/ Amin nebin li bextê
 Tirko/ Bav û kalên me gurandin/ Xort û qîzên
 me qelandin/ Cih û warên me wêrandin/ Bese
 gidîno îcar rabin/ Bi xwîn û serê şehîdan/
 Sûnd bixwin wekî mirîdan/ Govenda xwe li
 dar bidin/Welatê xwe felat bikin...." (9)

Alooo ! . . .
 - Belê ! . . .
 - Ez Medenî me, Kekê Mûsa!...
 - Tu Medenî yî?...
 - Belê ezbenî!...
 - Tu Medenî bi xwe yî? Medeniyê Torî,
 ewê Qesfî..(10)
 - Erê ez in, Kekê Mûsa, bo li halê te
 bipirsim, min telefon da.
 - Erêê, lawoo tu çima nayê cem Kekê
 Mûsa? Pirs bi telefonê reva civatê ye, ne

maqûl e.

- Ez dizanim, lê car din... Weke her carê
 din. Ez şevder im? (11)

- Car din? Car din? Lawoo tu qenc î
 qenc ber şek û peka xistine. Tu karibî xwe
 bigihîni vir.

- Ez çî bêjim. Ka ez binerim... Ku
 ferece bi keviyê... Tirsim bela min li te
 bikeve. Ji xwe tu têra xwe bi belayî.

- Tişt nabe lawoo! . . . Ez fêrî van tiştan
 bûme . Tu were tiştê nabe. Salek bêhtir
 çêbû me hevdu nediyê. Were da em çend
 lata biaxifin.

Hê ew dengê zelal, germ di guhên min
 de ye. Hêê!... Hê bangî min dike.

Hêê!.. Hê ez diçim... Hêê!.. Hê ez li ber
 xwe didin... Hêê!... Ez ê herim... Hêê! .
 Hê di dilê min de ye. Hê kul e, ketiyê ser
 dilê min, bûye girêk. Hêê!... Hê ez ê
 biçim ziyaretiya Kekê Mûsa. Li hêviya
 min e. Divê ez herim. Divê ez herim.
 Mûsa Anter Welat e!... Ax e!... Erd e!...
 Azadî ye!... Mûsa Anter, wekî hemû
 şehîdên Kurdîstanê qubletgeha welat-
 parêza ye... Divê ez herim. Li bendeyî
 min e. Hê ez bazdayî, ji destên polîsê
 Tirkan birevin jî, ez ê herim ziyaretiya
 gorbihîştîyê Mûsa Anter.

Tu dizanî Apê Mûsa, li ser rubera erda
 Cîhanê yek gel heye ku nifir li Xwedê
 kiriye. Ew gel, gelê Kurd e... Gotiyê,
 Xwedo, felek kurê te ye. Bila kurê te
 binire. Felel xayin e!... Xiyamet, li cem
 Kurdan gunehkariya herî mezin e... Erêê
 Apê Mûsa, bila binire xiyamet. Ku kurê
 Xwedê be jî... Bila bimre... Tu bi destên
 xayînekî gelê Kurd hatî kuştin. Kuştina
 bi bêbextî... Bi devê dijmin, bi rê û şivîla
 dijmin, bi şewra dijmin, bi qerara
 dijmin... Lê belê ew xiyamet!... Ew xiya-

net!... Bila bimre!...

Weytî!... Weytî Apê Mûsa Anter weytî!... Heyfa te!... Heyf û mixabin, ku tu hêj ji gelê kurd re lazim buyî... Tu dîrok bûyî... Diroka nêzî wext... Tu aqil-mendekî çê merivekî nesitêlih buyî. Serpêhatiyên te pîrr hebûn. Mixabin ew tiştên te dizanîbûn û serpêhatiyên te tev bi te re man.

"Xalê Mûsa/ -Lo hostenecar/ Te digote min/-Xebat bikin/ Ne sekinin qet û tu car/ Lê tim bi hefad bin/Wekî her car/-ro wext e/ Dijmin bêbext e/Hay ji xwe hebin/Qet bê aqil nebin/Beredayî neçin der/Wê li we bixin ya xencer/ Yan jî hişkedar/Xalê Mûsa/Lo rih û can/Tu bûyî şîretkar/ Şev û roj/Te li me dikir xar/Heyf û mixabin/Ji bo kuştina te/Îro em in sîtemkar..(12)

1-Hingî nivîsandinê min di rojnama "Mardin Sesi" de derdiketin. "Existansializ-min Çıkmazı ve Sartre" yek ji wan nivîsandinê min bû.

2-Hingî, di "Diyarbakır'ın Sesi" de nivîsandinên min derdiketin. Gorbihîştîyê Mûsa Anter ez ji çapxanê pîrsî bûm. Naskirina min û wî li wir çêbû.

3-Mîrza Cebraîl Kilimci, xwediyê rojnama "Mardin Sesi" bû.

4-Li Midyadê, ji teref Mîrza Melek Gündüz, rojnama "Turan Şehir" dihat derxistin.

5-Pamuk Baba, laqabê Mirza Canip Yıldırım bû.

6- Sîfî Rawşen, keça Hiseynê Haco ye. Hiseynê Haco, yek ji muessisê Xoybûnê bû. Digel vê, serokê Cemiyeta Xeyrî ya Belen-gazan bû.

7-Xelo û Celô; gotinek mecazî ya Kurdî ye. Di nava xelkê de, heyrê û neçariyê tîne ziman.

8-Gotin, di banta Ciwan Haco de, ya Sî û Sê Gule de tê gotin.

9-Helbest, ji pirtûka Mirin Nabe Xelat e, nehatiye weşandin.

10-Qesrî, li serdorên gundê me, bo malbata min tê gotin. Ber, xanumanên malbata min raserî gund in, teva jî Qesr in. Sala ku gorbihîştîyê Kekê Mûsa Anter bû namzêd bo parlamento, hate gundê me, di navbera me de ev galgal bû dabaşa henekan. Ji bîr nekiribû.

11-Polîsê Tirkan li min digeriyan. Ez firar bûm.

12-Helbest, ji pirtûka Mirin Nabê Xelat e, ne hatiye weşandin.

HAWARA MIN!

MARGERETA

Li vir, li cem
li rûbarê xwe yê şîn û fireh rûniştîme.
Temaşe dikim li wan daran,
di avê de xweş têne dîtin.
Çimkî rûbarê min
ev rû wek neynikê
ron û mend e.
Masiyek xwe jê dihilavêje
av jê dipejîqe dibe pêl
û pêl di nêv avê de belav dibin.
Dengê teyran
ji ser daran tê guhên min.
Givegiva mêşan
ji nava baxçeyan tê guhên min.
Çaxê li ava gulan dimijin
û hingiv çêdikin...


Ez dibînim

nîlûferan belgên xwe yên kesk û mezin
berdane ser vê neynika rûbarê min.
Li dûmahiya koma ewran
çavên min bi esmanî dikevin.
Wey cihê min!
Çiqas pak û rind e!
Lê cihê te çawan e?
Û jîna te çawan e?
Baş pê dizanim
ax! geniya Qampa Qiziltepê
û mala te reşmalek qirêjî.
Ev du sal in dirêjî
tu derd û janê dikêşî...


Dikêşî
li nêv bayesarê zivistanê
li nêv teqûn û baranê.
Tu bîrs û tihî û pejîkan
germ û bablîsokan
li havînan dibînî
û nanê bi jehrî...
Ey hevalo!
bi êş û kerban
bi hemî gef û lêdan
bi derd û mirin
lê ez bi ageh in.
Tu nabînî ev rûbarê weh tena.
Lê dibînî du hezar reşmal û bêtir
û cendirmên bi rext û tiving
û têlbenda sîmeyî
li dorên te raçandî...
Çi carinan
deng û awazê teyran
nayên guhên te qet?
Lo hevalo bêje!
Ew çi deng e tê guhên te?
Ji hemû deran
pîstepîst û girî û qêrîn,
û ji hemû cihan dengê tirsê...
Ne mêş hene li nêv baxçan ku bifirin

ne jî darin li gel bayê bihejin.
 Çendî his dikim
 serbest bibî û ew Qamp jî
 nemîne li barîgeha Qiziltepê.
 Pazdeh hezar Kurd êş û jan dixwin.
 Divê rojek bêt, hevalo!
 Hemû Kurd û tu jî vegerin malê,
 serbest bibin.
 Hingê
 giş azar û derdên kişandî
 dê bêne jibîrkirin...

Dosta kurdan **Margereta**, di Tebaxa
 1990-î de, gava ji Emerîkayê çûye Bakurê
 Kurdistanê û çav li Kampa Qiziltepeyê
 ketiye, ji perîşaniya kurdan re kezab lê ariy-
 aye û ev helbest bi zimanê Îngilîzî
 nivîsiye. Helbest di 12/1993-an de li
 Emerîkayê, di hejmara 3, rûpelên 219-220,
 ên kovara Kurdistan Timesê de hatiye
 weşandin. **Newzad Shokrî** jî, ew ji
 ingilîzî wergerandiye kurdî. Em jî pêşkêşî
 xwendevanên Nûdemê dikin.



BÎRANÎNA CEGERXWÎN



Sebrî BOTANÎ

Sal:1945, Cegerxwîn jîna xwe bi kurtî nivîsiye û bi van peyvên sivik û dijwai bi dumahî aniye:

*Ev cîhana xapînok heta me jê xwe nas kir
Çi bikûn fêde nemaye, emrê xwe min xilas kir
Çima rastî dibêjin, li nav dîna biûme dîn
Heta binrin, ji nû ve xelk ê bêje Cegerxwîn*

Mixabin, ev gotina wî rast derket, heta

nemir me nas nekir, me xemek jê nexwar -lê ew, xemhilgirê me bû, li me dipirsî û bi xwîna dil dinivîsî. Dengêkî zelal û bilind bû, hawar dikir, bilûra doz û daxwazên me bû, xweş dilorand, jîna xwe hemî di ber imiletê xwe de mezixand, tev bi girtin û zîndan û derbederî bire serî û li şeva 21. 22/10/1984 dûr ji welatê xwe yê şîrîn serê xwe danî û êdî nehitanî. Dilê mezin ji lêdan ket, canê şîrîn ji cendekê têrxem ber bi asîmanê bilind firî... Ew destê ku dezgirtiya xortan, bilbil digot, bêriya welêt, va ye rê, fala qereçiyê, mela rabe, pîra mirovxiwer û gelek nivîst û dîwanên hêja nivîsandî. Bi carek ji kar ket... Ji kar ket, lê piştî ku têra me û xwe ziman û rewşenbîriya kurdî bi hev werarkirî:

*Min ji bo we gelek hişt
Min dîwan û hun nivîst
Gol ji avê bûye mişt
Ez nizanim çî bêjin.*

Di van hemî dîwan û nivîstan de Cegerxwîn ji bo milet û welatê xwe stirand, ji bo jîn û evînê stirand, ji bo mirovatiya dinyayê stirand, li dijî hêzên reş û stemkar stirand, li dijî mirovkujan stirand...

Wî qet sistî nekir, heta mirinê li ser soza xwe ma:

*Heta dil ranewestî
Ez nabêjin bi sistî
Kêr gihaye ser hestî
Ez nizanim çî bêjin.*

Eger serketina kesê hunermend û şair ew be ku berhemên hiş û bîrên wî di ser û dilê welatîyên wî de cî bigirin, bêguman

Cegerxwîn gelek bextiyar e û va ye em dibîmin ku mînakê wî li ser perê dil e.

Her çend me tibabek berkefî ji axavtin û tevgerên Seydayê Cegerxwîn nivîsîne û hemî jî berdest in, lê niha di vê bîranînê de û ya di ciyê xwe de ez bişêm bêjim, ew e ku hinek ji bîranînên xwe yên wî çaxî ku behîştî li Mûsil û Bexda û paşê jî li Kurdistanê dima, pêşkêş bikim. Û çend gotinên kurt jî ji devê wî yê zêrîn. Û neçar in jî du-sê movikên kurt û kesnebihîstî, ji serhatiya wî li Iraqê di vê bîranînê de perdê ji ser rakim û carna ji babetê xwe jî derkevim. Lê ne ji kevlokê xwe... Diyar-kirina rola Cegerxwîn di hişyarkirina milletê Kurd de û pesnê welatperweriya wî ne hewceyê gotinê ne... Jixwe lêkolîn û tûjandina berhemên wî ji her alî ve, ji min zêde ye û qet ne fihêt e jî eger bêjim: Ez ne siwarê vê meydanê me. Nemaze şîrên wî tijî di nêv de îşaret û nîşan û navên efsaneyî, dîrokî, cihên dêrîn û dastan in, û her yekê çîroka xwe heye... Min ne bawer e kesekî din weke wî şiyabit hinde nav û nîşan û naverokên keleporkî bi awayekî hunerî di şîrê de bi kar anîbin û ew heinû mînak û kevalên nû jê çêkiribin, an afirandibin, ew mînak û kevalên ku dê wek çirayên geş di nêv tor û rewşenbîriya kurdî de bimînin û qet venamirin... Wî ne kêmtir ji şêst salan got û nivîsî... Gelek nivîsî û kêma çap kir, û uşta çapnekirinê jî em hemû dizanin çi ye... Mixabin ew kêma çapkirî jî li me bibû xwîna siyahoş, nemaze li Kurdistanê Iraqê, ji hezar kesan yekî dikarîbû berhe-meke wî peyda bike, wî jî dest lê dimiçand, li vir gereke bêjim ku rola melan, feqiyaniya jî yê hîkar "muelim" û şagirdên hîngehan mezintir bû...

Hingê wanên "Hawar, Stêr, Ronahî û Roja Nû didîtin û dixwendin tiştek ji Cegerxwîn dizanîn. Ji wan Îzzet Ebdilezîz, Salih Yûsifî, Şewket Akreyî û jîdirêj Mihemed Emîn Osman tek tek ji Dîwana wî ya Yekem û paşê jî ya Duyem û Çîroka Reşoyê Darî, li Mûsil û Zaxo û Şingar û Rewandiz û Silêmanî û Kerkûk û Hewlêr jî li cem ronakbîrên Kurd ên wî çaxî peyda dibûn. Lê wesa jî bêturê milletê Kurd li Kurdistanê Iraqê -eger çî navê wî bihîstûbûn û dibihîstûn lê tiştek ji çalakî û tevgera wî ya rewşenbîrî û ramiyarî nedizanîn- lê ku li Sûriya digirtin û diêşandin. Bas û navê wî di belavokên partî û saziyên nihênî yên wî çaxê Iraqê de dihatin. Û beyatî û herdu şairên navdar ên Kurd Goran û Bêkes agehî jê hebûn, jixwe "Esîrî" ji tevan bêtur hej Cegerxwîn dikir û Cegerxwîn jî bi çavekî bilind berê xwe didayê, ew helbestên hingê di kovara Hawar û Zarê Kurmançî de arasteyî hev kirine, xweşbelge ne bo wê pêwendiya wan.

Di salên Çilan de tibabek ji Dîwana Cegerxwîn ya Yekem li devera Şingarê hate girtin û li Mûsilê şewitandin. Paşê digel serketina Şorişa Çardehê Tîrmehê Helbestên wî jî pêlweşa kurdî li Bexda hatin xwendin, hemû jî nû honandî bûn. Wek: "Peymana Bexda û zincîr ji gerdenim şikest" û hwd... Di vê navê re jê daxwaz kirin biçe Misrê û bernamêyek ramiyarî bi zimanê kurdî ji Radyoya Qahîre pêşkêş bike -elbet ji ber ku li Sûriyê hebûna milletê kurd mandela dikin, nedibû, ji Radyoya Şamê pêşkêş bike, lewra berê wî didan Misrê ji ber weca rejîma xwe- her çendî wî nedikir jî lê çima nedigotinê ji Radyoya Şamê pêşkêş bike!! Paşê ji

nişkê ve û bi mal ve li Mûsilê re derket, efserekî leşkerî digel digeriya, çend rojekan mêvanê dewletê bû, û li Otêla Kîropê Ermenî dinivist... Ji wan kesên dihatin cem û hatina wî girîng didîtin, sexbêrî û alîkariya wî dikirin, şehîdê welatê xwe Seyda Enwerê Maî, Mela Şemsedîn û Ehmedê Se'îdê bûn û hinek ji kurdên mişextî jî dihatin; xortekî ronakbîr û hêja digel bû, navê wî Osman Berazî bû. Bas, basê zimanê kurdî û ferheng û dîroka kurdî bû... Paşî zo li pişka kurdî ya Kulîja Adab-Zangoya Bexdahate terxankirin, Seydayê Dersa Kurmancî û li Radyoya Kurdî jî du bername, yek dîrokî û yek edebî berhev û pêşkêş dikir... Lê



Cegerxwîn û tenahî ne bi ser heve ne, belayê serê xwe lê hilda. Jê daxwaz kirin ku li Iraqê nemîne -erê hingê jî wan kesên ku xwe ji kurdan dihejmartin bizava rateqandina wî kiribûn, lê vê bizava ber negirtibû- xwe berhev dikir da riyekê ji xwe re bibîne, fermana girtina wî derçû. Eha li

vir, bi navê Cegerxwîn û ji devê wî bo tarîxê dibêjim û ez bi xwe jî agehdar im ku: Rehmetî Şêx Xalidê Neqşebendî - Banernî- ji hemî dilê xwe bi germî piştî wî girt, xwe di ber de westand û ji girtinê parast, kir ku bi azadiya xwe bê rîp û bela ji Iraqê derkeve... Ev alîkariya ku Şêx

Xalidê Neqşebendî ji bo Cegerxwîn kirî li wan nehezên wî giran hat. Digotin: Xalid li kû û Cegerxwîn li kû?.. Ev gotina wan ber guhê Xalid ket û got: "Ew kesên vê dibêjin, xelet in û bê xîret in jî. Rast e ez û Cegerxwîn bi hizir û bîr û baweriyên xwe ji hev dûr in û ez ne digel rîbaza wî ya felsefî me, lê Cegerxwîn şairekî mezin e û dengê kurda ye; di tengaviyeke wek vê ya ew niho tê de ye, ez neşim patika xwe bide me. Xasîna ew kesên harîkariya wî bikin, hinek ne diyar in û hinek jî di xwe re nabînin."

Cegerxwîn ji Iraqê çû. Ka çawa hatibû, wisa jî çû, destek li pêş û yek li paş... Çû, lê çû kû? Ma kengê çiyek bo yên wek wî heye lê biêwirin an tê de hêsa bibin?! Çû Sûriyê, wek yê "Ji ber dilopan çûyî ber şirikê" girtin û sergûm kirin -şandin bajarê Swêdê" çiyayê dirroz xelkê wê gelek sexbîrî lê dikirin, heta binemala Sultan Paşa "El Etreş" jî pîte didanê û wek rewşenbîrekî mezin û şoreşvan lê dinerîn.

CEGERXWÎN Û REWŞENBÎRIYA KURDÎ

Cegerxwîn ala rewşenbîriya kurdî hilgirt û bi wî zînanê xwe yê şîrîn dewlemend kir, taybetî û resenayetiya awa û rîbaza wê jî parast -ji êrîş û kartêkirina awa, kêş û pîvanên biyanî parast- me ev got çiku dîtaniyek (I) heye carna ser hildide û dibêje: "Tenê mîletê hêja!! Torê xwe yê taybetî heye!!" Yanî divên bêjin: Hinek mîlet hene bê tor in - torê xwe yê taybetî nîn in! Torê wan ji torê mîletekî din e!.. û hwd...

Bêguman ev dîtaniya wan bê binyat e,

lê heta eger rast jî be, gelek ji mîletê me dûr e û yê hêjatir û xwedanê taybetîtir mîletê me ye. Kelepûr û zargotina me -stiran, lawik, dîlok, pîrepayîzok û pendên pêşiyên me... Jêderên binyatî ne bo tor û rewşenbîriya me. Ev jêderên me, hezar dîtanî û gotinên wek vê pûç dikin. Lê çawa?! Helbet ew jî xwendina berhemên wan nivîser û rîstevanên ku pîte bi kelepûr û zargotina mîletê xwe dikin, çêtir diyar dibe, helbet gelek çiqî jî kelepûr diçin û gotina me li ser torê ye -nemaze yên Cegerxwîn gelek têr nimûne ne, de ka "Dengê Perîşanê, lolo pismamo, lavlav çî ne, Pîrî û Ciwanî û hwd... Çi pêwendî bi naverok û awayê mîletekî din ve hene? Ku hemî ji kartêkirina zargotina me hatine afirandin û babetine nû jê çêbûne... Taybetiya me ev e û bêna welatê me jê tê, şeqî û hêla pêşiyên me pê ve ne, binyatê rewşenbîriya me ji kelepûrê me ye. Heya Seydayê Xanî bi xwe jî bi saya dastaneke kurdî, alaya rewşenbîriya kurdî bilind kir. Û husa xwe li me kir şekir.

Cegerxwîn di vê meydanê de rolek mezin leyizî, gelek keval û mînakên nû jî kelepûrê kurdî û ji yê mirovatiyê jî afirandin û rewşenbîriya me pê werakir. Dîwan û nivîstên wî, çapkirî û neçapkirî, ji naverok û awaz û awayên taybetî -xumalî da-girtine. Evîn, rûmet, sinc û felsefa jîna me ya civakî jê dibarin, hemû jî her yekê bi şewazek spehî û bêgirê di qalibek kurdî û pîvayî de li rîstên xwe givirandin, ku qet bawer nakim şairekî din hebe şiyabe wek wî û temetî wî, zargotina mîletê xwe ji bo amancine nû, bi remz û pesinên delal û bi hêz erk dabitê û bi sefîqa kurdî parastibe, bê ku temetî serê derziyê ji resenatî û zelaliya wê şêlû bike. Ev e dê

nimûneke evîndarî pêşkêş bikim, eger çi nemaze feqî û mela bi awayekî dilşewat awaz dikin û dixwînin, lê hem "serêlî" ye jî, helbet ên weke vê û ji vê çêtir û naziktir jî di dîwanên wî de mişe ne. Lê tenê wek nimûne em vê pêşkêş dikin çikû pêwendî bi vê gotina me ve heye. Bixwînin, bibînin ka çawa û bi çi reng û awayî Seyda Çiyayê Sîpanê Xelatê bi dastana "Xec û Siyamend" ve bi kurtî di kevalekî spehî de berçav kiriye û çawa dilê kesê bi amanca xwe şad nebûyî xeingîn dike.

PÎRÎ û CIWANÎ

*Ji remza ew birîyên te yî qews û heyvî
Nemaye min ji emrê xwe tu hêvî*

*Li ser palên ecêl hey-hey dibazin
Ji serjor dabêristin semîşvî*

*Bi min pîrî gihîşt û çû ciwanî
Şikest û çû ji ber boxê birvî*

*Bi min tenha hebû canek û ciwanek
Me nûvî da evîne nûye nûvî*

*Ewê dî tev me daye ber piyên te
Di emrê xwe de nedûbû min kirvî*

*Me ah û çavbelek dî û me da pey
Li ber min bû beranê qertekovî*

*Me nêçîra xwe girtî wek Siyantend
Di piştê min de xîpek zir belûvî*

*Li Sîpanê Xelatê ez dinalim
Tu maye wek Xeca dot a Silvî*

*Cegerxwîno gelek şêrîn wekî te
Di vê rê de qelistin bûne rîvî.*

CEGERXWÎN WEK XWE YE

Piraniya şair, nivîsan û hunermendên vê cîhanê, eger kevn û eger nû, tu berhemên wan bixwîni û awa û şêwaz û rêça kij wan bo xwe girtî û li ser çûyî bizanî, dê bibîni ku yekî din ji wî kevtir an hevçaxê wî kartêkiriye. Helbet ev di hevberkirinê de çêtir xuya dibe. Bo nimûne ez dibêjim: Gelek ji şair û nivîsevanên bi navûdeng ji wan miletên di Zîndana Emperatoriya Osmanî de bûne, bigire ji destpêka vî çerxê em tê de ta van salên dumahiyê jî, kartêkirina nivîskar, torevan û rojnamevanê tirk ê navdar Namik Kemal bi berhemên wan ve diyar e, çi şîr û çi pexşan. Jixwe eger berhemên hinek ji wan bîni hevberî ên Nanik Kemal bikî, dê bibîni ku ji tirkî wergerandine. Lê pa jêderên Cegerxwîn ax û av û bayê welatê wî ne. Ji Zevîka Hevend û Rezkê Temo û Pergala Sofî Siino dest pê kiriye. Pîra Torê û Fata Serbirişk kartêkirine, paşê hê nû cîhan daye ber xwe, ramyarî, civakî -aborî- evîndarî- dîrokî û pişesazî... Eger qeymegir û babet pîvên dûrbîn û ratsbêj hebin, dê bibêjin: Dem û qonax ji Cegerxwîn re nînin... Çiku tibabek ji babetên Dîwana Yekem herwekî li zemanê Xanî hatibin nivîsandin û vane ji sala 1945'an ve têne xwendin û vê gavê jî ji her alî ve neynika şîr şadiya jîna me ne. Ew ji Dîwana Şeşê çêtir e û berevajî jî rast e û hemû jî her wesa û qet li kêmê nedaye û dê bavikê piştî me jî vê bêjin û hingê jî dê wek niha babetên germ û taze di nêv de bibînin û

bikin jêderên dîrokî jî...

Kesê Dîwana wî ya Yekem baş xwendibe, ew başî hînî zimanê xwe bûye û miletê xwe jî nas kiriye û dîrok û cografya wî jî zaniye.

CEGERXWÎN Û KARÊ RAMYARÎ

Gelek caran endamên partiyên siyasî û kesên serbixwe jî, jê dixwestin ku mayê xwe di karê siyasî de nekê... Dogotin: "Siyasî be, lê xebata siyasî meke, tu şairê milet û welat, xwe meke alişê rexekî tenê, nemaze tu pîr bûyî û êş û janên pîrîtiyê serî ji te standine." Lê Seyda bi hişkî bersiv dida û digot: Ez neşim ji xebatê dîr kevim, ez pergala miletê xwe dibînim, gereke bi wî re û ji bo wî -bixebitim, tim li kar bim, şair im û gereke şair wek gotina xwe bî, gotina wî û kirina wî yek bî. Şairê ku ne wisa bî, bila devê xwe bigrî û êdî qet venekî. Dûrketina min ji tevgera şoresgerî û ramyarî, bêrûmetî ye. Bêrûmetî jî, mirina mirovê sax e.

ŞAIRÊ ÇÊTIR KÎ YE Û ÇAWAN E?

Ji Cegerxwîn pirsîn:

- Te divê şair çawa be?

Got:

- Win çima vê pirsar erzan ji min dîkin? Şair ew e ku digel xwe û miletê xwe û mirovatîyê rast be... Şairê çêtir ew e yê li jêr derdên giran û dijwar serî hilde... Şairê çêtir ew e yê ku xebat û kêferat û nalîna rencherên zehmetkêş, bi xwîna dilê xwe bi şêwazekî hunerî dike şî'r û belav dike... Şairê çêtir ew e yê ku bi destê milet, wan

perdeyên ku bi xap û pîlan hatine xemilandin û bi peyv û gotinên qelew têne pîrozkirin, diçirîne û stemkaran riswa dike; bi kurtî gereke şair têkoşer û mirov be, hevalê miletê xwe be.

CEGERXWÎN Û FERHENG MEZIN Û TEYAYÎ

Cegerxwîn, ji mêj ve hay ji vê ferhenga me ya berniyaz hebû. Ew ferhenga ku sala 1918 Komela Kurd li Stanbolê di kovara JÎN'ê de navê wê aniyê û gotiye: "Komele dê ferhenga kurdî serast bike û biweşîne, hemî zarên kurdî dê di wê da cî bigrin" (2).

Her weha nivîsvanekî kurd bi navê "Kurdê Bidlîsî" di hejmareke wê kovarê de gotarek di biwara ferhenga giştî belav kiriye. Cegerxwîn her digot: "Eger sê kes, her yekî li devera xwe alîkarê hev bin; peyv û navên kevnar û cihên dêrîn ji devê xelkê û ji stiranên kevn û Gotinên Pêşyan wek awayê lêvkirina wan û ristandê ji hev re bişînin û li gor tîpa serê peyvê her yekê di cihê wê de di desterekê de, li cem xwe binivîsin, dê di demeke kurt de bi vî awayî ferhengekê li me zêde bikin û li pêşerojê bibe alîkariyek ji bo ferhenga me ya mezin û tevayî."

Paşê, sala 1959, li Mûsilê ev gotina xwe ji bo mêvanên xwe diyar dikir. Piştî hingê jî, li sala 1962, di pêşgotina "Ferhenga Kurdî" hejmar: 2 de gotiye: "...ev tiştê ku me di van herdu hejmarê ferhenga xwe de nivîsiye, ne tenê kurdî eve -ne tenê kurmancî eve, belkî ne tenê tiştê ku dizanim ev e. Belkî gelek tişt hene ku nehatiye bîra min, çawa ku gelek şêwe jî hene nizamim, belkî alîkariyek e ji bo ferhenga mezin -Ferhenga Kurdî ya tevayî..."

CEGERXWÎN Û REXNE

Eger çî me heta niha tu rexne û lêkolînên edebî ji nivîsîna wî nexwendîye, lê di nameyeke xwe de, daxwaza kitêba "Tebî'et-ul Muctemî'-il Kurdî Fî Edebî" ya Bedirxan Sindî ji min kiribû. Paşê ji bersiva wî min zanîbû ku ew hevalê avakirinê, nijlandinê ye. Ne yê herifandinê, di meydana rexnê û lêkolînê de... Gotibû: "Di Rojnameya -El Taxî-de. Mamosta Ebdula Hedad di biwara kitêba Tebî'et-ul Muctemî'-il Kurdî Fî Edebî nivîsiye, ca ji ber ku babetê kitêba navbirî li cem me dergehek giring e, hez dikim bixwînim, eger te heye bo min bişîne, eger te nîne jî peyda bike û ez soza vegerandinê jî didim."

Me daxwaza wî bi cî kir û paşê piştî bêtîr ji mehekê digel nameyekê li min vegerand, gotibû: "Bi texmîna min ev kitêba Bedirxan Sindî tişteki baş e û Mamosta Ebdula çî fayde negihandiyê. Kêmasiya berhemê hev diyar kirin, lê bi nermî û dûr ji kerb û kînê, kêmasiya wê ew e ku ne bi zimanê me ye. Dilê min çûyê ku bikim kurdî û hinekî li ser baxivim û kêmekê ji cem xwe jî berdim ser. Lê mixabin me ne çap e û ne delîve û ne jî dirav... Jibîr mekin jî ku gelek kitêb û babetên pêwendî bi me û welatê me ve bi zimanên biyanî hatine nivîsandin û çapkirin. Ca çî kurdan ew nivîsî bin û çî jî nivîskarên biyanî. Wek nîmûne, ez dibêjim: Çi dema win berhemên Ehmed Arif ê diyarbekrî bikin kurdî, win reng û deng û rewş û rûçikên xwe yên dîrokî û civakî tê ra bibînin."

DIDÎT, DİPIRSÎ Û PAŞÎ DINIVÎSÎ

Di rêya hatin û vegerana xwe de, gund bi gund û zom bi zom dipirsî û dinivîsî. Cihên dêrîn, bûyerên nû, navê gund û yê deramet, her tişt dinivîsî û dikir dîrok "Tarîxa Kurd" û ziman jî pê werar dikir. Ew rêya ku tê ra diçû êdî tê ra venedigeriya -eger şiyaba- da ku hin gund û cihên nedîtî bibîne. Car peyade, war bi war, car jî li kerê Silo siwar... Rojekê gehişt û ev helbesta nazik ji bûyerên dîrokî û qaremanên navdar ji bo rewşa xwe ya wê gavê honand, bibîn çend west û zehmet û hêvî jê dibarin.

*Bese dîlber heta kengî li Şan û geh li derbend bim
Di benda zulfê me îro heta kengî di nêv bend bim?*

*Evîna te kirim seyda û Seyda tum bi nafîn e
Gelo dîlber dîxwazî ku di vê rê de Siyamend bim?*

*Dilê min xweş dikî nazik, li nûn bîrhên xwe dişkênî
Dîxwazî derkevîm şaxan weku Îhsan û Ferzend
bim?*

*Ji nûn Şîrîn dîxwazî ku wekî Ferhadî aza bim
Bikolîm kohê Qendîlî ji Xesro re hînermend bim?*

MIROVATIYA CEGERXWÎN

Zilamekî Berwarî pîrsyara pîremêrekî ji malan kiribû, bê ku bizane ew pîremêr Cegerxwîn e. Gotibû: "Pîremêrek bê serûber û qelew e." Wan jî Cegerxwîn nedinasîn û gotibûnê: "Ew pîremêrê tu jê dibêjî, em nizanin kî ye û çî kes e, lê ku carcara tête gundî, ew û kak Botanî bîstekê vêkra diaxivin. Here ji wî bipirse,

belkî ew tişteke jê bizane."

Hat û min jî gotê: "Ez tişteke jê nizanîm, lê min bihîstîye, dibêjin (Xidrokê Dîn), wî ku ev ji devê min bihîst, heta jê hat tepek li ranê xwe da û serê xwe girt û got: 'Ez ji Xwudê xilas bim min dizanî ku ew pîremêr an dîn e, an jî Xocê Xizir e". Min gotê baş e. Lê te çawa û ji çi zanî? Got: 'Ez rê ve dîtîm, digel xwe hînam û çakête xwe ji ber xwe kir û kire ber min û betaniyek hebû bi vê xencera min kir du parçe, parçeyek jê da min û sê Dînar jî hebûn, ew jî li min û xwe nîvî kir. Lewra min hizir kir dîn e, an jî Xocê Xizir e, lewra jî ez pirsyara wî dikim."

Paşî ku min ev ji Seyda pirsî, heza şî'ê hatê û got:

*Cegerxwîn in ji van derda
Li meydanê xwe zû berda
Di nav bahoz û bager da
Bi bîr û bawer û dozim
Ne Şewqî û Zehavî me.*

CEGERXWÎN Û CIVAT

Em niha li 25-ê Gulana 1969-a ne. Sîha pêşhatina tarîbûna êvara dereng xwe li quntara Çiyayê rengîn daye; zeratiya rojê hêj kumbed û navsera wî bernedabû, nêzîkî 14-15 kes hevnas û hevnanan wek komika sêwîyan li ser tatekî pan û nîzin li hev rûniştûbûn û bi bîrûbawer û gotinên vala berengarî hev bûbûn... Serî li hev gêj kiribûn... Hişê hev reş kiribûn... Saloxên çîrokeke dirêj û aloz ji hev re digotin, agirê babetên vê çîrokê derd û xemên xumalî û kesalî ji bîra wan biribû... Piştî berhevdaneke dijwar û dilşikên yekî got:

"Va ye Cegerxwîn jî hat, ya rast ez wî nasim, lê vê spêdê li mala Cihadê Akreyî mêvan bû." Biraderekî din got: "Me jî bi çav nediye, lê ew kî ye ku navê wî nebihîstî û ji dûr ve nas nekirî? Ev hatina wî xweş delîve bo hevnasîne û belkî em bişên bi şîreteke wî li hizrekê jî bicivin û belkî me ji xwe re bike hêvênê şî'rekê jî." Seyda hat û got:

- Êvara we xweş, lawino.

- Ya te xweştir, li ser seran hafî Seyda.

- Win çawan in? Çi dikin û çi dibêjin?

- Ma em dê çi bibêjin? Em kul û kovanên bûka Dîwana te ji hev re vedguhêzin û dilê hev jî dişikênin.

- Qe dilê hev meşkênin, eger win bi bîrûbawer ne yek bin jî, ji bîr mekin ku jana we yek e. Dîwan û bûka Dîwanê jî di nêv stiranên we de têne dîtin, ziman, huner, dîrok û felsefa jîna we jî, hemî di nêv stiran û zargotina we de ne. Bi hizra min yekbûna we jî wilo... Xwezî hevalêkî ji we bistiranda... Bistirin, stiranên kozik û çeperan bo min û xwe bêjin, stîrana evîne bêjin, qîzan bi nêrgîzan bixemilînin û pêşkêşî xeyala hev bikin.

Dengê stirana (Emê Gozê) li wî zinarî deng veda... Yekî got: "Birano, me ji xweşiya hatina Seyda hay ji xwe nemaye, şevê jî ser me de girt û hinek ji me cihê raketina xwe jî nîzanin..." Yekî din got: "Ma kengî me cihê temara xwe zaniye, da vêca îro em bizanin? Her cihê em digehîne xopana me ye û em lê radikevin."

Civat bû du birr, birrekî got: "Em ji civata Seyda têr nabin, gereke destûra çûna me bide." Birra din got: "Ilqê-bilqê, heta Seyda me bi xwendina şî'rekê xelat neke, em ji ser vî taû nalivin, hema em ê li vê çola Xwedê rakevin, haiha ev e ez

mexilîm."

Zeratiya rojê xatir ji kolosê Çiyayê Mezin dixwest, hingê di wê gavê de dengê qeqqeba kewekî ji wî pesarê jorî hat; qeqqeba hey qeqqeba... Qeqqeba vî kewî û daxwaza lawan aşûpa Seyda hejandin û rahêlayê û got... Got, ma hema got! Hingiv ji dev dibarî.

*Delal e, nû gihaye, li ser min pir biha ye
Evîn her dem weha ye, Ciwanîyê çi kar e?*

*Şêrîn û gewr û naz in, ji dil em hev dixwazin
Li nav dara dibêzin, sê daye ser zinar e*

*Dengê avê bilûr e, ba li pelan dibûre
Em gûh didin tûlûr e, bilbûl qîr û hewar e*

*Êvar e çaxê xewê, kew gihaye mêkewê
Ketûme ber singa wê, çihan xweş û bihar e.*

Usa ta bi vê kêş û peyvânê hew nekir, devê zêrîn neket ser hev. Wî bi van peyvên nazik rewşa dîmenê wî cihî mîna kevalek delal û rengîn berçav kir. Husa dît û husa got, wî ew got ya ku dîtû, ew cî li ber wan xweştir û delaltir kir, lewra tevan vêkra bê hemdî xwe çavên xwe li hawîr xwe, rast û çep gerandin, gotin: "Pa bi Xwedê Seyda baş nişa me kir", yekî ji wan gotê: "Ya rast me jî dizanî û didît ku ev der pîr xweş e, lê pêş xwendina şî'rê me nedizanî em di vê behîştê de ne, lê niho piştî xwendina wê em jî wek te dibînin..."

Husa Cegerxwîn herdu çûn ji xwe û ji hev jî razî kirin, dema di şî'rê de diyar kir ku rast e "Êvar e, çaxê xewê ye" her şî'r jî xwend li ser daxwaza wan hevalên digotin em ji vir nalivin, ta Seyda me bi şî'rekê

xelat nekir. Herweha ji wê berhevdana wan ya hişk anîn xarê û nêzikî hev kirin. Nemaze piştî ku xwe kenandî û gotî: Lawno, hevalno, gereke win her dem di berhevdanê de nerm bin. Êdî bes e, çêtir ew e hûn bi yekdeng û dil bêjin:

*Baz im, çiya koza min e
Serbestî tum doza min e*

CEGERXWÎN, QEDRÎ CAN Û ŞÎ'RA SERBEST

Ji sala 1937-1941, Qedrîcan bi çalaki şî'rên xwe û yên şî'rên Kurd bi eşkera ji bo feqiyên mizgeftan dişandin, û bi nivnihênî -ji dizî ve- li nêv şagirdên Kurd jî belav dikir. Salek ji wan salan Qedrîcan bûbû seydayê Hîngeha Seretayî ya Êndîwarê. Mela Ehmedê Zivingî xwudanê "Şerha Dîwana Cizûrî" ew jî melayê mizgefta wê bû. Û Mela Ebduselam Nacî jî her dîsa li wê Mizgeftê ders dida. Li sala 1938, Qedrîcan tibabek şî'r ji bo wan feqiyên ku li Mizgeftê dixwendin şandibû. Wek niha tê bîra min, rojekê feqiyek hat, gotê: "Tu Xwudê! Qedrî efendî, ew çi bû? Çi nivîs bû ku te digel şî'ra Cegerxwîn û ya Ehmed Namî ji me re şandî?.."

Qedrî gotê: "Ew jî şî'r e, şî'ra nû ye, ya min e, ez wilo jî şî'rê dinivîsim. Ma çawa ye? Tu çawa dibînî, Feqiyê delal?"

Feqî gotê: "Pa te çima navê xwe li serê nenivîsîbû? Yan te jî bawerî pê nîne? Xwedê wekîlê te be Seyda, yekî digot: Ev şî'ra zarûkan e, yekî din digot: Eve ji nû, em şî'ra bê lêv û difn dibînin, yekî digot: Pîskirina şî'rê ye, hinan jî digotin: Mixabîna wê kaxezoka li serê hatiye nivîsandin, hebûn jî digotin: Ew dest

bişkê ê ku nivîsî, tenê du kesan digot: Ya rast, bi gotinên xwe xweş in. Lê xwezî şîr bûya!!"

Qedri Canê rehetî xwe kenand û gotê: "Kuro, babo, stiranên me jî wilo ne. Ma stiranên me çawan in? Xwe şaş mekin! Pa çima heya niha kesekî din ev nedaye ruyê min?"

JI DEVÊ CEGERXWÎN

Di sala 1976'an de Ehmedê Cizîrî li Bexdayê ez dîtîm, got: "Ger tu dixwazî Cegerxwîn bibînî, were." Çûn û li gazînoyekê veder û berav min dît, keyfa xwe bo min anî. Min jê pirsî: "Qedrican di Dîwana te ya Yekem de gotiye: 'Şa'îrê Şe'bî... Şa'îrê me yê Şe'bî.' Tu çi dibêjî?"

Got: "Ew hizra tu dikî, di serê Qedricanê canêr de nîn e. Wî bi vê gotina xwe, dilê min xweş kiriye; serê min mezin kiriye, wî gotiye yanî Cegerxwîn şa'îrê millet e -millî ye. Ku bi rastî jî, ez xwe wesa dibînim, lawên me jî vê dibêjin... Win vê peyvê ne di cihê wê de didine kar. Ereb jî -herwekî ku min ji wan bihîstî- ne di cihê wê de ji bo kelepurê tiras bi kar tînin û kirine beramberî peyveka Ewrûpî. Lê ji bo ku tu baş têbigelî, lazim e bêjim: Li cem min, Cizîrî ji Xanî şa'irtir e û şirtir e jî. Lê Xanî şa'îrê milletê xwe ye -millî ye, giştî ye, çefakêştê amê ye, anî -yanî xelkê- xelk millet e- Xanî welatî ye- milletî ye... Lê pa sultanê şîr û şa'îran, Melayê Cizîrî ne wek wî niştîmanî û millî ye... Nimûneke din ji vê Bexdayê: Resafî, şa'îrê millet e -millî ye- Şe'bî ye. Lê ez neşim vê gotinê bidim Zehayî... Lê çima te berî niho ev pirs nedikir?"

Min got: "Ji nû îsal li mala S. Amêdî

min Dîwan xwend û hizir meke jî ku min bawer kiriye û ez poşman im jî, li min megre..."

Seyda got: "Qet poşman mebe, te qenc kir, çiku vê pîrsê pêwendî bi zimanê nivîsandinê ve heye. Em ji bo millet dinivîsin. Ya qenc ew e ku millet têbigihê. Eger na, ji bo çi ye û çima û ji bo kê em xwe diwestînin?"

Herweha amanca me nermkirina zimanê nivîsandinê ye. Ji aliyekî din ve gerek e win bizanin ku her meydanek batek û awayê xwe heye. Çawa ku babetê siyasî, şoreşî, civakî, zanistî, evînî û hwd... her yekî ta radeyekê peyv û navên xwe -naverok û awayên xwe yê taybetî heye. Husa her cotkar, pale, jin, law, zaro û hwd... Herweha her rewşenbîrek, hunermendek, nivîskarek jî awayê xwe heye... Nerm..., hişk..., şîlo, zelal, çi wextê Seyda û ronakbîrên aşîqxwendin û hişyar li cem we peyda bibin, hingê ne tenê ez, lê bi dehan ên mîna min û ji min cîgerxwîntir namînin di binê vê perda tarî de. Mixabin ditirsim ku demek bê, win hana xwe bigehînin jêderên biyanî ji bo zanîna tiştê derbara min, an kesekî din... Ji kinarê ziman û rêzimanê ve jî, tiştê min zanî û ji min hat, min got û nivîsî. Eger win hizir û bîra xwe hûr tê de bikin û baş vekewêşin, dê bibînin ku me tibabek nimûne û gotinên rast û berketî di biwara ziman û Rêzimana Kurdî de gotine. Her çi bin û çawa bin jî, dîsan li gor rewş û pergala me û rewşenbûriya me ya ev ro, çak in. Belkî jî, lê gerek e win bi hişyarî sûdê jî wergirin. Ji ber ku me jî çewtî û kêmasiyên xwe hene, temamkirina kêmasiyên û dagirtina valahiyan û rastkirina çewtiyan erkê seydayên vî cîlî û

cilê piştî me ye, ku gerek e ji me zîrektir bin... Ez bi kurdî dibêjim, bi kurdî dinivîsim û bi kurdî dixebitim. Me gelek peyvên xweş û hêja têkilê nivîsarên xwe kirine, da ciyê xwe bigrin. Hemû jî her dîsa di zimanê me de hene, lê hinek wînda bûne û hinek jî ber bi windabûnê ve diçin... Gereke zimanê nivîsîna me sivik û wisan jî bê kêmasî be. Heke na, dê hişk û giran bibe û bere-bere em ê sivikî û xweşî û nermiya wî wenda bikin."

Ev kirin û gotinên Cegerxwîn rast in, gelek di ciyê xwe de ne ku li ser gelek rê û rêçikan çûye. Wî çak zaniye ku her meydana -her çinekê- ta radeyekê ziman û awayê xwe yê taybetî heye. Cegerxwîn koçer bû, Dêmanî bû, bajarî bû, hîvanek mezin bû, rêçenasekî tevayî bû, awayekî bê girê berheim pêşkêş dikir: (Va ye rê, were bide ser). Riya rûmetê, riya perçiqandina stema ku ser û pişt li te çemandiye.

Cegerxwînê Kurd di Dîwana Yekem de gelek gazin honandine û ya rasteyî serokên Kurdan kiriye, hêjatiya wî û ya şewaz û honandina wî jê diyar dibin.

*Ji paşa û beg û gerdan, di vê rê yek nebû hişyar
Ji bo serbestiya Kurdan, ji wan qet yek nebû xemx-
war*

*Hemû talanker û mêrkuj, li ser wan dijminê xwîmrêj
Melan êrîş birin. Enro, leta Zeydo kirin serdar*
Dirist bû kuştina Kurdan, di şî'ra şêx û mamostan
Beg û axa bi deh gundan, digotin: "Her em in
xwundkar."*

Heta dibêje...

*Edûb û şa'irên Kurdan, bi biskên şê mijûl mabûn
Yekê wek min hebûna, lê di nav wan de dima bêçar
Zeman, sed fusetên hêja, belaş dan, kes nebû bêje
Heta "hasil giha Mûsil" Cegerxwîn nû dikî hawar!*

BERHEMÊN CEGERXWÎN

Cegerxwîn gelek nivîsiye û kêmek jê hatiye çapkirin. Yanî pişka neçapkirî gelekî ji ya çapkirî bêtir e. Helbet em vê gotinê ne ji cem xwe dibêjin. Çiku di sala 1979'an de jina wî hate Bexdayê ji bo wergirtina diravên kitêbên wî. Me jê pirsî. Got: Ma ez rebena Xwedê ji ku zanim. Ji roja ku ez û ew bûne qismetê hev, ta bi îro çend li mal bûye ji êvara Xwedê heya derengî şevê, gelek car jî heya banga spêdê çeqçeqa mekînê û xişxişa kaxezan bûye. Li malên xelkê jî wilo bû... Nivtelîsek şandiye yan bi xwe re biriye Ewrûpayê û nivtelîsek li cem me jî maye. Ji bilî yên ku di kun û qulêrên dar û dîwarên xelkê nas û nenas de rizîne, yan mişk dixwin û dirizin."

Ev gotina jina wî gelek rast e. Çiku heina yên ku min ageh jê heye "Tarîxa Kurd" şeş cild in. Cildê şeşê bi destê xwe daneyek dabû min. Yek dabû Mamosta Hejarê Mukiryani û yek jî dabû Mele Mistefa Berzani. Lê piştî hingê bi du salan û li ser daxwaza wî, min ew liba xwe jê re şand.

Niho hez dikim ku navên dîwan û nivîstên wî ên çapkirî bixwînim. Çiku eger çî li Kurdîstana Îraqê hene, lê min ne bawer e ji bilî rehmetî Seyda Sadiq kesekî din hemî kitêbên Cegerxwîn li cem hebin. Ew kî ye ji me ku çarîka wan hebî? Hema dê xwe bêjim, bawer bikin ta vê gavê jî yek tenê li cem min nîne û dişem bêjim ku di kitêbxanên taybetî û yên dewletê de jî 3-4-5 kitêbên wî zêdetir nîn in, lê helbet ji bilî Awa û Destûra Zimanê Kurdî û herdu ferhengên (-1-2-).

in, lê helbet ji bil Awa û Destûra Zimanê Kurdî û herdu ferhengan (-1-2-).

Yên heta niha hatine çapkirin û hemî ji ne di çaxê xwe de, ev in:

- 1- Piñsk û Pêû, Dîwana Yekem, (Sûriye)* 1945.
- 2- Cîm û Gulperî, çîrok, (Sûriye)1947.
- 3- Sewra Azadî, Dîwana Duwem, (Sûriye)1954.
- 4- Reşoyê Dañ, çîrok, (Sûriye)1956.
- 5- Gotinê Pêşiya, (Sûriye)1958.
- 6- Awa û Destûra Zimanê Kurdî, (Îraq) 1961.
- 7- Fehenga Kurdî I-II, (Îraq) 1962.
- 8- Kî Me Ez, Dîwana Siyem, (Libnan) 1973.
- 9- Mîdîya û Salar, (Libnan)1973.
- 10- Ronak, Dîwana Çarem, (Swêd) 1980.
- 11- Zendavista, Dîwana Pêncem, (Swêd) 1981.
- 12- Şefaç, Dîwana Şeşem, (Swêd) 1982.
- 13- Hêvî, (Swêd) 1983.
- 14- Tarîxa Kurd û Kurdistan -I, Swêd, 1985.
- 15- Tarîxa Kurd û Kurdistan -II, Swêd, 1987.
- 16- Aştî, Dîwana Heştan, Swêd, 1986.
- 17- Folklorî Kurdî, Swêd, 1988.

Helbet ên jêrçap jî hene, madem em dizanin ku wî gelek ên amade û berdest hebûn, lê rastiya vê gotina me, dê perda guman û texmînê zû ji ser rabe.

DERENGIYA ÇAPKIRINA NIVÎSARÊN CEGERXWÎN

Cegerxwîn di pêşgotina Dîwana xwe "Ronak"ê de gotiye: "...dixwazim di vir de gotineke kurd û tevayî bêjim ku hemî dîwan û ristên ristevan û nivîsarên Kurdî dereng û ne di çaxê xwe de têne çapkirin. Ji lewra kêmnweş bêhêz û havil dimînin. Lê tenê tiştek heye ku rûmet û hêz û doz û daxwazên wan dîwan û nivîsaran diparêze, ew jî ev e ku xebat û kêferata gelê Kurd her û her nayêne rawestan. Ji

ber wilo jî, kengî bêne çapkirin, doz û daxwazên wan weke xwe dimînin û sist û bêhavl nabin..."

Eger çî ev gotina Seyda giştî ye, ne kesatî ye, yanî ne tenê ji bo xwe gotiye, lê ziyana mezintir gihandîye wî û berhemên wî. Çiku her wekî em dizanin ku piraniya helbestên Dîwana Yekem, ên serdema melatiya wî ne, 1926-31. Û gelek ji wan di hejmarên kovaran de belav dibûn, nemaze "Hawar" paşê di sala 1945-an de Dîwana Yekem ji wan pêk hat. Belgeyekî din, helbesta bi navê "Peymana Bexda" -Zincîr Ji Gerdenim Şikest- û gelekî din ji wan di sala 1958-an de nivîsî bû, lê di sala 1973-an de di Dîwana Kî me Ez de çap kirin. Yanî piştî pazdeh salan. Lê gelek ji helbestên wî berî çapkirinê di nêv millet de belav bûbûn. Ew jî bi saya şêrnî û nazikiya peyv û awaz û mûzîka wan, hem jî ji ber ku millet derd û janên xwe tê de didîtin. Lewra heta nehezên wî jî, helbestên wî jiber dikin û ji dil dixwînin û rondikan di ber re dibarînin. Ta kesên wek Şêx Mihemed Îsa yê navdar bi awazên xweş ji xwe re dixwînin. Seydayê hêja Mele Mehmûdê Dêrşewî heta îro jî têra xwe parçeyên bijarte ji helbestên Cegerxwîn ji ber e û carcar weke şekir ji dev dirijin. Ne tenê şêx û mela, belkî beg û axa jî weke rewşenbîr, rênçber û şagirdên kurd hez ji berhemên Cegerxwîn dikin. Derwêşê Sado yê Bişarê Çeto, wek me mîna rencberekî kurd digot û vê gavê jî her dibêje:

Xaniyê axê mezin herdem di ser gund re bilind

Lûs û hêlîna diya ye, wek şikefta sê der e.

*An jî axa bi deh gundên xwe ve bawer dikê Keyxus-
rewe*

Talanker û diz û keleş, wî daye ser rêça gur e

*Halê me kumanca ev e, em dê çilo serbest biîn?
Her çi ku çîye guh medê, silav li sîfira hazir e.*

*Seydayê rast û ronî ye, lewra Cegerxwîn namîdar
Zana dîzanin ew kî ye, ên ker dibêjin "kafir" e!*

ÇAWA JI KURDISTANÊ ÇÛ?

Êvarekê hat û destûr ji me xwest û got: "Ji pêr ve dibêjine min, hevalên te dixwazin tu vegeftî Sûriye û Îran jî rê nade min ku ez tê re biçim Bêrûdê. Niha jî ez nizanîm kengî û çawan ez ê herim." Piştî hingê bi du rojan hate ve, ez qewîtî kirim ku eger bi rê ve mir, laşê wî li gundê Qeşefirê veşêrin. Ev got û bi wê kalîtiya xwe ve rîya Behdînan girt û kudand... Êdî her Cegerxwîn dizane ka Cegerxwîn çawa û bi çi rewşê çû Sûriyeyê. Rejîma Sûrî jî weke her car dîsan ew tengav kir. Kurd e û kurd li ser axa xwe jî biyanî ye; "Yan hilgire seviya rîxê her û her, yan jî biqeste ji vî gundî û here der." Naçar kirin, çû wî serê cîhanê û got:

*Evîna min wekî hespê çeleng e
Revandîm ez, ne zengo û ne hevсар*

*Li kû dimrim, diçim kû ez nizanîm
Dema dimrim ez ê çi b'kin bi Hesar!*

*Bi ber pêla ketin bê doz û daxwaz
Dindalim ez wekî hûrçê birîndar*

*Cegerxwîn bes bibêje, pîr dirêj e!
Bese Kurdo ji xew rabe, tu hişyar.*

Helbet rast e ku hişyarê nivîstî jî heye, lewra gotiye "Bese kurdo ji xew rabe, tu hişyar."

Me zanî ka çawan Cegerxwînê pîr û tadar bê hemdê xwe ji Bexda çû û me zanî ku li Sûriyê jî çi bi serê wî hat û paşê jî çawan hat xwe da ber siya wê şengedara me ya kurma xilxilandî û stema reş a cîhanî rizandî û xwe kir heval û xulamê doza me ya pîr derd û eş, me jî carekê din berê wî da Rejîma Sûrî û piştê bi naçarî rojhilat bi carekê li paş xwe hişt. Ew Rojhilata ku Cegerxwîn mîna welatê xwe hez jê dikir û bi navê wê dixurriya.

Cegerxwîn têra gotra xwe erd di welatê xwe de nebû, bigire ew "150" metrên qadê ku xanikê xwe yê biçûk li ser ava kirî, camerekî fileh bi diyarî dabûyê. Ev hemû ne bes bû, hinek zirkurd li Ewrûpayê lê peyda bûn û şerê wî kirin, çi ye -ne çîye. Yekî got har bûye, yê din got dîn bûye, hinekan jî digotin hay jê hebin, bive ye, dê Ewrûpaya me ya demokratîk bike Marksîst, hinekan jî digotin kirivê Haviz Êsad e. Bawer bikin hebûn jî digotin, helbestek çil û çar metre li dijî Xumeynî nivîstî ye, wey maşale û sed aferîn bo dîndeya xwexwer û xwenenas û revrevok... Gereke nahezên Cegerxwîn bizanin ku Cegerxwîn bûye remzek ji remzên mîletê xwe, Seydayek ji seydayên xebat û kêfarata rencber û rewşenbûrên kurd: Me negotiye û em nabêjin werin li pey dîtaniya wî ya felsefî herin, an jî di gel rêbaza wî ya siyasî bin... Lê tu kurd bî û dijîminê Cegerxwîn bî jî, zehmet e keko! Mêjûvanê çeleng Ebdilreqîb Yûsif dibêje: "Gava ez biçûk bûm li şûna bigotana fi-lankes kurd e, digotin Cegerxwîn e". Bila em jî wek Şêx Xalidê Nexşebendî û Dr. Sedîq Eirûşî û Sadiqê Amêdî li kesatî û mirovatiya Cegerxwîn temaşê bikin. Sadiq kurdekî paqij û misilmanekî baş bû,

û kesekî ji me temetê wî têkiliya Cegerxwîn û hevaltiya Cegerxwîn nekîr û temet wî dîwan û nivîstên wî jî nedîtine. Qet rojek ji rojan wî navê Cegerxwîn bi xerabî neanî, gazinek jê nekîr... Dr. Sedîq Etrûşî digot: "Cegerxwîn; yanî dîwana kurdî"... Seyda Remezanê Necar Zaxoyî li kongreya mamostayên kurd li Şeqlawe, di sala 1959'an de dîtiye. Heta vê gavê jî her dibêje: "Mîrov ji civata Cegerxwîn û têgihîştina wî têr nedibû".

CEGERXWÎN DI KOVAR Û ROJNAMEYÊN IRAQÊ DE

Ji mêj ve û berî mirina wî, rewşenbîrên Kurdistanê Iraqê hez dikirin ku li ser berhem û çalakîyên Cegerxwîn biaxivin, belav bikin, şirove bikin û kesatiya wî nîşanî millet bidin. Lê mixabin destûr nebû. Wisan jî nemaze di meydana ziman û rêzimanê de navê wî di kovaran de car car dihat û jî radyoya kurdî ya Bexdayê di hate bihîstin. Lê piştî bihîstina saloxa mirina wî, ciwanên rewşenbîr tibabek helbest û gotar bi kurdî û erebî pêşkêşî canê Cegerxwîn kirin. Eger çî hinek jê lawaz û netemam bûn, lê tiştine berketî tê de hebûn. Mixabin, piraniya wan babetan ronahî nedîtin. Her çî be û çawan be "Hewkarî" û "Karwan" û rûpelên rewşenbîriya kurdî li rojnameya "El Iraq" deng jê anîn. Li vir divê em ji hev û ji xwe jî bipirsîn: "Gelo çima û jî ber çî ew saloxa ku rojname "El Sewre" zimanê Baasiya di rûpelê xwe yê paşîn de, hejmar: 5323, 3/10/1984 di biwara çilrojîya wî de belavkirî, nehate kirin?!

Ev, deqê wê saloxê ye, ku em ji erebî dikin kurdî:

Bi munasebeta salvegera helbestvanê wefatkirî Cegerxwîn dê yekîtiya torevan û

nivîskarên Iraqê-şaxê yekîtiya torevan û nivîskarên kurd- li Hewlêrê xelegeke tedişatê li ser edeb û jiyana wî di avahiya yekîtiyê de bihêle kirin.

Lê mixabin ew roja diyarnekirî hat; bê deng, bê reng û aheng bihurî û çû. Ne li minê, ne li teyê! Helbet pirs û gazin ji şaxê Yekîtiya Torevan û Nivîskarên Kurd ya li Hewlêrê têne kirin. Çiku cihê kirinê diyar kirine, lê roja wê diyar nekirine. Ji aliyekî din ve jî her hingê -roja belavkirina saloxê- duwazdeh rojan bi ser çilrojîya wî re bihurî bûbûn, lê xem nedikir ger bihata kirin. Ez ne ji ber nekirinê dibêjim, lê ji ber nediyarkirina sedemê nekirinê... Çima nehate kirin?

Êdî hêvîdar im ku seyda û xemhilgirên tevgera Rewşenbîriya me ya îro û ya pêşerojê sûdeke çak ji berhemên Cegerxwîn ê zimansax û tinnûjen werbigirin, vî nifşê me yê niha pê werar bikin û karwanê Rewşenbîriya Kurdî bi giştî li ser rêçeke rast û durust ber bi amanca biratî û mirovatîyê ve bajon.

Silavên me û rehmata Xwedê li canê Cegerxwîn bin. Aferîn bo her kesê mîna wî ku jîna xwe di riya dîlbera xwe de mezixandiye û soza xwe neşikandiye.

*Ev e soza min û dîlber eger birrim di vê rê de
Ji vê دنیا xweş û şîrîn Cegerxwîn jê ne bê par e.*

KURIK

Arjen ARÎ

Ka goga te kurik,
te xilçê xwe li kû danî?
hevalên te li kû ne, koza karên te kanî?
dê-bavê te... mamên te...,
kurik, ka bêje, çi bû?
ji Bosna-Lîcê yî tu,
ji Şimax-Somalî?...

Xarên te kê rijandin
kurik, hêsrên te ne li erdê?
kê tu berda kolanan, kê tu xist çêşa şer?
tiştên weha Tirk dikin(!)
kurik, ji dev wirrên xwe berde.
Sirp hatibin heya vir
kurik, Xîrwatan girtibe ser we?...

Navê te Azad e, tu bi xwe bindest î,
kurik.

Yê birayê te Welat e, tu bê welat î,
kurik.

Wer, xaniyekî em çêbikin ji ber êşên
xwe, kurik

deriyekî tê de vekin, ji hêviyên xwe,
kurik

pacê re ka binêre, tê bi kû de herî?

Ragir barê jiyane, vir Kurdistan e,
kurik.

KULÛLKÛN BIHARA DERENGMAYÎ

Her bihar vedibin di çiyane de
di arane de, zîndane de
her vebûn, her vedibin
kulûlkên buhara derengmayî.

Ne sosin e,
ne nêrgiz e navên wan
navêkî din e navê kulûlkên nûgihayî
sojan de her buhar ji agir zayî
sor,
soring,
vedibin li Herakol, vedibin li Gebar
her buhar vedibin
vedibin li çiyayên bêmirad mayî.

Bi xwîn bin, bi xwêdan bin
agir de qîçqîçî ger bi jan bin
Seîd e terhek wan, pelek wan Qadî ye,
tu bêhn bikî hilma wan Dêrsimî ye
çar şaxan de berxwedan
vebûne Riza, vebûne Barzan, Mazlûm
vebûne.

2

Li hêviya arane nemîn
kirasê teboxê wergirtiye adarê, lewra
û çar dem veguherîne buhara Arya
her kulûlk canek gorican e aniha
vedibin kesk-kesk
vedibin zer-zer, sor-sor vedibin
her vebûnê de dibizirin
û diştûlin di her dilop xwîn de
Medyayî.

Bîhn bike
hilmek azadî tê ji wan
kulûlkên buhara derengmayî.

WELEE



Hesenê METÊ

Bêyî ku cudayiyekê têxime nava rojên Xwedê, weke hertim îro jî ez bi gavên karkirekî ji ciyê kar derdikevim, berê xwe didim aşxana serê kuçê ku li wir navrojekê bixwim. Dema ku meriv dikevine hundurê vê aşxana serê kuçê, dekorasyona hêla hundur taviê bi merivan dide zanîn ku xwediyê wê ji rojlilata navîn e. Hertim xortekî li dor salen bîst û pêncan li ber caxê aşxanê li ser lîngan e. Bi bejn-

ke navîn, milekî fere, porekî reş î filikî, du çavên reş û pozekî berane ye. Di binê vî pozî de jî simbêleke gir. Mijara axaftinê çî dibe bila bibe lê mîna ku çêlî tiştêkî pir seyr bibe, hertim matmayîneke saxikane li ser ruyê wî diyar dibe. Herdu çavên wî weke du cirnan vedibin û sipîçikên dora reşikên wan dibiriqin. Wekî din jî meriv dibeje qeyê ji wê simbêla wî ya gir du kopiyên din jî hatine kişandin û di ser çavên wî re bi eniya wî ve hatine zeliqandin. Di peyivîneke herî normal de jî ev herdu biruyên wî ber bi jêr û jor dijenin. Ev dibe şeş meh ku ez di her rojên kar de û di demên navrojê de van biruyan dibînim.

Lê hertim jî bêyî ku peyivîneke zêde bikin, weke herkesî ez jî xwarinekê dixwazim, vedikişim ber inaseyekê, dixwim û carina li dora xwe dinêrin. Bi dîwarê hember ve portrekeke Gilgamêş bala min dikêşîne û hîn di roja pêşîn de ez têderdixim ku ev xortê ha asûrî ye û navê wî jî Sargon e. Lê ez vê yeka ha tiştêkî zêde pêwîst nabînim ku biçim û xwe pê bidime naskirin an jî wî nas bikim. Îro jî bi vê tevgerê me.

Ez di derê aşxanê re derbasî hundur dibim û dibînim ku Sargon li ciyê xwe î hertimî ye. Ji bilî min û wî kesek di hundur de tune ye. Bi silaveke swêdî diçim li pêş caxê wî radiwestim û pizzakê dibêjim. Lê dema ku Sargon çav li min dikeve, ew biruyên ku êdî xwendevan jî pê dizane îro bêtir her bi jor dikişin û bi

rewşeke matnayî ji min dipirse:

- Wellee... *jobbar ni pã lördag ocksã?*

Em bi hev re bi swêdî dipeyivin. Lê ez jî êdî fêrî vî xwiyê Sargon bûme. Hîn bûme ku ew di axaftina xwe û swêdiyan de jî vê peyvika *wellee* bi kar tîne. Ne tenê swêdî, Xwedê dizane ew bi kîjan zimanî jî bipeyive, ew ê vê peyvika *welle* weke kilîta devê xwe bi kar bîne. Nemaze dema ku ew bi xwe pirsan dike. Loma bêyî ku ez li ser vê *wellee*'ya wî hûr bibim, bi dengê nizm bersiva pirsaya wî bi swêdî lê vedigerînim û:

- Na, dibêjim, em rojên şemiyana kar nakin... lê îro ez xerîkî karekî xwe î arizî me.

- Wellee... karekî arizî!... çî kar e?

- Karê pirtûkekê ye, dibêjim.

- Wellee... pirtûkek!... pirtûka çî ye?

- Novel in, dibêjim, min ji xwe re dane hev...

Li vir mîna ku aliyekî min î veşartî bibîne, Sargon dîsa bi mereqdarî dipirse:

- Wellee... novel!... tu dinivîsînî jî, erê?

- Erê, dibêjim, carina tiştina li hev tînim û dinivîsînim.

Ez baş dizanim ku Sargon ê hîn gelek pirsên din jî ji min bike û herweha ew biruyên wî ê jî hîn gelek carên din ber bi jêr û jor bijenin. Mîna ku bixwaze ji xwe re mijareke peyivîne peyda bike, pirsaya xwe ducar dike û dibê:

- Wellee... tu dinivîsînî jî!... bi kîjan zimanî?

- Bi kurdî, dibêjim.

- Wellee... bi kurdî!... ma tu kurd î?

- Belê, ez kurd im, dibêjim.

- Welle... tu kurdî!... ji kîjan perçeyî?

- Ez ji hêla bakur im, dibêjim, aliyê tîrkan.

- Wellee... ji aliyê tîrkan!... ma tu bi tîrkî jî dizanî?

- Belê, dibêjim, ez bi tîrkî jî dizanim.

- Wellee... bi tîrkî jî dizanî, erê!... dibêje û mîna ku piçekî enirîna xwe jî bide xuyakirin, vê carê destê xwe jî li ba dike û bi tîrkî ji min dipirse:

- *Niçin bizimle turçe qonuşmıyorsun?...* dibêje û mîna ku dawîya hevoka xwe ji bîra kiri be, nîvçe dihêle dûre dîsa li vê hevoka xwe vedigere û didomîne.

- Wellee... *niçin şimdiye qeder turçe qonuşmadın ?... Niçin demedin ki bende oradan geliyorum, Hecî?...*

Ji ber ku Sargon heta nuha navê min nizanî bû, li vir navekî jî bi min ve dike. Lê ez xwe li nezaniyê datînim, mîna yekî bêguneh bi ken destê xwe ber bi wî vedigirim û bi tîrkî jê re dibê:

- Ne bileyim, Sargon. Türkçe bileceğini tahmin edemedim ki..

Sargon bi kêfxweşî û bi tepîn hevîrê di destê xwe de pan dike, di ber xwe de dike pilepil û dibê:

- Olmaz Hecî, olmaz!... qonuşmaq lazım. Sen bana demesen... ben seninle qonuşmasam... Êê... kiminle qonuşacağız?... Kêr, çetel û tiştên pêwîst ji ser aşaxên caxanê berhev dikim,

diçim li hêleke aşxanê li ber masekê rûdinim û pîzzayê xwe dipê. Hîn jî ji bilî min û Sargon kesek tune. Bêdengiya hundur bi xweşdengê Juliana Jendo dixemile û carina jî dengê telefonê. Gelek wext nabuhure Sargon pîzzayê min tîne, bi girangîriya nasekî nû li ber min datîne û bi tirkî:

- Fermo, dibêje, hêvîdar im bi te xweş be.

Ez sipasî wî dikim û ji bo ku wî bêbersiv nehêlim, jê re dibêjim:

-Wusa xuyaye rojên şemiyên zêde kes nayên û di rojên weha de karê te jî kêm e.

Sargon berê xwe ber bi hêla der dike, herdu destên xwe di ber xwe de vedigire û dibê:

-Kes rojên şemiyên kar nake, Hecî... . Lê bêtir ji malan dixwazin.

Ez û wî êdî bi tirkî bi hev re dipeyivin, lê bi tirkîyeke şikestî. Ji bo ku dawiya hevokên xwe bîne, ez dibînim bê Sargon dikeve çî dijwariyan. Ev rewşa wî bala min dikêşîne û ez pîsekê jê dikim:

- Ji kîjan wextê de ye ku tu ji welêt derketiyî, Sargon?

Sargon bi keservedan hêdfika li pêşberî min rûdine, biruyên xwe ber bi jor hildide û bi dengê gazindok dibê:

-Ma welat maye, Hecî!... Li gor gotina diya min ez li wir, li gundekî nêzîkî manastira Mar Bozoz çêbûme lê anuha weke xewnekê jî nayê bîra min. Li gor gotina dê û bavê min, wan gelek dijwarî dîtine...

Li vir mîna ku tiştêkî nû û tirsdar hati

be bîra wî, li ser sandaliya pêşberî min ciyê xwe jî xweş dike û bi xwiye xwe î matmayî dibêje:

-Ma tu dizanî, Hecî, do êvarê me li malê temaşa programeke televizyonê dikir. Li ser we kurdan bû. Ji ber nebaşiyên dewleta Iraqê direvîyan. Kal û pîrên pêxwas, jin û bûkên bi dergûşên şîrmij, ref bi ref bi pala çiyên ketî bûn, li belekî û bêşûyên berfê dixistin û bilintir dimeşîyan. Zarokekî piçûk jî di nav refê wan merivan de dimeşîya. Kamereman bala xwe dabû ser vî piçûkî. Lawik bi bertena fistanekî tenik û cotek solên lastîk bû. Dema lingekî xwe radikir ku ber pêş bimeşe, lingê wî yê din bi çamûrê ve dizeliqî û rebeno dikir ne dikir çamûrê lingên wî bernedida. Ew jî deverû dikete erdê, radibû ser xwe, bi çavekî bêhêvî li paş xwe li berwarê çiyê dinêrî û dest pê dikir bi dilekî şewutî digîriya. Mîna ku daxwaza hewarekê bike ew li wir, li berwarê wî çiyayî digîriya, diya min jî li malê li ber televizyonê digîriya... Bavê min jî hêsirên xwe paqij dikir. Xwedê dizane tiştên weha bi serê wan de jî hati bûn... Gerçî min bi xwe jî gelek caran bûyerên weha ji devê rîsipiyên me bihîstî bû. Min bihîstî bû ku ew jî weke kurdên îro hatine kuştin, bi çolan ketine û şerpeze bûne... Lê ev tiştên weha ji bûyerên dîrokî bêtir bi min weke çîrokan dihatin...

Kêr û çetel di destê min de betal mane û ez bi baldarî guhdariya vê mijar û bergeha dilşewat dikim. Bêhneke şewatê, bêhneke

seyr xwe digêhîne min jî lê di wê gavê de ez nikanim têbigêhîjim ku çi ye. Sargon jî li pêş min rûniştiye, mîna şêwirmendekî xwe li mijara rebeniya kurd sor kiriye û dipeyive. Xwedê dizane di wê gavê de dîwar jî di ser de hilweşiya, wî hay ji xwe ne dibû. Li ser vê mijara dilşewat ew peyivîna xwe didomîne û dibê:

- Lê mixabin... mixabin îro jî lehengên çîrokên weha kurd in, Hecî... îcar divê kurd hişê xwe bidine serê xwe, dost û dijminê xwe bizanin, bipeyivin, bişêwirin û bi rîyeke herî baştir xwe ji van kambaxiyan bisitirînin. An ne, bi navê Gilgamêş sond dixwim ku kurd ê ji rebeniya xwe nefilitin û ew ê ji weke me asûriyan belawela bibin... do êvarê bavê min jî wusa digot... digot kurd mêrxas in lê zû têne xapandinê...

Bi dengê zengilê ser deriyê aşxanê re mîna deziyekî xav ev peyivîna Sargon tê birîn, ji nişka ve radibe ser xwe «*Oyy!... det brinner!*» dibêje û ber bi argûnê aşxanê dibeze. Zûzûka deriyê argûn vedike, pîzzayekî şewutî jê derdixe, davêje satûla avê, bi lez ber bi derî û penceran diçe, ventîlatorê li kar dixê, bi hilkehilk û matmayî ji mêrikê nûhatî re:

- *Förlât!... det tar bara nâgra minuter,* dibêje, li paş çaxê aşxanê dîsa dibe tepetepa wî û hevûrekî nû pan dike.

Wê çaxê ez têdigêhîjim ku mêrikê

nûhatî telefon kiriye, pîzzayek xwestiye û anuha jî hatiye ku bi xwe re bibe.

Heta ku ew hevîrê nû pan dibe, dikeve argûn, dipije, derdikeve û mêrikê nûhatî bi xwe re dibe jî, Sargon nayê ber masa min, nayê ber masa min û li ser sandaliya pêşberî min rûnane, rûnane û çêlî mijarên dilşewat nake, çêlî rebeniya kurd nake û nabêje ku divê kurd çi bikin. Ji bo ku ew dûman û bêhna pîzzayê şewutî ji aşxanê derkeve hîn jî bi vir û wir de dibeze.

Xwedê jî, ez jî û Sargon jî pê dizane ku şewutîna pîzzayê wî ne ji ruyê min de bû, lê dîsa jî piştû xwarina pîzzayê xwe ji bo ku ez dilê Sargon hinekî xweş bikim, di rabûna xwe de diçim ber wî çaxê aşxanê û jê re dibêjin:

- *Kusura bakma Sargon, seni konuşmaya aldık... pîzzan da yandı...*

Biruyên Sargon dîsa ber bi jêr û jor dijene, eniya wî diqermiçe, weke du heskên darîn destên xwe jî ber bi min vedigire û dibê:

- *Yox, babam... ne qûsûrû... zaten insan kürtlerin üzerinde qonuştımı...*

HELBESTVANEK Û PÊNC HELBEST



M. BÊKES

Helbesta yekemîn
Diyarî yara xwe kir
û raket
Di sibê de
dît ew helbest
Bû
gulistanek ji sorgulan...!!

Helbestan didwan

Diyarî welatê xwe kir
û raket
Di sibê de
dît ew helbest
Bû
qorek ji çiyayên bilind
û du çem...!!

Helbesta sisiyan
Diyarî şehîdan kir
û raket
Di sibê de
dît ew helbest
Bû
bûkek bi kirasekî sor...!!

Helbesta çaran
Diyarî evîndaran kir
û raket
Di sibê de
dît ew helbest
Bû
keskesorek
Bilbilek
û tembûreke saz xemgîn...!!

Helbesta pêncan
Diyarî pêşmergan kir
û nîkarîbû raketa
Her peyvek ji helbestê
Bû
teqîna tîfîng û topan
di guhê wî de
û ma şiyar
heya tûrêjên rokê
vepengizîn...!!

KÛTO



Şahîne Bekirê SOREKLÎ

Di vê sibeya rojêke destpêka bihara 1991'ê de mij xwe avêtibû ser tax û kolanên vî bajarokê çiyayî. Pirraniya xelkê bajêr hên di xew de bûn. Ev bû bûn çend roj ew di rojine wek yên di xewnan de dijîn û di nav şahî û hêviya xwe de serxweş bû bûn. Gund û bajarên deverê ji hêz û istixbaratên dewletê azad bû bûn û navendên bajar û bajarokan bi

xwepêşandanan, civînan û govendan mişt bû bûn. Berfê dest pê kiribû li ser çiyar bihele, pûkê bar dikir û ewrên stemkariyê yên reş bi ber bê ketûbûn.

Kûto îroj ji rojên berê zûtir ji mal derketûbû û gavên xwe ji her roj bi leztir ber bi pêş diavêtin. Mijê siq kîbûna wî ji çavên rêwiyan ku tek û tûk li wî rast dihatin dida veşartin. Tenê dema di navbera wan û wî de neh-deh gav diman serê wî yê dileqiyayî û ber bi milê çepê xar, destê çepê yê seqet û tepetepa lingên wî yên wekî lingên leşgerên di destpêka leşgeriya xwe de di talimê de radibûn û dadiketin kîbûna wî kifîş dikirin.

Berê ev bajaroka yekî şên bû û taxên wî ji xelkê mişt bûn. Dema gundiyan lawir, mast û penêrê xwe di herbang rojê de dihanîn bajêr dengê zengilên di stuyên lawirên wan de meqamekî xweş dihanîn holê. Lê şer, ya rast cengên li dû hev, birîn li dû birînê gîhandin giyan û canê bajêr. Birînen pêşîn sivik bûn, lê heku çekên ji mazatên rohilat û roava dihatin kirin ber bi pêş çûn birîn ji kûrtir û xeddartir bûn.

Cengan bextiyarî û dilşadiya şênîyê bajêr, wekî mişkên seriyek penêrê nerm bixwin û hêdî hêdî ji holê rakin, tune kirin. Gundên li dorhêla bajêr yek li dû yekî hatin hilweşandin. Gundiyan tê de yan hatin girtin, yan hatin kujtin û yan jî reviyar. Dengê zengilên lawiran roj li dû rojê di taxên bajêr de nizimtir bû û rojêkê nema. Tişt û hûr-mûrê dukanan hefte li dû hefteyê kêmtir bûn. Li gel hemî bûyer û serpêhatiyar jî dilê bajêr hên lêdixist.

Di berbanga rojê de hên jî dengê bêhêzbûyî yê Melle Ewnî bang li xelkê dikir, ku "nûnêj ji xewê bi sûtîr e." Ev denga bû ku dibû nêşana destpêkirina roja Kûto. Diya wî dê ew ji xew rakira û li dû kurtekatekê berê wî bida navenda bajêr. Rawesteka wî ya yekem mizgefta bajêr bû. Wî li wir dest û serçavên xwe bi ava çemê biçûk yê ku di pêş mizgeftê re derbas dibû dişuştin û ji wir berê xwe dida firneya Mam Simko. Nanekî germ ji bo wî her sibe amade bû. Ji wir Kûto xwe digîhand çayxaneya Mam Heme yê ku qedehêk çay didayê, da li quncikekî çayxenyê danişê, ji nanê germ bixwe û çayê bi ser de vexwe.

Şênîyê bajêr bi çûk û mezinên xwe ve Kûto dinasîn û hemiyên jê hej dikirin. Erê, hin caran zaroyên bêvac ew hebki aciz dikirin, lê mezinan heye wan dikim û Kûto ji nav lepên wan derdixistin. Yekcaran jî şofêran henek û naziyên xwe bi wî dikirin, yan ji paş ve hêteke wî diqurincandin, lê li dû ku şofêr û alîkirên wan piçekî dikeniyên, wan perene hûr didanê û ew razî dikirin. Di rojên ku kat li nik şofêran nebû da hewşekî xwe bi henekên li gel Kûto derbas bikin, Kûto xwe ji paş ve digîhand yekî û ew diqurincand. Yên li dorhêlên wî dikeniyên û yekî ji wan perene didan wî. Peryên ji bo wî dihatin dayîn helbete ji rojên berê kêntir bûn, lê Kûto ne merovekî perehej bû. Ya herî grîng ji bo wî xweidarekirina rojane bû. Bavê wî ji mêj ve, di şerekî li gel hêzên hukmatê de, di rojên serda-

riya Melle Mustefayê Barzanî de, miribû. Kûto çi brayên xwe nebûn. Tenê xwûşkeke wî hebû ya ku berî du salan li gel cotyarekî gundê S. zewicî bû. Ev gunda jî nema li holê bû û kesî hay jê nebû ka xwûşka wî li ku dima, sax bû yan mirî bû.

"Heta ku Kûto li vî bajarî hebe, ev bajara namire," hinan ji şênîyê bajêr bi ken digotin. "Heta ken li ser lêvên wî hebe, me hêvî heye," hinên din digotin.

Di beyaniya vê rojê de Kûto dilşad xuya nedikir. Ya rast, ew xemgîn û bi tirs bû. Diya wî, dema wê ew ji xew rakiribû, ne wek xwe bû. Wê ew bi heyecan hejandibû û bi dengê qebe gotibûyê, "Kûto, kurê min, zû rabe. Min îroj dengê azanê Melle Ewnî nebihîst. Bûyereke ne ji xêrê re qewimiye, heger ez ne şaş bim."

Bi gihîştina hewşa Siyamendê Necar re ew rawestiya û li dorhalîyên xwe niherî. Narîn, keça çeleng û şêrîn ve sibeyê pêş hewşê, wekî her roj, danedimala. Qîza Necêr, Narînê, her roj rojbaşî li pêş dêrî li wî dikir, perene didanê û digotê, "ha ji te re Brayê Kûto.

Du benîştan pê bikir, yek ji min re, yek ji te re." Gotina "bra" ew hebki dilsar dikir, lê di eynî demê de nêşana rêzgirtinê bû, û çawa bûya jî, têrê dikir ku ew dengê wê yê bedew di destpêka rojê de bibihîse. Nebûna wê li pêş dêrî ew dilxemgîn kir. Wî xwazt li dêrî xe, lê newêribû. Nuha ku mij wek berê ne weqa siq bû, Ji nişkan ve ew haydare

wê yekê bû ku ev beşê taxê bi tevahiya xwe ji merovan vala bû, dengêkî tenê jî ji dereke wê nedihat bihîstin. Xemgîn û dil bi tirsê dagirtî wî kir ku biqîre, lê nika-ribû. Ji hemî nepêkaniyên giyanî li nik wî, ev yeka ya herî xirab bû: ew nikaribû biqîre. Di demên titûzbûn û xeyidandinê de wî dikir-nedikir ku biqîre, lê ji dest nedihat. Gîrê wî wek bayekî nola kuxikê di qirika wî re derdiket.

Wekî herkesî hestê evîn û hezkirinê li cem Kûto jî hebû, lê xelkê bajêr tew nedihat bala wan ku Kûto jî dikare evîndar be. Ji bo wan Kûto kesekî nîvçe bû. Tenê diya wî, li gel hemî kêmasiyên giyanî yê kurê xwe, dizanibû ku ew kesekî tevahî nê û hemî hestên li nik merovên din li ba wî jî hene.

Kûto ji gelê xwe hej dikir, keyfa wî ji destan û stran û çîrokên gelêrî re dihat, û heta di şahî û dawetên bajêr de be, dilê wî jî dixwazt ku destên xwe têxe destine û di govend û dîlanan de beşdar bibe, lê ji ber ku ew seqet bû hemî hest û daxwaziyên wî di kûraniya hebûna wî de di gorê de diman. Ax! Wî çîqa meraq dikir ji Narînê re diyar bike ku ew ji wê hej dike. Çîqa dilê wî di kûraniya şevan de dixwazt hema, qe nebe, carekê bi destê wê bigire, lê ne şûna wî di nav civakê de, ne ji bedena wî ya di gellek şûnan de seqet rê didan bicîhkirina van meraq û daxwazên dil. Tenê baweriya wî bi Xwedê û hêviya ku ew ê rojekê ji xew rabe û xwe wek ciwanekî ji seqetiyên giyanî azad bibîne meraqa jiyînê di dilê wî de vêketî dihîşt, lê Xwedê di derheqê wî de qe ne adil bû û

dihîşt ku ew her bipê. Ew ketibû bîst û pênc saliya jiyana xwe û hên careke tenê jî giyanê wî û keseke mê negihîştibûn hev. Carekê di nivê şeveke tarî de wî hewl dabû gîrê xwe yê cînsî di serê kereke bi dareke li nêzikî mala wan grêdayî de derxe, lê berî kirina xwe bi seri bike çar segên dorhêlê dest bi ewte ewtê kirin, û kerê dest bi tîzan kir, û Kûto li ser pişta xwe ket xwarê. Qe nebe, heger Xwedê mafê dengdanê dabûya wî, wî ê bikaribûya ya di dilê xwe de diyar bikira; tew belkî wekî dengbêjekî di nav xelkê de bihata nasîn, dengbêjekî destan û goraniyên gelêrî. Wî gellek ji wan, bi xêra amedebûna di civînên di mala Mam Aram de şevên zivistanê cîh digirtinî, ji ber kiribûn. Haya wî ji hemî civîn û şahiyên li bajêr cîh digirtinî hebû û Mam Aram gellekî kêfxweş dibû wî jî li mala xwe di nav mêvanên de bibîne, Kûtoyê ku ji şahiya dilê xwe, di fersendên wisa de, hindik dima bifirre. Carine dilê Kûto ji xwedê dima, ji ber ku wî guh nedida dua û libergerînên wî. "Min qe tişteki xirab jî li dij te nikiriye, ey xuda; de çima tu cezayê nerindiya yê din didî min?!" wî di raman û fikra xwe de diyar dikir.

Kûto herweha merovekî nişîmanperwer bû. Carekê wî hemî pereyên hûr yê di beriya wî de pêşkêşe pêşmergeyan kiribûn, dema ew êvarekê ji nişka ve ketibûn mala Mam Aram, li kuderê mêvanan guhdare helbestvanekî dikirin. Pêşmergeyê berpirsiyar nepejirandibû pereyên wî jê bigire, lê Kûtoyê hêstir bi çavan ketinî nexwaztibû destê xwe

paşve vegefîne û pereyan dîsa têxe beriya xwe. Ax! Wî çîqa ji kinc û bergên pêşmergeyan hej dikir, ji klaşnîkofên di destên wan de, ji rext û dabenceya li piştta wan. Wî meraq dikir hema destê xwe bi ser klaşnîkofekê re bixuşîne, lê şerm dikir wisa bike, yan ditirsiya yên din pê bike-nin. Wê şevê Kûto xewnek dîtûbû. Li ser piştta hespeke spî, klaşnîkof bi mil de, ew di nav refên pêşmergeyan de di newaleke şîn de ber bi pêş diçû. Dema ew ji xew rabû bû, ew bi heyecan ber bi diya xwe çû bû û xwaztibû jê re li ser xewna xwe bibêje, lê kiribû-nekiribû, nikaribû bi diya xwe fêhmkirin bide. Kûto giriyabû.

Bi gihîştina taxa navenda bajêr re, wî dengê li dû xwe bihîst. Diya wî direviya û bang lê dikir. Li pêş û paş wê komeke ji jin û zaroyan ber bi wî direviyan. Dema diya wî xwe gîhandê nefes li wê çik bû bû û bi zor ji dest hat bibêje kurê xwe, "birev Kûto, birev, bombên kîmawî têne." Kûto ji şûna xwe neliviya. Tevî ku ew berê piçekî veciniqî jî, drêj nekir ew ji hemî şopên tirsê azad bû. Wî hewl da ji diya xwe re bibêje, "tu biçe, dayê, lê ez ji vî bajarî nalivim; qedera min li vir e." Diya wî dest pê kir wî bihjejîne, lêxe ê gotinên xirab jê re bibêje, lê wê çî kir, çî nekir, Kûto bi ya wê nekir. Kalekî ew di çav xwe re kirinî xwe gîhand wan û gote Kûto, "Kurê min, guh bide apê xwe.

Têye bîra te ber sê salan li Helebçe çî bû? Kîmawî pênc hezar kes li wir kujtin, Kûto. Serhişkiya xwe li şûn bihêle û bilezîn, xwe ji bajêr bi dûr xe; qe nebe ji bo xatirê pîredaya xwe." Kûto berê xwe wê de da û gavek jî ber bi pêş neavêt. Kalê ew li şûn hiştin û bi riya xwe de çû. Diya Kûto ji girr tiji bû bû û hêstir ji çavên wê dipijiqîn, lê di eynî demê de, ew di beşekî dilê xwe de bi kurê xwe serbilind bû.

Royê êdf xwe ji aso bi dûr xistibû û mij xwe bi tevalî ji holê rakiribû. Kûto bi destê diya xwe girtibû û herdu hêdî hêdî ber bi mala xwe diçûn. Dema wan deriyê mala Siyamendê Necar derbas kirin hat bîra Kûto ku çî benîşt îroj ji bo Narînê di beriya wî de nebû. Di wê demê de tankekê dest pê kir ji serê taxê ber bi wan were. Wan tank dîtîn-nedîtîn dengê reşşan hat û barana gulleyan li wan bariya. Destê Kûto û yê diya wî ji hev qetiyên û her yek ji wan li haliyekî taxê ket. Kûto xuşiya û car din bi destê diya xwe girt. Ber ew ji xwe biçe wî destê Narînê di destê xwe de dît. Ew ji heinî seqetiyên azad bû bû û li ser girekî şîn, Narîn li kêleka wî, vekitibû.

(Ev kurteçîrok berê bi zimanê inglîzî hatiye nivîsandin: Sydney, 1993)

ŞAGIRTÊ JÎR

Kamran HACO

Bi destê xwe milê Azad hejand û hêdî gotiyê:

- Rabe, çaxê çûna dibistanê ye...

Lê xew bi Azad şêrîn bûbû û nedixwest ji nav nivînên xwe yê gerin derkeve. Bi kişandina lihêfê re, bi zorê li bavê xwe ve-gerand:

- Zû ye...

Bavê wî vê carê bi dengêkî xurttir jê re got:

- Kurê min rabe, dibistan dûr e, ancax tu bigihê. Rabe!...

Azad dît ku bêçare ye, divê rabe û kar û bara xwe bike.

Di nav nivînan de rûnişt û bi yek awirê li deverêkê dinêrî, nêrîneke xav weke ku hîna ji xew şiyar nebûbe... Çavên xwe firkandin, tevziyek da xwe û rabû çû dest û riwê xwe şuşt.

Dayika wî jê re taştê hazir kir, piştî ku wî çend parî xwar, ji mal derket û berê xwe da dibistanê.

Derve sar bû, riwê dinyayê hîna baş zelal nebûbû, ewrê zivistanê jî tarîtir diki-rin. Bareneke hûr jî dihat. Riwê Azad hin bi hin şil dibû, dengê cîzma di lingê wî de, di nav heriyê de dihat û carna piyên wî di heriyê de diçikizîn, bi zorê derdixistin.

Azad hêdî hêdî dabû ser rê û pirsra ku wê îro ji mamosta bike, di serê xwe de di-meyand, werdigerand zimanê dibistanê, geh digot wilo baş e, geh diguhert û careke din bi rengêkî din amade dikir. Lê biryara ku wê îro vê pirsê ji mamosta bike di serê wî de cih girtibû.

Dibistan ne li gundê Azad bû, lê di rex de bû, nemaze di rojên zivistanî sar de, lê bi hêviya jiyaneke nû ev zor û êşên han li ber çavên wan xuya nedikirin.

Pirsra xwe careke din werdigerand zimanê dibistanê lê dilê wî nedikete cih ku bi vî rengî wê pir baş be, lewra tim digu-hert û ji xwe re digot xwezî min ev pirs bi kurnancî bikira, min ê çî xweşik bigota.

Pirs bi xwe ji zû ve ketibû mêjiyê wî, lê ji kesî re negotibû, di dilê xwe de ji mansota baştir nedidît ku bersiva wî bide, nemaze ku mamosteyê wî di demên dawî de tim aferî didanê, ji ber jêhatûbûna wî di xwendinê de û tim razîbûna xwe jê re diyar dikir.

Ew giha dibistanê, cîzma wî gelek herf girtibû, paqij kir, pey re bi hêdîka li zengilê dibistanê da, şagirt hemû bûne rêz, ji bo ku ji alê re silavê bidin û sirûda netewî bêjin.

girtibû, paqij kir, pey re bi hêdîka li zengilê dibistanê da, şagirt hemû bûne rêz, ji bo ku ji alê re silavê bidin û sirûda netewî bêjin.

Ketina sinifan dest pê kir, sinifa sisiyan jî derbasî oda xwe bûn, Azad çû li ciyê xwe rûnişt. Mamosta derbas bû, zarok ber rabûn, bi destê xwe ji wan re nişan kir ku rûnên.

Dersa yekem ziman bû, mamosta ji wan re xwend û gotinên zor şirove kirin. Ders qediya, mamosta pirsî, eger pirsê hinan hebin. Azad ji xwe re got, ku kêlîka ku li benda wê bû hat. Lê dîsa jî dixwest ku di wê kêlîkê de şagirtên din pirs bikin ta ku ew jî xwe amade bike, belkî jî pirsaxwe bihêle demeke din. Dilxurî dane xwe û qirika wî ziwa bû. Dawî ji nişka ve dît ku destê wî hate hildan, mamosta jî rê dayê. Bi zimanekî jihevketî, devê wî li

hev herpîlî:

- Mamosta... Çima... em bi... zimanê... ê... ê... dê û bavê xwe... naxwînin... bi... bi... zimanekî din dersên xwe dixwînin?...

Rengê mamosta di cî de hate guhertin, sor bû, zer bû, firnikên wî fereh bûn... kete rengê cinawiran, beziya Azad û heta Xwedê himet dayê şeqamek lê xist. Azad jî ji dijiwariya seqemê pekiya, serê wî li keviya kursiyê ket û bi dev ve çû erdê. Mamosta bi herdu guhên wî girt û rakir ser lingan. Çend şeqamên din jî lê dan û vejeriya cihê xwe. Sinif bêdeng bû... Di wê navê de zengilê qedandina dersê lêda, şagirt hemû derketin. Azad ma bi tenê, xwîn ji eniya wî dihat, destê xwe yê rexlik danî ser birûna xwe, lê bêçare bû, xwîn diherikî... Ew rûnişt, serê xwe kire ber xwe, bi dilpakîya zaroka ji xwe re



Hejmara Nûbiharê ya nû derket

Di vê hejmara Nûbiharê ya 22'an de van nivîsên han cih girîne: **Nûbihar Hûn Pir Xapîyane**, Nexwe Hevdu Nexapînin, **Sabah Kara Mewlana Celaleddînê Rûmî**, **Sûleyman Çevik Hêvîdarî û Xwebawerî**, **Zehra Çomaklı Hêvî**, **Meta Qasim Nuqurç**, **Nacî Gülmez Hevpeyvînek Bi Mamosta Cankurd re**, **Yûnis Emre Xweda Dilekî Daye Min**, **Sabah Kara Baba Tahir û Uryan**, **Mihemed Diyaedîn Dağhan**, **Sabah Kara Omer Xeyyan**, **Rojîn Zelal Rojname û Kovarên Kurdî**, **Sabah Kara Mersiyeyên Rojhilat**, **Seyda Mele Hiznî/M. D. Dağhan Guldana Kurdan**, **Seîdê Norsî/A. Aydın Medresetuz Zehra**.

Oktay Rîfat Nan û Stêrk, **M. Şakir Koçer Heta Quran Di Destê Heskê De Be**, **Civakê Me Wê Weha Be**, **Koyo Berz Ti Zana**, **Melek Amed Hz. Sumeyra**, **Meryemxan Çûka Qefesê De**, **Selman Cihadvan Nivîseke Erebi**.

Navnîşan: Kızıtaşı Cad. Kuruş Apt. 51/3 Fatih, İstanbul-Turkey. Tel: (212) 533 75 88, Fax: (212) 524 00 38.

Hinek Tekst Ji Felsefeya Antîk

Wergêr: Mustafa DÜZGÜN

ÇEND NIMÛNE JI DÎTINÊN HOMEROS ÊN PÊŞ-ZANISTÊ

1. *Têbîniyên ku Ser bi Cewhera Pêşin (arkhe) in:*

Okeanos e bavê Xwedêyan û diya wan jî Tethys¹ e. (XIV, 302)²

*

(Yekê ji qelremanan yê din azar dike:)

«Hûn giş bibin av û xwefî.

Hûn ên ku wek tirsonek û bê nav û deng li vir rûdinin.» (VII, 99)

Xwedê yê Herî Mezin:

Zeus, bavê mirovan û Xwedêyan e (pir çîhan de tê gotin).

*

Zeus kî dibe bila bibe,³ Xwedê yê herî mezin û herî baş e. (XXIII, 43)

*

Wî (Hektor) terazûya pîroz a Zeus naskir.⁴

2. *Hoyê bûyînan:*

Di demek de bi dehan hezar neslê însan dipelixandin,

Vir de Wê de diavêtin, ew erdê sîng pan.

Zeus ev dît û li ber ket; bi wî aqlê xwe yê kûr ve fikir kir

Bo ku çawa sivik bike barê vê erdê ku herkesî xweyî dike.

Lewma tuj kir pevçûna şerê Îfiosê.

Dixwest barê erdê sivik bike bi rêya mirinê ve: Di bajarê Troîayê de

Mêrxas mirin çûn; bi vî awî daxwaziya Zeus hate çîh. (Kypria)⁵

(Helena bahse xwe û Paris dike:)

Ev qedera reş Zeus li me bar kir, dûre jî em kirin kilam ji bo mirovên wêbêyê.⁶

3. *Biqûmet û bêqûmetî ya jiyîna mirov:*

Di binê qonaxa Zeus de du heb kup hene

Bi diyariyên wî ve tijîne, yek bi xirabiyên ve, yek jî bi rindiyên ve.

Ku van tevhev dike dide yekî⁷ ew bi biruskan ve kêfa xwe ûne

Ew carna digihîje xirabiyê, carcar jî rindî dikeve dest

Ji belayê ku da kî, wî rejil dike

Ev tunebûn di vê dinya rindik de wî jî derek davêje dereke din,

Hawar dibe disekine, ne Xwedê rûmeta wî radigirin û ne jî mirov.

(Lêçûnek)

Neslê belgan çawa ye, ya mirovan jî wisa ye.

Ba belgan li ser rûyê erdê belavela dike, daristan bişkov dide

(ji nû ve) yê dinan dihewîne, ku bihar hat.

Neslê mirov jî wisa ye: Yek şîn dibe, ya din çilmise.⁸ (VI, 146)

*

Ax ji mirov bêtir tu tiştêk derbasî xwedî

nake (Ango tiştên ku ax
xwedî dike, di navbera
wan de yê ku ne
daîmiyê însan e).

*

(Akhîlleus piştî
mirina xwe diferme:)

Ji bo min serbilin-
diye li cem te wek
yêrxat kar kirin,

Li cem mirovek
xwedî mal û milkek
gele kêr

Ev baştir e ji serek-
tiya miriyan. (II, 489)

*

4. *Îrada Xwedê û ya
Mirov*

(Akhîlleus) ew ê
disan bikeve şer,

Kengê ku dilê wî yê
sîngê destur da û Xwedê
ew tiz kir. (IX, 702)

*

(Hektor pêş mirina
xwe:)

Rast xwedê min gazî
mirinê dikin.


..... Niha Xwedê ya
qederê wê bighê min.9

Lê mixabin ez ji mirina bê şer ditirsûn,
Kareke mezin ku yên dû me re hatû jî dê
têbîghên, na. (XXII, 297)

*

(Zeus di Civîna Xwedêyan de Diavaxive:)
«Ecêb e niha çitor jî meriv wesa guneh-
kar dikin Xwedêyan!

Dibêjin hemû xirabî ji Xwedêyan
hatine, ku ji ber bêaqiliya xwe (budelatî)



xwe ji qismetê bêtir bi derd û xeman ve
rû bi rû dimînin.

Bi vî awayî niha jî Aîgîsthos bi qîsmeta
xwe rajî nebû û çû jina kurê Atreus girt,
ku vegeriya welêt ew (Atreus) kuşt.

Bi zanatî pêşiya lalaketê dê bigire, bo
ku berê me ji wî re gotibo,

Herneîas, wek Argeiphontes10 miro-

vek xwedî pêşbînê şand.

Ji ber ku wî mekuje û jina wî megire,

Lê belê me gotibû, dê Orestes tola kurê
Atreus bigire,

Ku mezin bû û bûriya welatê xwe kir.

Wesa go Hermeîas, lê nikarî Aigîsthos
qan bike, ku xêrê wî dixwest; vêga bi
tomerî kişand ceza gişkan» (1, 32)

5. *Exlaxa necîbzadeyan*

(Merem û mebesta kesek esilzade:)

Tim ji her kesî çêtir bûn û ji yên din pêş
de çûn,

Cisnê eba û cedê xwe di bin tometê de
nehiştin. (VI, 208)

6. *Nîrxê azadiyê*

Zeusê ku di wêbê de çî bibe her dizane,
nîvîyê mîrxasiya mirov digire dibe,

Ger mirov dema ku kete bin lemên ben-
deyîyê (koletiyê)u.

7. *Mirovatî*

Giş mîvan û parsek ji Zeus tèn.

Yadîgarek biçûk ji dikare wan dilxweş
bike. (6, 207)

8. *Zewac*

(Andremakhe qise dike:)

Hektor, tu ji min re wek bavek, dayîkek
rûnetdar

Û bira yî, him jî mêrê min ê ciwan û bi
qewet î. (VI, 429)

9. *Bav û law (kur)*

(Diaya Hektor:)

Zeus û xwedêyên din, ez ji we tikayê
dikim ku ev

Lawê min her mîna min di nav Troîan
de xwedî nav û şan be.

Ewçen jêhatî û xwedî qewet bibe ku bi
qeweta xwe pêşberiya Îlios bike.

Hata (di derheqa wî de) kesên ha gotû jî
hebin: «Ez ji bavê wî bêtir jêhatî me»¹²
(VI, 476)

10. *Gotinên ku rengê gotinên pêşinan didin.*

Çawa jî Xwedê yên mîna hev rastê hev
tîne. (17, 218)

**

Dilê kesên esilzade dişewite. (XV, 203)

Ku serê wî de derbaz bibe, êdî budela jî
fêr dike. (XVII, 32)

Zêdebûna fermanrewan rind nine. (II,
204)

Di rewşa şer de bêhn vedan kurt e.
(XI, 801)

Xwedê her tiştî digihîne mebestê.
(XIX, 90)

Not:

1 Ev her du eser yê wî şairîbi xwe ninin, lê
yên ekola wî ne. Bo ku bikaribin ji hev cihê
bikin, yên Îlfasê (Îlios) bi hejmarên
Romeyê ve û yên Odysseîyê (Odysseîa) jî
bi hejmarên Latîni ve hatine diyar kirin.

2 Behr; yekî nêr, ya duduyan mê bi dudu
heyiyên behrî ve û bi cutek Xedan ve tete
zimên: Li gor vîna av «(ku niha û her tim
hakim e) zayîndara giş Xwedêyan e.»

3 Hebûna Xwedê bi awakî têkuztir nayê
neqil kirin, ku di vir de bi awakî nevekirî
tiî dirêjê vê meselê dike.

4 Xwedêyê herî mezintir jî vê terazyê ku
çî nîşan da qebl dike.

5 Ji Îlfasê bêtir dastanekî nû ye: Wesa tê
zanîn ku ev serboruya di girava Kypros
(Qibris)ê de hatiye jiyînê, ji ber vê yekê ev
wek Kyprîa tê zanîn. Li gor tewra
rasionalîst a îro mirov dikare vê gotine bi
vî halî bîne zimên: Bi awakî bê qerar
zêdebûna nifusê, rê dide şer.

6 Di vir de mana derd kişandinê
(derdxwûrî) ev e ku hûnermend eserek
biafrîne ku ji vê dûr û dirêjtir bikaribe bijî.

Li gor vîna
tenê rindî ji
kesî re nesîb
nabe, yên din
jî dikevin
para mirovan.

8 Homeros
di navbera giş
tiştên mirovî,
heta yên ruhî
û heyyên
dinyayê de bi
hevbandiyeke
(relatîon) kûr
dibîne. Ho-
meros, bo ku
bikaribe bi
awakî têkuztir
vê hevben-
diyê bîne
zimên, tiştên
lihevçûyî
bikar tîne.


9 Moîra,
ango
Xwedêya
Qederê, pir
car di dewsa
Zeusê de an ya
"Xwedêyan"

de bi kar tînin. Her di vir de jî bi vê mana
xwe bi kar hatiye.

10 Xebardarê Xwedêyan Homeros jî vî
paşnavî bi kar tîne, lê sed der sed çî dibêje
nayê zanîn. Kurê-Atreus Agamemnon e.
Orestes jî kurê wî ye.

11 Yanê kesê ne azad, bibe bibe qasî
nîviyê kesek azad bi ser dikeve.

12 Ev ji bo têoriya Nietzsche ku dibêje
mirov ne tenê neslê xwe didomîne, her "divê



ji bo pêşdebirin
û bilind kirina
neslê xwe jî bi-
xebite" dibe
hîmek.

JI THEO- GONIA YA HESIODOS

Silav ji we re
(Museî),
zarokên Zeus,
kilamên
xweşik bidin
min.

Ka bêjinî
çawa bûye ku
pêşde Erd û
Xwedê çêbûne

Û çemên ew
behra bê serî û
bê bin a ku pêl
dide û digurre,

Ew şterkên
diberiqî û ew
ezmana pan û
fireh

.....
.....

Ji min re bêjin wan Museuno, hûn ên
ku Olymposê de qonaxên we hene,

Ji serî vê de û bêjin, ji wan kîjan ji ya
din pêşde çêbûye.

Rastî ew e ku ji her tiştî pêşde Khaos
hebû, dû re jî

Ev axa sîng pan a ku ji bo her kesî
cihek qayîm e bo sekinandinê

Û Eros, ya herî rindiktir a Xwedêyan e.

.....

Erebos (tarî), bi Şeva reş û tarî re jî ji Khaosê peyda bûn

Ji Şevê jî Aîther (ronahî) bi Roj re (peyda bûn)

Wê ev ji Erebosê (tarî) girtibûn, bo ku wê û Erebosê ji hev hez kiribûn û hatibûn ba hev û ew ji Erebos ducan mabû.

Axê jî, pêşde ji xwe re, qasî xwe

Ezmanekê bi stêrk çê kir, bo ku wê hambêz bike û biparêze;

Çiyayên mezin pêk anîn, cîhên xweşikên rawestanê ji bo Xwedan û

Nympheyên ku di çiyayên bi tengavan (bixazan) ve birrî de, dijîn;

Her weha ew behra ku sekinandin çiyê nizane pêk anî, ew ê ku tîm digurre,

Pantos, bê evîna bi xastek, dû re jî wek hevalekz ezmanê Okeanos a bi gîrdabî jê bû,

Koîos û Krîos û Hyperîon û Îapetos û Theîa û Rheîa Themîs û Mnemosyre û Phoîbe ya bi çeleng zêrîn û Thetys jî.

Bi dû wan re jî yê herî xorrtirê wan Kronosê qumaz jê bû.

Rheîa bi Kronos re zewicî û zarokên gelek ciwan ji wan bûn:

Hestîa, Demeter û Hera ya xwedî keleka zêrîn,

Hadesa ya bi hêz, ku mala xwe di bin erdê de ye

Dilê wî tu car ji kesî re naşewite û Ennosîgoîs, gelek gurre gurr kirî,

Û Zeusê xwedî fikir, ku serokê Xwedêyan û mirovan e

Ku mirov û Xwedê giş ji ye4k kokê ne.

(ji Roj û Kar û Bar)

(Ji Tesewwura Kevn a Kaînatê:)

Evçend di edê de çûye ku qasî dûriya ma-beyna welatê bin erd û ezmanê.

Ji ber ku orsekî tunc, neh roj û neh

şevan de

Ji êzmîn berjêr diket, ta roja dehemîn de digîha Tartarosês.

Ji Kosmogonîyên Orphîk:

(Kosmogonîa ya Orphîk ji şevê dest pê dike.)

Di serî de Khaos hebû, Şev bi Erebos a reş û Tartaros a fireh,

Ne erd, ne hewa, ne jî êzmîn hebû.

Di hambêza bê sînor (ebedî) a Erebos de, Pêş de Şeva bask-reş hêkên xwe yên ber ji ba girtî anîbûn,

Ji vê hêkê, piştî dem û dewranek Erosa ku bûr dikirin pêyda bû

Di ser piştî du baskên zêrîn de diberiqîn, qasî bahozan bi lez

Ev jî, di Tartarosa fireh û pan de, bi Khaosa tarî de mayî re raket

.....
Berê neslê nemiran tunêbû, hê ku Erosê tişt nêanibûn ba hev.

Dema ku tişt hatin ba hev, ezman û Okeanos jê pêyda bûn

Erd û neslê tev Xwedêyên bextewar ên ji vir neçûyî,

Di serî de ejderhayek wesa bûye ku di bedena wî de serê boxe û şêran derketine, di nava wan de rûyê Xwedê hebûye û milên wî bi bask bûne... Ev ejderha hekek xwe yê pir pir mezin dike. Û ev hêka di bin giraniya xwedî hêkê da (ango ejderha) dibe du parçe. Parça wî ya jorin dibe êzmîn, ya binî jî dibe erd. (B 13)

Ji Theogonîa Pherekydesê Syrosî:

Zas (Zeus) bi Kronos (Xwedê yê Demê/Zeman) û Khtonîe (Xwedêya Erdê) her hebûne. (Zas û Khtonîe) dawatê çê dikin. Ku roja sehemîn a dawatê tê, Zas tixbende-k stûyê a mezin û rindik çê dike; bi çînikên xweliya reng bi reng û bi behran û

xaniyên behrî ve rûyê wê dixemilîne. (Û Zas ji Khtonîe rê dibêje): «Bo ku min dixwest ev dawata çê bibe, niha ez qedrê te dizanim û vê tixbenda stûyê ji te re diyarî dikim. Wek jina xwe ji te re dibêjim bi xêr xatî!»

Tiştê ku cara pêşin diafrîne tiştêkî çê ye. (A 7)

Not:

1 Muse, li gor Yewnaniya kevn, jinên xwedêyî in ku şîeran îlham dikin mirovan. Di serdema qirna kevn a Yewnanê de wesa bawerî dikin ku, her celeb hunerên mirov bexşên Xwedê ne. Di şîerên Homeros û Hesîodos rêça vê hîr û baweriyê xweş tê xûyan.

2 Zewaca dê bi lawê xwe re. Mythosên kevn zewaca bi vî awayî û bi hev re zewicîna xuşk û biran bê texsîr mîna motîvek bi kar tîne (Di serî de Kronos û Rheîa, dû wan re jî Zeus û Hera).

3 Kronos bi rêya qurnaziyê ve, Uranos (ezman)-Gaîa (erd) ku berê pêşin bûn ji hukim xistibûn û ew Xwedêyên dereca duwemîn ketibûn dewsa wan. Di nava wan Xwedêyan de ev jî hebûn: Hyperîon (lawê-bilind û balan, paşe bû paşnavê Xwedêyê Roj Helîos, ji aliyê Hôlderlîn ve mîna navek taybetî tê diyar kirin). Îapetos (bavê Prometheus e), Xwedêya Heq û Hiquq ê Themîs, Xwedêya Hafizayê Mnemosyne e (diya Musean e).

4 Ev, berê sêhemîn in û neslê dawî ya Xwedêyan in. Ev jî di bin seroktiya Zeus de, paşê, berê duhemîn a Xwedêyan ji hukim dadixin. Hestîa Xwedêya Agirê Oxaxê ye, Demeter ya Nandayîne ye, Hera Xwedêya Çavdêrî ya Zewacê ye, Hades Xwedêyê Mirinê ye. Ennosîgaîos tê mana «erdhêjan» û navê

hakimê behran Poseîdon e, ku zelzelan çê dîke.

5 Di vir de dinya tam mîna dîtina Grekiyan wek heyiyek rast û pan tê dîtîn. Di vê heyiyê de (dinyayê de) jimara pîroz a 9 hakim e (sê qatê jimara 3 ye, ku di adetê gele miletan de bi awakî pîroz tê dîtîn). Pîroz bûna jimara 3, dibin bi jin-mêr û bi lawikê wan re girêdidin.

Ji Gotinên Heft Zanayan (1)

1. Kleobulosê Lîndosî2 dibêje ku:

Pîvan tiştêkî çêtir e. Di lê qedrê bavê bê ragirtin. Mirov ji bêhnvedanê kêfxweş be, ne ji gevezetiyê. Divê ji hevvelatiyan re şîretên xweş bînin kirin. Gere haz di bin kontrolê de be. Gere tu tişt bi zorî neyê kirin. Divê zaro bînin perwerde kirin. Kî ku dijminê xelkê xwe ye, divê wek dijminek lê bê nihêrtin. Divê mirov duşê xwe re bi-zewice; ji vîna bilindtir ji te re efendî tê, ne wek xizmekî te.

2. Solonê Athenî dibêje ku:

Tu tiştî de bê qerar (ji çarçova pîvanek misbet der mekeve) mebe. Hazê ku bi xwe re pozxîniyê tîne, jê bireve. Zû zû dost mebe, yê ku dostên te ne jî zûtir ji çavê xwe mexe. Heta hîmê di bin hukimê de mayîne nebî, nizanî tu yê dê çawa hukim bikî. Ya ku tere kêfa hevvelatiyan ne, ya ku çêtir çêtir e salixê hevvelatiyan bide. Yê nexûyayî ji yê xûyayî dabixe (derîne).

3. Khîlonê Îspartayî dibêje ku:

Bi xwe bizane. Hêdî hêdî here ziyafeta dostan, lê her çî zûtir e xwe bigihîne felaketa wan. Dawat divê bi awakî sade bînin çê kirin. Dû kesên mirî re bêje xwedî bext bû, meteh bike. Kesên bi sal ji te mezin

re giramî nîşan bide. Pêşî li îxtirasê bigir. Li gor qanûnan hereket bike. Neheqî ku ji te re hate kirin, aştiyê bixwaz; heqeret ku ji te re hat kirin, tola xwe bistîn.

4. *Thalesê Miletî dibêje ku:*

Hevalê kefaletê felaket e. Ji rêya xira-biyê ve dewlemend mebe. Ji bavê xwe tiştên xirab mestîne. Te ku ji bav û diya xwe re çî xêr kiriye, kengê ku bûyî pîr tu jî her bendê wê be. Bê karî û bê hêzî tiştên diltezî in. Ji xwe re hakim nebûn, (mirov re) zirar tîne. Dilê van ji te re dişewite, bila te nekişînin çêtir e. Bi qerar be.

5. *Pîttakosê Lesbosî dibêje ku:*

Esilzade bûn zehmet e. Bi hêviya wextê misaît bisekine. Tiştê ku dixwazî bikî mebêje, te ku neanî cîh bi te dikenin. Tiştê ku tu nexwazî kes bike, tu bi xwe jî wî/wê meke⁴. Bextreşî ne şerm e, bo ku ketine ber kerbê Xedêyan. Êuninanî bi erdê rêş tê, lê bi behrê naye. Qezenc, têrbûn (bes) çî ye nizane. Tiştê ku dişkê te (kêrî te tê) bi dest xe⁵. Ef ji tol standinê gewettir e.

6. *Bîasê Pîreneyî dibêje ku:*

Pîraniya mîrovan ne rînd î. Gîran gîran dest bî kar bike, carek dest pêkîr jî bî çar destan bî çar destan pê bigîr. Bo ku şaşiyê mekî, ji zû zû qise kirinê nefret bike, ji ber ku bi dû re pişemanî tê. Çi ku dikî, lê bifikre. Pir guhdar be û di cîh de qise bike. Ne bi zorî, razî ke wesa jê bigir. Ku te tiştê çêtir kiriye ji Xwedêyan bizane, ne ji xwe.

7. *erîandrosê Korînthosî dibêje ku:*

Ya teva pêş de bigir. Aramî tiştê xweş e. Lêpekî tiştêkî derewîn e. Qezenc tiştêkî pîs e. Ku bextê te heye, bi qerar be; ku nine bifikre. Ji dê û bavê xwe re bide

xûyan ku tu liyaqî wan î. Li hember dostên di halê bextewariyê de çawayî, di halê ne bextewariyê de jî her wesa be. Qanûnên te qedîm (kevn), xwarina te bila teze be.

(Ji *Fragmente der Vorsokratiker I 10*)

Gotinên bi mane yên li ser zimanê xelkê:

1. Bike bibîne.
2. Yê ku birîndar dike rind dike.
3. Tiştê rind zehmet e.
4. Ya çêtir ev e ku mirov ji diya xwe nebe, pir zû mirin jî bi dû wê re tê.

Not:

1 Di nav Heft Zanayan de hebûna mirovek mîna Solon, paşê serkarê xelkê Lesbosê Pîttakos, siyasetmend Bîas, hukumdarê Korînthosê Perîandros tiştêk balkêş e. Ev tê wê manê ku di wî wextî de jî zanayan mîna xizmetek hêja ev kar û barên komelê kirine.

2 Di girava Rodosê de navê bajarek.

3 Ev gotina di antrêa mabeda Apollon de hatiye nivîsandin. Li gor gotina Platon mana wê wesa ye: «Bizanibe ku tu tenê mirov î.»

4 Bingeha etikê (exlax).

5 Mana vê ev e: Tiştê ku ji bo, seba heyîna te minasib e, hewl bide wî ji xwe re pêyda bike.

6 Kesê ku kesekî efu dike, ji kesê efukirî bilindtir dibe; kesê ku tole jê distîne dikeve mustava wî (gunekar).

(*) Ev fragmentên kevn ên Felsefeya Yewnanê, bi awayê danberhevî ya tekstên Tirkî û Îngilîsî ve wergerandine li ser Kurmancî.)

MIROV Û HEVRIKÎ DI TABLOYÊN **EDNAN ŞÎNO** DE



Xelil DUHOKÎ

Her çend dijminên milletê kurd, bi hemî taqet û planên xwe ve, hewil dane ku wî ji nav biben, lê dîsan nekarîne bigehine wê annanca genî û rê li pêşveçûna wî bigirin. Xelkê me di riyên siyasî, çekdarî, civakî, aşî, rewşenbîrî, hunerî û edebî de, hewil daye xwe biparêze û xebata xwe ber bi pêş de bibe û bigehe amancên xwe yên pîroz. Lê mixabin negehaye. Niha li Kurdistanê başûr azadiyek peyda bûye û şûrê Sedamê xwînîj rabûye. Lewra vê çendê rê li ber hunernendên kurd vekirîye û wan kariye Yekîtiya Hunermendên Kurd

ji xwe re damezrînin. Ewe ji layekî ve, ji layê din ve jî, rewşa aborî ya Kurdistanê başûr xerab e û ji hemû rexan ve hatiye dûrpêçkirin jî, hunermendên kurd roleke girîng listine û millet ber bi pêş de birine. Niha bi dehan hunermendên jêhatî li welêt hene û pêşangeh û çalakîyên xwe pêşkêş dikin. Yek ji wan hunermendê serketî û navdar Ednan Şîno ye. Ew di sala 1963'an de li bajarê Amêdiyê ji dayik bûye. Di sala 1986'an de Peymangeha Hunerên Ciwan li Bexdayê bi dawî aniye. Wî di jiyana xwe ya hunerî de çendîn pêşangehên taybetî û giştî pêşkêş kirine. Tabloyên wî rewşa aloz û karesatên milletê kurd hembêz dikin. Wî bi firça xwe, tabloyên jêhatî li ser rûdanên Kurdistanê wêrankirî xemilandine. Ez bawer dikim ku eger delivên derveyî welêt "Parîs, Madrid û London" jî bo wan hunermendan peyda bibin û ew ji nêzîk de agahdariya li ser rewşa hunerî ya cihanê peyda bikin, hingî ew ê qonaxên diwartir derbas bikin û doza milletê xwe ber bi pêş de bibin. Di havîna bûrî de min seredanekek bo Kurdistanê kir û çend hunermendên serketî dîtî, ku yek ji wan Ednan Şîno bû. Min bi pêwîst zanî vê hevpeyvîne di gel bikin.

Xelil Duhokî: *Tu çawa çûye di nav hunerê şewekariyê "Teşkilî" de?*

Ednan Şîno: Her ji zarokiyê viyana



Ednan Şîno li ber tabloyeke xwe. (Foto: X. Duhokî)

hunerî di dilê min de hebû. Dîmanên jiyana civatî û rindî ya siroştê Kurdistanê şîrîn ez rakêşabûm, ta ku min li dawiyê Peymangeha Hunerên Ciwan li Silêmaniyê û paşê jî li Bexdayê bi dawî anî. Lewra ta ku ev ro ez hest, viyan, ciwanî û boçûnên jiyana xwe bi rîya hunerê şewekariyê derdibirim.

- Rola hunermendên kurd di dema faşîzmê de çi bû û piştî serîhildanê gihîştîye çi qonaxê?

- Gelê kurd jî hemû malê xwe bêbeş bû. Hingê hunermend bi rewşa wê demê ve girêdayî bû. Faşîzmê çi rê nedida hunermendên kurd ku bi azadî bîr û baweriyên xwe bike tablo. Lê dîsan hinekan dikarîbûn xwe ragirin, bajarvanî û rewşenbîriya milletê xwe biparêzin û qonaxên sext derbas bikin. Hinekên din jî xwe ragirtin û hunerê xwe neanîn qadê û

xwe bêdeng kirin. Ev helwêsta "Bertolt Brecht" jî di dema faşîzma Alman de wergerîtiye û wî ev jî bi xebateke girîng zanî ye. Lê mixabin piştî serîhildanê, hunermendên kurd nekariye bi rola xwe ya pîroz rabe, nemaze beramber van karesatên mezin.

- Hinek hunermend di wê baweriyê de ne ku huner jî bo huner e, lê hinekên din huner jî bo xelkê diafirînin. Bawerîya te bi kîjan xwendîgehê heye?

- Huner wek çalakiyeke civakî, di nav milletê de rola xwe dibîne û kartêkirina wî di gel jiyana berçav dibe. Helbet divê huner jî bo mirovî û civatê be û evîne bide hemî layên jiyana. Di vê rewşa aloz û pîr jan, xem, trajedî û man û nemanê de, divê huner jî bo wan xalên pîroz bête afirandin.



- Peywendiyên te di gel derveyî welatî çi ne?

- Hunermendê di nav derd û xemên milletê xwe de, ew dizane rewş çawa ye û ew ji nêzik karî dike. Lê yê ji dûr ve guh lê dibe, nikare wê rolê bibîne. Mixabin peywendiyê wisa ne peyda bûye, ku em bikaribin mifay ji hevdu wergirin. Ez hêvîdar im hunermendên kurd li derveyî welatî di astê berpirsiyariyê de bin û berevaniyê ji mafên milletê xwe bikin.

- Dijminan Kurdistanê başûr dûrpêç kirine û rewşa aborî ya milletî xerab e. Gelo ya hunermendî çawa ye?

- Girantirîn, aloztirîn, bixemtirîn rewş îro li Kurdistanê ye. Helbet jiyana mirovên kurd di nexweştirîn qonaxê de ye. Hevrikiyê ji bo mana xwe dikin. Huner wek çalakiyê fikrî, pêdivî bi serbixweyî û kerista karî (kaxez, reng û

fırçe) heye, ji bilî rewşa aborî ya xerab. Lê di gel hindê jî, hunermendê kurd girêdayî doza pîroz ya milletê xwe ne.

- Çalakiyên te çi bûn û projên te çi ne?

- Min heta niha di çendîn festîvalan, pêşangehên taybetî û giştî de, li seranserê Kurdistanê û Bexdayê beşdarî kiriye. Ez hêvîdar im ku delîve hebe û li derveyî welatî pêşangehekê vekim û rewşa milletê xwe bo cîhanê xuya bikim.

- Peyva te ya dawiyê ji bo hunermendan çi ye?

- Yek îrade... Yek fedekarî... Yek doz... Divê hunermend bi giraniya xwe ya dîrokî rabin. Bizava hunerî ya kurdî ber bi pêş de bibin û bigelînin pileyên bilindtir. Em li vêre pêdivî alîkarî û piştevaniya giştan in...



VEDÎTIN

Varlin STRANSEV

Min û kurê xwe li malê bi çavmiçînkê dileyist. Bû dora min, da ez çavê xwe bigirim. - Ez werim? Tu li ku bî ez ê te bigirim, tu dûr bî an nêzik bî, mefera te nîn e! min çavmiç wilo got, piştî min dest pê kir û ez li kurê xwe geriyam. Ez li bin masê geriyam, li bin text, lê min ew nedît. Min dolab vekir ji cilan pê ve tu tişt tê de nebû. Ew ne li pişt daniştekê mizin bû û ne jî li serşokê bû.

Mala me jî du odan e, ma wê kurik xwe li ku veşêre? Gelo jî mal derketibe? Zincîra derî va hê di cihê xwe de ye! Guman jî min re çêbûn.

Jina min jî rabû bi min re lê geriya. Ew li hemû qul û qewêrên malê geriya. Ji ber ku ew jî gera min ne bawer bû, ew li çavîkên pirtûkxanê jî geriya. Piştî bang kir:

- Alyoşa, tika dikim tu derkevî.

Tu bersiv nehat.

- Derkeve! Ez ê herim sūkê bûzayê biki-
rim.

Lê dîsa tu bersim nehat. Rabû min û jina xwe kire qêrîn ta gişt hîsteryayê jina min girtibû.

Dawî kurê me derket.

- Tu li ku bûyî?

- Ez li wir bûm.

- Li wir! Li wir li ku?

- Li wir, ez di dûrbûna çaran de bûm.

- Çi!! Çi dûrbûn?

- Ya çaran, sê dûrbûn hene, ez bi ser ya çaran jî vebûme.

Ez û jina xwe em mane dilehayî. Jina min bi xweşkayî got:

- Wê dûrbûna çaran nîşanî me jî biçe, me... me jî bi xwe re bibe kurê min î delal!

Kurê me got:

- Na... êdf hûn ê bi ser her tiştî ve bibin, lê ez ê Yarka, Îgor û Vasya bi xwe re bibim. Li wê derê em dikarin ji xwe re bi hokêy bileyizin. Tu kes jî we nikare me li malê girê bide.

Sewdanê min hew têdigeşt û ez bêçare mabûm. Rabû ez wê rojê bi lez çûme înstîtuta lêkolînên zanistî. Ez gelekî mirovhez bûm. Min ji wan re got:

- Ev yek bi serê min hatiye. Hûn dixwazin bawer bikin an nekin, ev tişt weke ku ez dibêjim wilo bû. Kurê min bi ser dûrbûna çaran ve bû ye.

- ... Ramanan dixwîne?

- Ranan? Na me tiştên wilo li dora wî nedîtine?

- Dikare bi serê tiliyên xwe bixwîne?

- Na!

- Çawa?... Min guman kir, ku nîşanên pirjîrbûnê li cem kurê we hebin.

- Lê bi rastî ew bi ser dûrbûna çaran ve bû ye. Ji pêş çavên min ew çû wê dûrbûnê û jê derket.

- Bi rastî te ew bi çavên xwe dît?

- Ji ber ku çavên min girtû bûn min nedît ketiyê, lê bi rastî li wir bû. Tu cih di mala me de nîn in ku ew xwe tê de veşêre û em li her derê geriyên, piştê min dît ew vegeyriya.

- Çawa? Ji bin erdê derket.

- Ji bin erdê?

- Erda binê malê? Qeboya we heye?

- Na! Em li qatê sisiyan e, wê çilo qeboya me hebe?

- Tu dizanî çî... yê nî xurifû devê xwe digirin û bela xwe vedikin! Li vir tu li înstîtuta lêkolînên zanistî yî û çaxê me nîn e em li çîrokên leylandî guhdarî bikin.

- Ez vê dizanim û ji ber wê ez hatime vir, ji bo zanistiyê û ji bo kurê xwe ez hatime cem we. Ez ditirsim ku kurê min li wir di wê dûrbûnê de windayî bimîne.

- Çefîn e tu kes ji te bawer bike. Li gor me ji nû di sala 1995'an de gereke em bi ser dûrbûna çaran ve bibin, lê ta niha jî hê em ji xwe ne bawer in.

Min deng nekir. Wî dawî got:

- Baş e, vî kurê xwe bîne û bila vê dûrbûna çaran nîşanî me bide!

Ez dilxweş vegeyriyam malê.

- Alyoşa, Alyoşa! Bilezîne civanekî me li înstîtuta lêkolînên zanistî heye, da lêkolînan li ser vedîtina te bike! Rabe, da li hêviya me nemînin!

Kurê min bi nermî got:

- Bila bimînin. Piştî ez xwendina xwe li zangoyê tewaw bikin, ez ê herim wan bibînim.

- Çima tu niha nayê?

- Ji ber... Bavo, tu rojnaman baş naxwî. Ew dinivîsin, ku tecribên li ser zarokan çêdikin mezinbûna wan î xweristî diterpilînin!

- Baş e, lê divê tu nema winda bibî!

- Te çî got?

Serê xwe xurand û ji dil got:

- Ew li gor we dimîne... Ez hew bi xwe dikarim, min ji mêj ve tu bûza nexwarîye.

- Kurkê min î guneh...

Ez bi lez derketim û çûme sîkê, da jê re hinek bûza bikirim. Dema ez vegeyriyam, min dît ku wa ye jina min malê tev û li hev dide û li kurê me digere.

Serinc: Ev çîroka zanistî ya leyanî

(science fiction) negirêdayî hatiye wergerandin.

Werger: Zagrosê HACO

BÊDENGIYA KEVIRÊN DEMÊ



Mervanê KELEŞ

Ji bo rehmetiyê Berzanî

Dema te çavên xwe hildan bejna
min

Xwedê digiriya
Û kuliyên wî
diçin bi ROVIYÊN kevnar re
Tu û çerxê
qayîşkêşîneke rewrewkî bûn...
Em û keviran

hişkaya êvar
û tozê bûn
Lê Xwedê û em wekhevên
volqanekê
sergirtî
bi çiyayekî
xencerên
kal
bûn...

Em anha
rût in
rût
ta
çepelên
birçîbûn
û
penaberiye
Lê dîsan em û Xwedê wekhevên
kevirên
ROK
û
seqema AR
bûn...

... dema ku bêdengiyê
EM
rapêçan
derya
difiriya
bi du baskên
ji rivînê:
... hespê
sipîbûna
dinihurîne
awzake
ÊŞÊ!...

Me rojekê
xewnek nedîtî
ku mij dalêse
bîlna sibehê qer
di geryana nazikiyek

xapanok de:
 ...hişk hat
 dinikilîne pišta berzûriyê
 BEFRA me ya dawî
 Û KEWÊN
 hêlînên
 çilmisî
 Tišta mayî bo me
 ji derbasbûnê
 TÊRA
 kincên mendalekî
 ne dikir
 û ne fener
 diçirisî
 ji melevanekî
 bîhn diçike
 di
 hiimbêza
 berqefekê
 de.

(2)

Carekê em di hingûrekê de direqisîn û
 tavên bê dixulxulîn... bi me re bû çirûska
 xewnê dema em veciniqîn bi zilamekî re
 ku pêşengiya "melaîketan" dikir
 lê
 em wenda kirin
 " melaîketan" !!!
 belê
 em wenda kirin
 bi ûqetûqeke sar re
 ji Xwedayekî
 sar
 dicû
 babîsoka
 gihînê...!

Anha em bin çermên xwe saxû dikin li
 wendayekî dilorîne pencên me yên ku

bîranînan dibîşkiwînin digerin...

(3)

Tu nehatî ji bilî ku dema me
 û nerîna çavan
 biqurimînî
 Em xwe davêjin hemû giyayên ezmên
 dikin hilperikin
 barînê lê di hundirê me de tilfk dişkin...
 bang dikin... Xwedê!... Xwedê!...
 Lê ewr li hev vedigerin hesinek
 kerbûnê di guhê
 me
 de
 difikîne...

Çiya di hinavên me de fêrî aramê dibe
 hinga tu vê seh dikî
 dergûşa dûrketinê dihejîni mîna ku tu
 dixwazî em cînarê
 wendahiye bimînin zarokin çarlepika
 diçin di wêneyekê
 de her yek wê tewaw dike bi
 qermeçandinê û kom dibe
 bi hîveke
 miçiqî re
 ku
 germ dike arê te
 bi avê
 û dipijiqe kenekî:
 ha... ha...
 haaaaa...
 lê tu rûdinî
 di bendemaneke
 nemir de...!!

2506-050794, Swêd

BAYÊ AZDIYÊ

Rojhat AZADÎ

Baran dibariya. Tav li pê tavê dihat. Nedihişt mirov çavên xwe vebike. Xuşexuşa avên cem û newalan bû. Xur-mexurma ewrên payîzê... Birûskan vedidan. Ji çiyar guregura bayê azadiyê dihat. Hewtehewta kûçikan û zirezira keran ji zûda ve xwe dabûn cem hêzên tariyê. Li hêlekê ronahiya stêrka serxwebûnê li hêla din tarî û bindestiya hezar salan . Bi gotinek din, li hêlekê gurên har li hêla din berxên jîr û zana cengeke dijwar dikirin. Xwîna cengvanên sor bi ava baranê re diherikî newalan. Newal diherikîn rûbaran. Rûbar diherikîn cemê Dicle. Dicle har û dîn dibû, pêl mîna ga bi ser hev de diqeliband; hêz dida xwe ji bo kêliyêkê pêsta xwe bigihîne derya serbestiyê. Yêk caran dixwast bajarê Amedê bide ber xwe, bi pêlên xwe yên xurt qilêra hezar salî bi

carekê bişo û vî bajarê kevnar ji derd û kulan xelas bike. Demekê şûn de baran sêkin bû. Hêzên tariyê xwe şûn de kişandin. Seatek zêdetir bû roj çûbû ava. Stêrka sor derketibû. Hîv û stêrkên spî yên derewîn di paş dîwarên hesinî û betonkirî de ji tirsan diricifîn.

Hêdî hêdî, bêdengiyê dest bi karê xwe dikir. Xêncî dengê lawir û sewalên kûvî û xuşexuşa avê, deng nemabûn. Her der xipûxalî bû. Hîna peşkên baranê dihatin xwarê. Bayê kurr pelên zer ên daran li ba dikir. Xişîniya pelên daran nalîna mirovên li ber mirinê dianî bîra payîyan. Darên şilf û rût mayî, gişt di şînê de bûn. Hewa sar bû. Li der mirov dicemidî. Gundî ketibûn hundir xaniyên xwe. Gêle di qulikên xwe de, teyr û tû di hêlînên xwe de bûn. Hirç, rovî, xezal û pezkûfî di lan û şikeftên xwe de ketibûn xewek ,şêrîn.

Kalo, li ber pencerê rûniştî, çavên wî li çiyayên jorîn, di nav xem û xeyalan de xwe wenda kiribû. Li der guregura bayê kurr, li hundir ji xeynî pixepixa zar û zêçên di xewa şêrîn de bûn, deng tunebû an jî nedihat bihîstin. Kalo, mirovekî nod salî bû. Dema li lihevxiştina hêzên dagirker û cengvanên azadiyê dinihêrî, serhildanên berê dihatin bîra wî. Ji serhildana Şêx Seîd heta wê rojê, yek bi yek di ber çavên wî re derbas dibûn. Birakî wî şehîd ketibû di serhildana Şêx Seîd de li çiyayên Pîranê. Cendekê wî li ser kasê bilind ê ber malan li tenişta ziyaretekê veşartibûn. Mirovên diçûn ser ziyaretê, dû ziyaretê re li ser gorna wî dia dixwendin. Xêncî gundiyan gundên nêzîkî wan kesî navê wî nizanibû. Gava qal dikirin, "gorna şehîd" digotin. Pirraniya mirovên jê re dia dixwendin, nizanibûn di kîjan

cengê de bi destê kîjan neyarî şehîd ketibû. Tenê her kes bi pakrewaniya wî bawer bû. Hinekan digotin; "pakrewanê cenga pêxemberan e", hinekan jî digotin: "leşkerê Rustemê Zal e" Çi bêjim, her kesî tiştek digot. Kalo, hîna li serê çiyê mêze dikir. Dilê wî şad, kêfa wî li cih bû. Xwîna birayê wî li erdê nemabû. Lê dîsa jî, dixwast bi destê xwe heyfa birayê xwe bigirta. Xwastinek wî ya din hebû; dixwast cejna serxwebûnê pîroz bike û wê rojê li pê pakrewanan, di nav egîtan de, bi mezin û piçûkên gelê xwe re, têra xwe bireqise.

Li asîmana ewrekî reş nemabû. Ne tenê ewrê reş, ewrên din jî wenda bûn. Asîman çik sayî bû. Wer xuya bû dîsa bayê kurr bi ser ketibû. Bi gotinek din Kalo, wek her demê dîsa, karê xwe hêja kiribû. Sê saet zêdetir bi ser êvarê re derbas dibû. Zar û zêç dû xwarina şivê re raketibûn. Heta êvarê li dû pez û dewêr baz didan. Diwestiyan. Danê êvarê dixwarin û xwe diavêtin nav ciyan. Hêsan nîne, heta êvarê li ser kaş û kûan, li pê pezê mîna gurê har çuyîn û hatin.

Xewa Kalo nedihat. Ji bêriya şalê xwe kîsê titûna qaçax derxist û cixarek pêça. Destê xwe li cêwan gerand; tizbiya nod û neh hebî, kêr, destnal û şeh jê derketin. Li dora xwe mêze kir. Na, ne xuya bû. Hestê wî wenda bû. Rabû. Çû derê pacê vekir. Çend caran destê xwe lê pelikand. Na, di wê de jî tune bû. Dawiya dawîn, li ser argûnê heywanê dît. Mîna zarokekî gava lîlika xwe ya wendayî dibîne, kêfa wî hat. Çend caran vexist û vêsand. Berê xwe da odê. Bi xwe bi xwe; "ez ewqas dibêjim hestê min li vira û wira nehêlin. Lê dîsa jî min qisek nekir serê vana" got û

li cîhê xwe yê ber pencerê rûnişt. Cixara xwe ya pêçayî ji ser kîsê titûnê girt. Di nav her du lêvên xwe de cîh dayê û vexist. Dûyî qaçaxê mîna dermanekî bê hempa kişand ser kezebê. Çend caran kuxiya. Van rojan êdî tamek ji cixarê jî nedigirt. Pîr dikuxiya.

Li der kûçik dihewtiyan. Pêşiyê got: "tolên nav malan in. Guh nedayê. Na, va ne dengê tolên nav malan bû. Va hewtehewta kûçikên mirovan bû. Hîna cixara xwe bi nîvî nekiribû dengê lêxistina dêrî hat. Ji awayê hatina wan, Kalo ew nas kiribûn. Hêzên kedxwaran nebûn. Dema leşker, kontra û cerdevanên wan diavêtin ser gund, tepirepa wan, guh bi mirovan ve nedihîşt. Kalo bazda paş dêrî, lê hema derî venekir. Çi dibe, çi nabe? Bi dengekî nerm û zelal "hûn kî ne?" got û derî heta dawiyê vekir. Yek jê lawê wî Serdar bû. Di nav hevalan de, jê re Hogir digotin. Navê wî yê azadiyê Hogir bû. Hogir û Kawa bi kincên xwe yên ji xwînê sor bûyî li ber dêrî bûn. Her du heval maçî kirin û li ser palasek mûyîn rûniştin.

Dayîka Binefş bi dengê kuxika Kalo ji xew şiyar bû. Mîna mariya du çêlikên xwe yên birîndar ên ji destên seydvanan fîlîtûne bibîne, ew girtin bin pî û baskên xwe. Hêstirên çavên wê mîna peşkên barana buharê li pê hev bi ser rûyên Hogir û Kawa de dihatin xwarê. Dû qisekirinek dût û drêj re, çend hêkên çêkirî, hinek qelî, sawar û sahanek gêrmiya ji ber şivê mayî da ber hevalan. Hevalan zikên xwe têr kirin. Agahdariyên ji Kalo re anîbûn, gişt bi carê jê re gotin û xatir ji xwediyê malê xwastin. Nîvê şevê bû. Hogir û Kawa hêdî hêdî ji malê dût ketin. Mîna kevokên bi fira xwe di nav asîmanê

şîn de wenda dibin, bi tariya şevê di nav dar û berê hêşîn de ji ber çavan wenda bûn. Nikanibûn zêde bisekinin. Li ser çiyayên bilind, hêlînên refên azadiyê li benda wan bûn.

Dayîka Binefş kir nekir, şuştina kincên wan pê pejirandin neda. Gerîla karên xwe bi welatparêzan nedidan kirin. Tim kincên xwe bi xwe dişuştin. Pîrr caran, li malên dibûn mêvan, fera û folên xwe jî bi xwe dişuştin. Hemî welatparêzan bi vî xwiyê wan zanibûn. Kalo, li ber argûnê bi koza agirê çayê tûn dida dora xwe li teniştê hevala xwe rûniştî, pê re mijûl dibû: "Aaax... aaax... qeda li dinyayê keve. Rind derin. Nerind dewranê dajon. Tê bîra te, ez carê bi Egît re hêrs bûbûm. Zimanê min bihata girtin, min dilê wî neêşanda. Dema dest bi şuştina firaxan kir, hiş ji serê min çû. Min xwe negirt. Min got, edetên bav û kalan nedin bin lingan. Wî jî gotibû; "bindestî jî ji bav û kalan maye; em wê jî nedin bin lingan?" Dawiyê ez, hêdî hêdî hînî şuştina fera bûm. Belê, Egît mafdar bû. Her tiştên ji bav û kalan de mane layîqî parastinê nûn in. Ji van hinek kufikî ne; divê werin avêtin. Ji bela parastina dîtî, raman, gotin û kirinên kêrî tiştêkî nayên, em îro hîna bindest in. Ji bav û kalên me, kirin û gotinên hêja jî, ji me re mane. Wekî Egît û heinî hevalan em ê li pey wan herin" digot. Bi rasû, van guhertinên di salên dawiya temenê wî de, li welêt xwîn didan zindîkirina jiyane bi temamî hisê wî nedigirt.

Dayîka Binefş dihênijî. Hişê wê dixwast hema rakeve; bi xew ve here, heta berbanga serê sibê bi xwe nehese. Lê dilê wê...Ew masiyê avek din bû. Ava çem û newalan têra wî nedikir.

BINGEHÊN GRAMERA KURDMANCI

Celadet Alî Bedir-Xan



ACDEM

Cihê Hawarê û xwedî û berpirsiyarê wê Celadet Alî Bedir-Xan, di dîroka hişyarî û întelektueliya gelê kurd de bilind e. Ma miletekî bê ziman çî ye? Gelekî bê kultur, bê huner, bê edebiyat jî çî re dibe?

Ev e, Celadet Beg xwest ku miletê kurd ji cihaneke tarî, kirêt û cahîl derxe, berê wî bide ser riyake rohnî, medenî û zana. Loma wî taviî dest avête zimanê kurdî, ji bo ku bike zimanekî edebî û yê nivîsandinê, dest bi weşandina kovara xwe kir û bi xêra wê kovarê ye ku em îro xwediyê zimanekî nivîskî yê standart in.

Ev pirtûka biçûk, lê wek nan û avê girîng, ji xebatên Celadet Beg yê di Hawarê de pêk hatiye. Di vê xebata ku zimanzanê me bi Bingehên Gramera Kurdmancî navandiye, li ser navdêr, mêjer, tewang, veqetandek, pronav, rengdêr û gelek term û formên din yê gramerî tête rawestandî.

Bi munasebeta bîranîna sedsaliya Celadet Alî Bedir-Xan û bi hêviya ku wê xwendevan û nivîskarên kurd vê pirtûkê ji ber serê xwe hilneynin, weşanxaneya me wê pêşkêşî pirtûkxaneya kurdî dike.

Navnîşana xwestinê:

**Termov. 52, 175 77 Järfälila/
Sweden Tel û Fax: 8-58356468**

MARX Û EDEBIYAT

Paul LAFARGUE

Marx Heine û Goethe ji ber dizanîbû, gava dipeyivî tiin ji wan dixwend. Wî ji hemû zimanên ewrûpî nivîskar hildibijart, berdewam şair dixwendin. Wî her sal Aeschilus ji zimanê grekî dixwend, ew û Shakespeare du dramtîkvanên dinyayê yê herî mezin dihesibandin. Wî Shakespeareê ku ew bêsinor jê re heyran bû û hemû kesên wî yê ne girîng jî nas dikir, ji serî heta binî li berhemên wî hûr dinihêrî. Li mala Marx tam kultureke Shakespeare hebû, hersê keçên wî jî piraniya berhemên Shakespeare ji ber dizanîbûn. Marx, piştî sala 1848'an bi kurtedemekê, gava xwest îngilîziya xwe baş bike (ji xwe di wê navê de dikarîbû baş bi îngilîzî bixwenda), wî hemû îdyomên Shakespeare yê karakterîstîk lêkola û ew ji hev qetandin; wî eynî tişt ji bo polemîkên William Cobbettê ku ew gelekî li hember bi hurmet bû jî kir. Wî ji Dante û Burns jî gelekî hez dikir. Gava wî û keçên xwe berhemên

Burns dixwendin û stranên Burns yê evîniyê digotin, min ji temaşekirina wan zewq distand.

Lêkolînerê bêwestan û hostayê mezin yê ilim Cuvier, gava midûrê muzexaneyê Parîsê bû, wî ji bo xebatên xwe yê şexsî çend ode veqetandibûn. Her odeyek ji bo lêkolînen şaxekî hatibûn veqetandin, û ji bo wê armancê pirtûkên pêwîst, alavên anatomîk û hwd lê hebûn. Gava Cuvier ji karekî diwestiya, derbasî odeyek din dibû, wî bi guherandina berê zihnê xwe ve, mîna ku bêhna xwe berdida, rehet dibû. Marx jî mîna Cuvier bêwestan dixebitî, lê belê îmkânên wî û peydakirina ewqas ode tunebû. Wî bêhna xwe bi di hundirê ode de çûyin û hatinê ve berdida. Wilo bûbû ku, ji çûyin û hatina wî, li ser xaliya wî, perçê ku dikete navbera derî û pencerê, mîna li ser mêrgekê şiveriyek çêbibe, li ser xaliya wî jî çî bigire şiveriyek vebûbû. Wî carinan xwe li ser dîwanê dîrêj dikir û romanek dixwend, piraniya caran jî du-sê roman bi hev re dixwendin. Ji ber ku wî jî mîna Darwîn gelekî ji romanên hez dikir. Wî romanên sedsala 18'an tercîh dikir û bi taybetî jî ji Tom Jonesa Fielding hez dikir. Romanvanên modern yê ku wî herî pir jê hez dikirin Paul de Kock, Charles Lever, Dumas û Sir Walter Scott bû. Marx Old Mortality Scott berhemeke sereke dihesiband. Wî ji çîrokên bi serpêhatî û yê mîzahî gelekî hez dikir. Li gorî Marx hostayên romansê yê herî mezin Cervantes û Balzac bûn. Dîsan li gorî wî, Don Quijote li dinyaya burjûvazî ya ku nû dîza, epîka binketina xûpakiya şovalyetiyê ya bêmane bû. Ew ewqasî heyranê Balzac bû ku, gava wî lêkolînen



**Marx di
dema xwe de
ji romanên
modern yên
mîna Paul de
Kock, Char-
les Lever,
Dumas û Sir
Walter Scott
hez dikir.**

xwe yên ekonomî xelas kirin, xwest li ser La Comédie Humaine ya Balzac rexneyekê binivîsîne. Li gorî Marx, Balzac ne tenê dîrokvanê tîpên civakî yên dema xwe bû, ew herweha avakerê tîpên karakter ku di dema Louis Philippe de hê tov bûn, û piştî mirina wî, di dema Napoleon III de, geş bûbûn, bû.

Marx dikaribû ji hemû zimanên ewrûpayî yên sereke bixwenda û dikaribû bi (almanî, fransîzî û îngilîzî) jî binivîsanda; hemû kesên ku bi van zimanan dizanîbûn, li nivîsandina wî ecêbmayî diman. Wî wilo digot, "Zimaneke biyanî, di têkoşîna jiyane de sîlehek e." Qebiliyeta wî ya hînbûna zimanan mezin bû, ev yeka han derbasî keçên wî jî bûbû. Gava wî dest bi xwendina rûsî kir, ew di ser pêncî salî re bû. Di gel ku danûstandineke etîmîlojîk di navbera zimanên mirî û jîndar yên ku wî dizanîbûn û rûsî de tune bû jî, di nava şeş mehan de wî zimanê rûsî ewqasî bi pêş de bir ku, wî bi rûsî dest bi xwendina şair û nivîsakarên rûs yên mîna Pûşkîn, Gogol û Şçedrin kir. Ji ber tiştên şirove kiribûn ewqasî ecêb bûn ku, ji bo ku bikaribe raporên lêkolînê yên fermî ku hukûmetê çapkirina wan qedexe kiribû, bixwîne, ew fêrî zimanê rûsî bûbû. Hin hevalên Marx yên nêzik ew dabûnê; di wê demê de li Ewrûpaya Roava ji bilî Marx haya tu ekonomî ji hebûna wan raporên tunebû.

Ji bo rehetiya zîhnê xwe, Marx ji bilî xwendina helbest û romanên rîyeke din jî dabû ber xwe; ew jî inatemafîka ku wî pir jê hez dikir bû. Cebîrê ruhê wî aş dikir; wî

di demên jiyana xwe yên herî bi bahoz de, xwe disparte cebîrê...

...Gava hê zarokên wan gelekî biçûk bûn, di rêveçûnan de ji wan re çîrokên bêdawî digot û li pêşberî xwe kîlometre kurt dikirin. Wî çîrçîrokên fantastîk yên periyên îcad dikirin û her ku rê dirêj dibû, wî bi keşîfên nû çîrçîrokên xwe dirêj dikirin, wilo ku guhdaran westandina xwe ji bîr dikirin. Xeyalên wî yên dewlemend yên helbestî hebûn û berhemên wî yên edebî î pêşî helbest bûn. Jina wî gelekî ji helbestên wî yên xortaniyê hez dikir, lê nişanî kesî nedida. Dê û bavê Marx xwestine ku kurê wan bibe edebiyatvan an jî profesor. Di çavên wan de, mijûlbûna wî ya ajîstasyona sosyalîstî û aboriya polîtîkî (wê demê li Almaniyayê mijareke ku hindik hurmet jê re dihate girtin bû) wî biçûk dikir.

Marx carekê ji keçên xwe re soz dabû ku ew ê li ser birayên Grakkus piyeseke binivîsîne. Lê mixabin, ew xwesteka wî bi cih nehat. Ev temaya "Şovalyeya şerê sinifî" epîsoda şerê sinifî yên bitirs û xof, hûnandina Marx ya vê mijarê wê balkêş bûya.

(Ji pirtûka Karl Marx, His Life and Work, Reminiscences by Paul Lafargue and Wilhelm Liebknecht.)

Wergêr: Dr. POLOÇO

HEVPEYVÎN BI FEQÎ HUSEYN RE



Bedirxan EPÖZDEMIR

Navê Feqî Huseyn ji xwendevanên Nûdemê ra ne xerîb e. Lê Feqî kî ye, çi dixwaze, bîr û baweriyên wî li ser wêja Kurd û bi taybetî li ser zimanê Kurdî çi ne? Min xwest ku bi Mamoste Feqî Huseyn ra li ser van pirsan bisekinim û xwendevanên Nûdemê agahdar bikim.

Ji sî salî zêdetir e ku ez Feqî Huseyn nas dikim. Ji naskirina min heya îro - ku gelek dost û heval jî dizanin- Kekê Feqî tûn û tûn bi mesele û metelokên Kurdan û bi wêje û ziman ra mijûl e. Ew vî karî bi salan bê westan dajo.

Zûda bû ku me hevûdu bi sererastî nedîtûbû. Wê pêlê hat, bû mêhvanê min.

Me tama gelek salan derxist. Dîsa em bi hev re ponijîn. Li ser çand, wêje û ziman em peyivîn. Me mecal dît ku li ser asteng û pirsgirikên wêja me qise bikin.

Em noqî salan bûn. Me li ku hiştibû, dîsa me li wê dom kir. Bê guman gelek pirsên nuh jî hatine holê.

Pêwîst e ku em wêja xwe ya kevin û dewlemend ji bîr nekin. Heyînên xwe bînine holê. Li ser wê dewlemendiyê dîwarên nuh ava bikin û remzekê nûjen bidine wan. Awayîyên me gerek bi xemil û xêz bin, da ku em bikaribin bigihêjin tema wana.

Çawan ku me li jor gotibû, Kurd xwedî

wêjeyeke kevin û dewlemend in. Li ser vî xûnê saxlem dîwar bilind dibin. Her yek ji me çengek ax, tasek av û tuxleyekê dikşîne ji bo vî dîwarê hêja. Kekê Feqî jî, ji me yeke ku bi salan bê westan di vî warî da xebatê dike.

Ya baş ewe ku ez zêde dirêj nekim û Mainosta Feqî Huseyn û xwendevanên Nûdemê bispêrim hev. Tenê min divê ev hevpeyvîn bibe wesîla nîqaşekirina pirs û astengên ziman û wêja Kurdî. Da ku em bikaribin problemên xwe zelal bikin.

B.E.: *Li gora we pirs û problemên edebiyata Kurdî ya rojane çine?*

F.H.: Pirsegirikên wêjeya (edebiyata) Kurdî, mîna pirsegirikên Kurdistanê yên din wusan pir in ku bi hevpeyvînekê, heya bi pirtûkekê jî çareserkirina şirovekirinê tune. Lê ji bo bê bersivnema-na vê pirsê, gereke hindêk mijaran tevêhev bikim û bigermilînim. Ez ê pêşî mînakekê ji gotineke klasîkî bidim: ewê boriya xwe nizane, roja xwe nas nake. Ew ê roja xwe nas nake, nikare pêşiya xwe tayîn bike. Her çi qas ev gotin ji bo siyasetê hatiye gotin jî, lê hemî karan jî dihindirîne. Lewra ji netewan ra wêje, mijareke wusan giring e ku hinek dewletan zango û hinekan jî danûşka wê damezrandine. Heya hinek dewlet çûne damezrandina wezîrîtiya wê. Tê zanîn ku di nêv siyasetê da, ciyê wêjê gelek giring e. Nexwe ew gotina jorîn ji bo wêjê jî tê bikaranîn.

Bi qasî zanîna min berî her karî wêja me ya kevin qasî nivisandî divê bête berhev-kin, bi awayekî zanyarî bêne amadekirin û bêne çapkirin. Piştî çapkirina wan afirînekan, ji bo vekolînê encumenên zanyar, divê bêne peydakirin û wan afirînekan hilînin destê xwe, vekolînin, tekûs bikin û ji nû ve bêxin bin xizmeta gel. Ew kesên li ser wêja Kurdî dixebitin,

divê gor babetên wan ew bêne hêjandin û çarên xebatê ji wan ra bêne amadekirin.

Heçî wêja Kurdî ya devkî ji xwe li ber leyî û limiştê (tufan) ye, heger bi lez neyê çareserkirin, dê ziyaneke giran jê bête dîtin; lewra çiqekê wêja devkî li ser milên medresên Kurdistanê bûn. Îro ev medrese hema hema nemane. Yên mane jî êdî wan peywiran (wezîfan) nikarin bikin. Çiqekê din li ser milê feodalan bû ku her yek ji wan dengbêj, dîloksaz, metelokzan, pes-qelyar (nuktedan), çolek (qeqşer), çîrokvan û êdî. Li nik xwe dihewandin, gelek rind xwedî dikirin û ji bo pêşvebirina hunerên wan hunermendan çare dixiste destên wan, îro ew saziman jî hilweşiyane. Ev her du (feodalî û medrese)rabûne û sazimaneke nûjen li ciyên wan nehatine avakirin. Çiqekê din jî li ser rewşa Kurdistanê bû ku ji biyaniyan ra girtibû û Kurd jî nedîçûne nêv biyaniyan. Îro ev jî herifî ye. Bêweko di van salên dawî da biyaniyan gelek celebên wêja me dizîne. Dengbêjên Kurd gelek stran û dîlok pêşkêşî biyaniyan kirine. Nivîskarên Kurd gelek çîrok, metelok û gotinên mezinan bi zimanê biyanî nivîsîne û radestê wêja wan kirine. Ev mînak têne pirkirin. Lê gor mijara me, gereke kurt bête birîn. Bi yek gotinê ez ê dawî li vê mijarê bînim: ji wêja Kurdî ra gor mercên roja me divê bergeranekê (tedarîk) ji dil bête kirin.

B.E.: *Kurd xwedî edebiyateke kevnar û dewlemend in. Em dikarin bêjin edebiyateke nûjen jî destpêkiriye. Li gora dîtina min pêwîst e ku di nava van herdu êkolên edebiyatê da pîrekê bê sazkin. Dîtina we di vî warî da çiyê, meriv dikare çi bike?*

F.H.: Ji xwe beşek bersiva vê mijarê di nêv pirsê da heye. Yê din jî bi vî awayî tê şirovekirin; stranên Kurdî celebekî rista

serbest û nûdem e. Gereke pêşî em stranên xwe baş bizanin û ew celeb serbestiya rista wê qenc hîn bibin, gor wî dest bi ristên nûdem bikin. Di zanîna min da ew pira jê tê dabeşkirin stran bi xwe ne. Ango stran bi awayekî kûs dê peywira wê pirê hilîne ser xwe. Hemine ku em nikarin xwe ji nûdemî û nûjeniyê dûr bikin, lê em nikarin pişt bidine wan taybetiyên di stranan de heye jî.

B.E.: *Qasî ku em dizanin, xebata we bi taybetî li ser ziman e. Xebata we li ser ziman kengê destpêkir, berhemên we çine, kengê hatine çapkirin?*

F.H.: Belê, çawan hun jî dizanin ku giraniya xebata min li ser zimanê Kurdî ye. Dikarin bibêjin serdestpêka xebata min ya li ser zimên digihije roja çûna min ya medresê. Di wan gavan da temenê min sêzdeh bû. Min nedikariya pirs ji kesan bikira û bersiva dirist bistanda. Carna min hinek pirs dikirin û ji alî feqiyên mezin ve dihatim kutan. Di wan rojan da, serê min gelek tevlihev dibû û min bi xwe ji xwe dipirsî: "çira rêzimanê Erebi heye, çira ferhenga Erebi heye, çira nivîsandin û xwendina Erebi heye û çira yên Kurdî ev hemî tune bin?" Min nedikariya bersivên pirsên xwe bidana. Lê gava ji kesekî peyvekê Kurdî ya xerîb an jî qaydeyekî rêzimanî hîn dibûm, nêhanî min dinivîsiya û vedîşart. Ji hînbûna wê rojê ye ku hêj jî wilo dikim. Vaye ji wê rojê vir da xebata xwe didomînin. Dora panzdeh pirtûkan ji wêja me ya kevnare û destnivîs bi dest min ketibûn. Ewqas jî destnivîsên min hebûn. Ev afirînek hemî 1979 an da ji aliyê xwişka min ve hatin dêrizandin. Dilê min nekarî vî barî ragire û nexweş ket. Hê jî ji wê nexweşiyê rizgar nebûne, Hêvîdar in ku ew teşqelê welê neyê serê kesekî din. Heya niha sê berhemên min

derketine: Rêzimana Kurdî (1991), Pêşeriya Hewisîna Zimanê Kurdî 1 (Kürtçe Öğrenme Metodu-1991), Pêşeriya Hewisîna Zimanê Kurdî 2 (Kürtçe Öğrenme Metodu 2- 1992).

B.E.: *We li ser berhemên xwe yên çapkirî tu rexne girtin, ew çi bûn?*

F.H.: Min sala 1978 an nivîsandina Rêzimanê Kurdî qedand. Qasî deh nusxan derxist û vekire rexne. Mixabin ji bil pesin û temenyan, tu bi destê min neket. Pêywîstiya min ji herdukan ra jî tunebû, Rexne ji min ra pêywîst bû û benda gelek rexnan bûm. Lê mixabin!.. Li ser vê yekê gelek hizirîm û min wuha hizir kir; bi vî awayê afirînek, kete destê hindik mirovan. Heger biketa destê gelek, mitliq dê rexnen ronahîker bihatina. Nexwe divê ev rêziman bête çapandin. Piştî çapkirinê, vêca ji min ra pesin û reşkirin hatin. Dîsa pêywîstiya min ji herdukan ra jî tunebû. Vê carê min li pesinaman û reşnaman qenc mêzand û min zanî ku herdu deste mirovan jî ji rêziman tu fêhm nekirine û nexwendine jî. Lewra li gora min ev pirtûk di warê ziman da bi rengekî akademîk hatibû nivîsandin, nekarîbûn bixwînin û jê fêhm bikin. Ji ber nerexnebûnê, ez qet li ser wan ranewestam, min guh nedayê û bêdengiya xwe tercîh kir. Gereke êdî Kurd jî rexne û reşnaman ji hevdu veqetînin û binasin. Reşname kîneretîne û reşkirina hemî mijaran e. Ango rastî û çewtîyan mîna hev çewt dibîne. Divê bête zanîn, di cîhanê da tu afirînek hemî rast an hemî çewt nabit. Hemine pirtûka min jî welê ye. Heçî rexne ye, çêkiryar e. Tenê bi şirovekirin û nîşandana çewtîyên mijaran, rexne nayê himatê (holê). Bê kêmasî danîna rastîyên mijaran jî pêywîst e. Ango rexne, ji nîşadana çewtî û danîna rastîyan tê

himatê. Nexwe yek ji wan bi tena xwe nabe rexne.

B.E.: *Li gora we di qonaxê îro da pirs û astengên zimanê Kurdî çi ne?*

F.H.: Ji wan astengiyên ku dijmin daûne pêşiya zimanê Kurdî zêdetir, nepeyvin, nenivîsîn û nexwendina pîraniya Kurdên rewşenbîrên bakura Kurdistanê ne. Belê ji alî herkesî ve tê zanîn, di pişavtina gelan da û di hincirandin û cincirandinê da, karbidestên Tirkên ji manendên xwe sitemkartir û diwartir in. Berê di Tirkiyê da û di bakura Kurdistanê da, bi Kurdî nivîsandin, xwendin û peyvîn qedexe bû. Niha ji qedexe ye, lê çavê xwe lê digrin. E baş e; ji wan Kurdên Ewropayê re çi bûye ku zimanê dayika xwe bi kar naynin? Ji wan Kurdên kurdînepeyiv ra ez ê wekî Kamran Bedirxan bibêjim: An nebêjin em Kurd in, an ji bi zimanê dayika xwe bixwînin.

B.E.: *Qasî ku em dibînin, îro di warê nivîs û gramatika Kurdî da cuda cuda nêrîn hene û di vî warî da yekîtiyek tuneye. Li gora we ev problemên han çawan têne pişkavtin?*

F.H.: Ew pîrsgirêka rêzimanî di eynî demê da pîrsgirêka rastnivîsiyê ye jî. Ev mijareke pîr girîng e. Li ser vê yekê rawestaneke ji dil dixwaze. Dikarin bibêjin, îro di nivîsandina Kurdî da anarşîstî heye. Xar û jor her nivîskarek (ez jî di nav da) mîna xwestina xwe dinivîse û yê wekî wî nenivîse çewt dibîne. Divê pêşî li vê yekê bête girtin. Ji alî hinek canêran ve hinek rêzimanê zaravayê Kurmancî hatine nivîsandin. Di hemiyana da ji rastî û çewtî hene û ji hevdu ferqîr in jî. Lê libek ji wan ji aliyê encumenên zanyarî ve nehatine nivîsandin, an jî dahûrandin. Pêywîstiya me ya girîng ev e.

Ji bo pêkanîna vî karî, gereke encumenekî zanyarî bête damezrandin. Ev encumen tenê li ser rêziman û rastnivîsa Kurdî bixebite. Lê gereke ew encumen, di bin bandûra zimanên biyanî da dest navêje zimanê Kurdî. Lewra ziman çiqas ji malbatekê bin, xezîne û teknîka peyvên ji hev an ji nêzîkê hev bibin, dîsa teknîka ziman û rastnivîsê jî hevdu dûr in.

B.E.: *Wek hûn jî dizanin, Nûdem kovareke çandî û edebî ye. Weke kovareke edebî hûn Nûdemê çawan dibînin û pêşniyarên we jê ra çine?*

F.H.: Ji wan kovarên ku ez dicibînim yek jê jî Nûdem e. Kovareke ji dil e û gor min xaza wê dirist e. Ji bo kovareke wuha ji dil sê meh domekek pîr dirêj e. Heger çare hebe domek bête kurtkirin, dilxweş dibim. Çawan di deverên din da, zanîna Kurdî paşve maye, wusan di warê dîroka wêjeyî da jî paraye. Yek jî giraniya nesla nû, wêjevan û hozanên xwe, nemaze yê kevin nanasin. Vaye ji Nûdemê ra pêşniyara min ev e : heger çare di des da hebe bila dest bavêje vejandina dîroka wêja Kurdî û wêjevan û hozanan jî bi me bide nasîn. Bi vî awayî pîrek di navbera nesla nû û ya kevin da bîne himatê.

B.E.: *Di dawî da gotineke we ji bo Nûdem û xwendevanên wê heye?*

F.H.: Jîn û domandina Nûdemê di gel xwedî, karbidest û xwendevanên wê daxwaza min e. Pêşkevîtin û serkevîna wan dixwazim. Her şad û bextiyar bin.

QÎZA GENERAL



Xelîlê ÇAÇAN

Havîn bû. Ez û hevalê xwe em li otobusekê siwar bûn û em çûn mala vêsgirtinê (etlahiyê, îzinê). Em herdu jî ancax 18-19 salî hebûn. Em hê azep bûn. Mala vêsabûnê li ber devê behra reş, li kêleka bajarê Soçiyê bû. Li rex mala me çend senatorya jî hebûn. Wana bi sûr ji hev dihatin cûdakirinê, her senatoryekî rez û bexçe, cihê sportê û lîstikên cuda hebû û hewza ajneberiyê jî cihê bû. Lê gava

meriv hinekî ji keviya behrê bi dûr diket, êdî tu sûr û çeper tunebû. Xelk tevayî diketine behrê, melevanî dikirin, şa dibûn. Rex cihê me senetorya general bû. Kî kêderê dixwest xwe dixiste avê, ha general, ha amîrî hêz ferq tunebû. Li wir tek tûk jî jin xuya dibûn, çawa dihate kifşê ew jî keç û jinên generalan bûn. Rojekê ez gelekî di avê de çûbûme pêş, min dît kulfetek ji aliyê senatorya general sovekarîyê dike û ber bi aliyê min ve tê, gelekî hat, ji min derbas bû û çû di cihê kûr de winda bû. Wê wisa rind sovekarî dikir, mirov tirê ka mareke di nîva avê de dişûlike. Wexta ew di kêleka min re derbas bû, di ser milê xwe re zivîrî û li min nihêrî. Min jî li wê nihêrî. Min wisa heband ku ew melyaketeke nav behrê ye, ku min ji çîrokana bihîstibû, dibe ewê evdê xwedê bibîne û dîsan niqoyî nav behrê be. Rastî jî wisan e. Gava jin kincên wê tamam lê nîn bin, ew bi hemû bedewiya xwe ve li ber çavên mirov disekine. Eva kulfeta jî qasî deqîqekê bi porê xwe yî qîçk, bi mil û laşê xwe yê notla berfa yekşevî, bi çavên xwe yên sût ve li ber çavên min sekinî. Ez ji bedewiya wê, ji bejn û bala wê ya tîtal, ku di nava ava behrê de hê bedew dixuya, şaş bûbûm. Min nizanîbû paş de vegerim yan li pêy wê herim. Hîna ez di nava mitala de bûm, xêlekê şûnda gava min serê xwe ji avê bilind kir û li qîzikê nihêrî, min dît ku wekî ew gelekî ji min bi dûr ketiye û tenê serê wê xuya dibe. Min qîrar da wekî li ser riya wê bisekinim heta ew vegere, careke dinê jî wê horî û periyê bibînim. Paşê herim. Xulasa ez heta hinekî vir de wê de çûm û hatim. Min dît ew vegeriya. Ez jî bi aliyê wê de çûm ku baş bibînim, ew

têgihîşt ku ez ji bo wê diçim, wê riya xwe guhert û bi lez hat ji min derbas bû û çû, lê min ew rind nedît.

Ez posî-posede ji avê derketim, min kincên xwe li xwe kir û ez çûme cihê xwe. Bedewiya wê temama şevê ji ber çavên min nediçû. Min digot: "Gelo Xwedêyo ez ê careke din wê bibînim an na".

Sibetirê min bi lez û bez hebek tişt xwar û min berê xwe da behrê. Wexta ez gihîştim cihê sobekariyê min dît ku gelek mirov êdî berev bûye, hinekan xwe li behrê dixistin, hinekan jî xwe li ber tavê dileqandin, hinekan jî li ber siyê bi kart dileyistin, hinekan pirtûk û rojname dixwendin, her yek bi tiştêkî ve mijûl bûn. Stûyê min bi aliyê senatoriya general de xwar bû, ka ew qîz kengî dikeve avê. Dûrve evqas jî hêsa nîn bû ku meriv bê naskirinê, di nava avê de naskirin zehmet bû. Min xwe weke duhî li avê xist û ajne kir, çûme cihê ku em rastî hev hatûbûn. Min didît ku ji wî alî kesin dihatin, lê gava ew nêzikî min dibûn, min didît ku ne ew e. Herçî diçû ez bêsebir dibûm, ji aliyekî diçûme aliyê dinê. Xulesa çi serê we biêşînim, min dît ku jineke ewa ajnê dike û di nîva behrê de kûr diçe. Gava wê rênêzikahiya min kir, min ew nas kir. Di nava avê de wisa dilkê min dikuta, bawer bikin min deng dibihîst. Ez ji xwe re hênî bûn: "Gelo ewê min nas bike, ku ez xortê duhî me, hêviya wê sekinî me, dixwazim gilîkî jê re bêjim".

Wexta wê nêzikahî li min kir, li min nihêrî, keniya û dîsa bayê xwe de çû. Min dixwest tiştêk bigota, wekî çima hun tenê melevanî dikin, hûn natirsin, wekî evqas dûr diçin, lê zimanê min negeriya heta ku

min hinekî xwe berhevî ser hevdu kir, ew êdî gele ji min dûr ket. Wekî min cesaret nekir jê re tiştêkî bêjim, îlahî, wextê ew keniya, êdî ji şerma xwe ez nesekinim, heta ew vegeriya, ez ji behrê derketim û ber bi hevalê xwe çûm. Heval jî texmîn kir, wekî ez hinekî xemadan im, xwestin pê bihesin maneya mada min çiyê, lê min ji wan re negot.

Wê şevê ez hê bêtir bêsebir bûm, bawer ke heta sibe hî ez deh caran şiyar bûm. Min xwe gunehkar dikir, paşê diliminî dida ber dilê xwe: "Xwe meydanê gura nexwariye, wekî ez mêrekî zor im, ez ê sibê bêjimê", min di dilê xwe got. Xulesa min ew şev jî bi xêr û xweşî rohnî kir, mîna her roj çûme werzandina kultur-fizîkê. Min parî sport kir, kincên xwe yên ajnê hildan û ber bi cihê xwe yê hizkirî çûn. Keviya behrê tijî kes bûn, lê min tirê kes nîne, bo ku hertim ew keçik li ber çavên min bû. Heta min cilên xwe êxistin ketime avê, min dît ji wî alî ve dîsa jinek bi tenê kete avê. Min êdî zeman winda nekir, ketim avê û ber bi wî alî ve liviyam. Wexta wê rênêzikayî li min kir, wê jî ez nas kirim û bire misletê wekî ez li hêviya wê me, îcar hûn beşereke xweş hat silav da min. Min silava wê ragirt, dixwest tiştêk jê re bigota, lê dîsa dilê min zû-zû lêxist, zimanê min giran bû û deng ji min demeket. Çawa di hate kifşê wê halê min texmîn kir û wê bi xwe got: "De bilive, çiyê tu newêrî ji kevîya behrê bi dûr bikevî? Bilive, ez bi te re me, metirse".

Paşî vê yekê çawa tu ji kî teng derê yî, zimanê min vebû, min metirsî bû û em li rex hev kûriya behrê çûn, çûn gihîştine ala sor. Ew ser milê xwe re vegeriya, li

min nihêrî û got:- Îzina me heta vira heye, kî ji vê alayê derbas be sûc dibe, qedexe ye, li vir ha de mirov dikare bixeniqe.

Min êdî tu qezî negot û em vegeyriyan. Em êdî mîna nasên kevin di kêleka hev de diçûn, min jî cehd dikir wisa baş sovekarîyê bikim, wekî ew kêmasiyekê ji min re nebîne, lê milên min zû diwestiyan.

Rast e, ez diçûm, lê nêt-merama min ew bû, wekî derheqa wê de pê bihesim, ka ew kî ye, ji kîderê ye, kengê hatiye, wê kengî here, bi mêt e an azep e? Wê jî texmîn kir wekî ez dixwazim tişteki jê re bêjim. Wê serê xwe ji avê bilind kir û nêzî min bû. Min jê pirsî:

- Hûn zû ve li vir in?
- Eva çend roj e, wê bersiv da.
- Lê hûn kengû hatine? îcar wê pirsî.
- Ez jî eva çend roj in hatîne.
- Bibexşîne hûn ji kî derê hatine?
- Ez ji Ermenîstanê hatime, lê hûn çima tenê dikevîne avê? min jê pirsî.

Ew kenîya û got:

- Lê tev kê bikevimê, bavê min mezin e, îzna wî tune evqas dûr here.

Hema derdê min jî ew bû, pê bihesim, cêqa gelo ew li vir bi tenê ye. Em bi pirs û pirsyaran gihîştin cihê ku em ê ji hev biqetin. Ewê dem û xatirê xwe ji min xwest û ber bi senatoriya xwe çû. Wexta ew hinekî ji min dûr ket, dîsa ser milê xwe zîvirî, destê xwe careke dinê min re hejand û çû.

Sibetirê em dîsa wê saetê rastî hevdu hatin, vê carê êdî çawa mirovê nas in. Me silava şîrîn pev guhastin, destê xwe da hev.

Çiqas diçû ew li ber çavên min hîn û hîn bedewtir dibû, lê îro ew hê bedewtir

bû. Min zehf kûr lê nihêrî wekî kêmasiyekê lê bibînim, lê tunebû. Meriv zehd dikir wênevanekî ew bi pênûs û firça xwe dilda nitirandiye. Ewê dîsa notla her ro da pêşiyê, pêl qelaştin û ber bi ala liviya, ew wisa bi lez diçû, wekî min pê re nedigihand, lewra min evqas jî sovedarî nedizanî. Wextê ez paş diketim, ewê dizîvirî li min dinihêrî, hinekî disekinî, heta ez diçûm digihîştimê. Ewê dît ez hinekî zehmet dikşînim, êdî pêş de neçû, vegeyriya û ji min re got:

- Îro evqas bes e, em vegeyin.

Ez jî pê re razî bûm, em dîsa ber bi keviyê vegeyriyan, him ez razî bûm ku em vegeyriyan, him jî heyfa min hat, wekî em zû ji hev biqetin. Ein bi xeberdana şîrîn gihîştine cihê xwe yê berê, me careke dinê jî bi kinêzayî li hev nihêrî. Wê bi destê xwe yê mornorkî hinek av reşande ser çavên min, xatirê xwe ji min xwest û çû. Wextê wê av reşande min, êdî per û baskê min tunebû ez bifiriyama, min tirê ewê bi destê xwe ava avliheyatî ser çavê min reşand. Ew deh roj bû, em rastî hev dihatin, em wisa hînî hev bûbûn, wekî me bawer nedikir, ku em ê ji hev biqetin. Gava em diketine behrê, her kê xelk çend deqîqan tê de diman, lê ein bi saetan diman, me henek dikirin, av direşandin hev, tê de top dileyist.

Tu cara ji bîra min naçe wexta min cara pêşîn ew ramûsa. Hela ta niha jî ew di bîra min de ye. Lê ez ser tişteki ecêb mabûm, wextê min ew teklîfî sînemayê dikir, yanê ji nav bajêr bigerin ew wê rojê manî didît û nedihat. Ez bona vê yekê gelekî diketime nîva mitala, min rû dikir dipîva dîsa tu serederî jê dernedixist, ew çima qayil nabe, bi min re bê nav bajêr.

Herge hezkiriyê heye, lê çima li ser min bengî bûye. Îcar eva yeka ji min re bûbû qisawat. Rojekê wextê ez di ber deriyê senatoriya wan de derbas dibûm, min dît ku ew bi tenê li ser kursiyekê rûniştiye, ez wextê çav pê ketim gelekî şa bûm û min di dilê xwe de got: "Min tu girtî, êdî tu ji destên min xelas nabî, hergê xatir be ya şer ez ê te bibiine sînemayê, an jî em ê qasekî nava bajêr de seyran kin. Lê wextê wê ez dîtûm soro-moro bû, madê xwe tehl kir û serê xwe kire ber xwe û nexwest rûçikê min jî bibîne. Gava wê wisa ez qebûl kirim, êdî ez nêzîkî wê nebûm, min jî serê xwe kire ber xwe û jê derbas bûm. Pêy vê ez hatime ser vê fikrê wekî yarê wê heye, ger na wê ez çima wisa qebûl kirima û qet silav jî neda min.

Ez hebekî ji wê dûr ketim, lê dil û dîna min ber hev neda, ez dîsa vegeyriyam, min xwe da taldekî û lê nihêrî, cê ka ewê rastî kê bê û wê kuda herin. Ez ji kerba dikira bibeeciyana, gelo ewê wisa hej ji min fikir, îro çima ez wisa bê qedir kirim. Min biryar da wekî wextê ew bi yekî re çû ez ê jê re gazî kim, du qezîya wê re bêjim û jê bi dûr kevim. Paşî çend deqîqe min dîna xwe dayê ew melûl rabû û ber bi senatoriyê çû. Di çûyinê de li ser alîkî dilicimî. Gunê kafira pê dihat, meriv digot: wê niha li ser alîkî bikeve. Gava min ew di wî half de dît, hêsir ji çavên min hatin xwarê û temamiya şevê ew ji ber çavên min neçû...

Sibetirê ez dîsa çûme ber behrê, hêvî bûn ew ê dîsa dûr ve destê xwe ji min re bihejîne û ber bi min ve were, lê ew nehat.

Wergera ji tîpên kirîlîkî: D. ÎZOLÎ

AGAHDARIYEK JI BO XWENDEVAN Û NIVÎSKARÊN NÛDEMÊ

Nûdem Kurdistanîbûna xwe didomîne. Ev jî tê wê maneyê ku rûpelên Nûdemê ji her kurdî re vekirî ne. Nûdem li îdeolojî, li herêm, li temen û navan nanihêre, ew tenê nivîsan hildibijêre; nivîsên edebî, hunerî, çandî û ji her celeb dijminatîya kes û rêkxistinan dûr... Herweha Nûdem dixwaze nivîsên ku jê re têne şandin orjînal bin, li cihekî din nehatibin çapkirin, an jî di eynî demê de ji kovar û rojnamene din re nehatibin şandin. Ji bo hêsanîkirina karê Nûdemê, nivîsên ku têne şandin ger bi Komputer hatibin nivîsandin, bi dîsketê bêne şandin baş e; em Macintosh û programên RSG, Mac Write, Q. Expres, Ms Word, Word Perfect û Desing Studio bi kar tînin. Ger îmkanên komputer tunebin, ji kerema xwe re bi deklûlo binivîsin. Lê ji bîr mekin, ji bo ku Nûdem bikaribe bijî, ew hewcedarî piştgirî û alîkariya we ye. Piştgirî û alîkariya we jî abonetiya wê ye. Ger hûn bi xwe abone bin, hevalekî/hevaleke xwe û pirtûkxaneya (biblioteka) belediya xwe jî bikin abone...

SED Û DU NIVÎSKARÊN KURD



Zeynelabidîn ZINAR

Her ku rojek bi ser me ve dibihure, çewa ku li pey xwe ji me re şîn û şewateyên mexof ên dûkelî dihêle, ji aliyekî ve jî çavkanî û jêderên hêja jî bi xwe re diafûrîne. Îcar her yek ji wan jêder û çavkaniyan, bo Kurd û Kurdistanê dibin mîna qoçan û belge, em tev pê serfiraz û şerefînaz dibin.

Bêguman e ku xebat û tevgera neteway-eûtî pirtexlît e û gelek jî rêreng e. Lewra gava ku yek xwîna xwe dirêje, yekî din malê xwe dirêje û yek ji Xwedê perestîniyên çak dike... Eger yek rêsvivikiyê bike, yek lêkolînan dike û dinivîse. Yek jî

li mala xwe rûniştîye û têkilê tişteki nabe, yek jî li ba dijmin cihê xwe yê rezalefî vegirtiye û berê xwe daye xwîna xwe... Lê eger rewş çî be, tewr û aman çî dibin, tevdir û livak çewan bibin, çaxê erda hişk bi avê nerm dibe, rehên nîvmirî yên di binê axê de jî her bi awayê zagona xwezayê nerm dibin û bi tûjîtî serê xwe radikin. Îcar bi wê rakirinê jî, ew vê dinyaya ku hewqas devera kirêfî û siqûmatên xirab e, dugulherînine rengêkî din û dikin devera xweşî, biraî û ya geşt û seyranên ziman û çandên pirtexlît.

Bê guman, xebat û suxreya neviyên Şêx Mehmûdan, Şêx Seîdan, Qazî Mihemedan, Mistefa Berzaniyan, Seyid Rizayê pîrê pîran û bi sedan yên wisa, kevirên bihnbarûd û axa jehrîdar dikin gul û gulistaneke şên, piştê jî bilbilên bengî yên canik bera navê didin. Ha ewçax eger mirov li giyana wan pak û rindan binere, ku di binê axa sar de dest bi govenda çand û toreya dewlemend kirine û qor bi qor li hevûdu lefîyane; ji aliyekî ve ew mizgînî didin hevûdu û ji aliyekî ve jî hev pîroz dikin. Xaziyên birîndar jî, bi wî dengî re xweş û leşsax dibin û ji bo daketina nêv qora govendê amade dibin.

Yek ji wê suxreya bêbilha, di roja yazdehên Hezûrana 1994-an de bû, ku mamoste Sebrî Botanî, bo min hejinarek ji Rojnameya Botanê, ji kek Mehîûz Mayî stendiye û ku tê de navên 102 helbestvan û nivîskarên Kurd hatiye nivîsandin. Ew liste bi lêkolînekê ji aliyê kekê hêja Ebdurehîm Mizûrî ve hatibû amadekirin. Wî ew nav nivîsandine û bi kurtî hin agahdarî jî di layê bîst û sê kesan de daye.

Ew liste digel kurtenivîsekê, bi sernavê Pêne û Êk Şa'îrên Kurd, herweha bi devoka Behdînan, hatiye nivîsandin. Lê min nivîsê hinekî rengdêrê kurmanciya jorîn kir, da xwendevanên me rind têbigihin û navên van bab û bapîrên xwe

di ferhengoka mejiyên xemgîn de şêntir bikin.

Rojnameya Botanê, li Başûrê Kurdistanê dihate weşandin. Bi zaravayê kurmançî -devoka Behdînan- û bi tûpên erebî bû. Lê niha ew rawestiyaye. Lîsteya navên wan helbestvan û nivîskarên hêja jî yên ku bi kurmançî berhem afirandine, di hejînara wê ya Heştan, Sibata 1992-an, rûpelê çaran de, cih girtiye.

Lêkologê hêja kek Mizûrî, dest bi nivîsa xwe kiriye û ev gotine:

Helbestvanê gorbihîşt Memdûh Birîfkanî, di salên heftiyên (70) de, bi umîda lêkolîn û berhevkirina bo çapkirinê, navên pêncî û yek (51) helbestvanên Kurd di lîsteyekê de nivîsibûn. Lê mixabin berî ku ew bigîje umîda xwe, dasika felekê nêrgiza jîna wî qurmîçandiye.

Me, navên hinek helbestvan û nivîskarên ku di wê lîsteyê de hatine nivîsandin nebihîztibû, ne jî berhemên wan dîtibû.

Mizûrî li demepêşa jiyânê sêwiriye û xameya xwe bi vî rengî hejandiye:

Bêguman ev roj wê belavkirina navên wan alîkariyeke zêdetir bi nivîskar û vekolerên vêjeyî re neke. Lê parastina navên wan, parastina hinek jî dîroka vêjeyî ya kurdî ye û parastina kelepurê pîrbihayî ya wê ye.

Yek ji wan torevanên ku sûd û mefa ji vê lîsteyê dîtine û dest pê ve dirêj kirine, Seydayê rehnetî Sadiq Behaedînê Amêdî ye. Birastî min li ba Seyda Amêdî (ev lîste-nm) nedîtiye. Lê xwezî min dîtibûna, da min herdu hevberî hevdu bikirina û ji xwendevanan re bişeyandina.

Û behsa jêdera wê lîsteya giranbiha kiriye:

Ev lîsteya ku em ê niha belav bikin, Seydayê hêja Mes'ûd kurê Mêjûvanê nemir Mihemed Seidê Birîfkanî yê xwediyê

(pirtûka-nm) Fudelau Badînan (Qencên Behdîna), sala 1980 yî ji ber deftereka gorbihîşt Memdûh Birîfkanî veguhaztiye. Îcar çewa herdu hêjayan (Birîfkanî û Mes'ûd) nivîsîne, em ê jî wisan û bi wê rêzkerinê belav bikin û li gorî beruminên xwe, ji lîsteyê re ferûz û dehmen jî binivîsin.

Bi tevayî ew pêncî û yek navên helbestvan û nivîskarên ku di lîsteyê de ne, bi kurmançiya jorîn vehandine û berhemên wan li cem Birîfkanî hebûne.

Mizûrî bi umîdwarî berê xwe daye felekê, bi çengan xwîdana xwe rijandiye ser kêxiz û gotiye:

Ez ji Xwedê hêvî dikim ku ew dê rojek ji rojan ruhniyê maçî bikin.

Me jî, bo wergirtina lişt û mefaya zêdetir, navên pêncî û yek helbestvanên din, li van 51 navên di lîsteyê de zêde kirine.

Bi vê xebata wî, di lîsteyê de navên nivîskar û helbestvanên ku bi kurmançî berhem afirandine, gihaye jimara 102-an û piştê gotiye:

Evên zêdekirî yan berhemên wan li cem me hene û me ew dîtine, yan jî jêder û serokaniya navên wan...

Nivîskarê hêja Mizûrî, ew nav ji reqema yekê hetanî ya 102-an, rêz kirine. Herweha ew agahdariyên jêderan jî ku nivîsîne, li paşîya navan bi reqen, ji yekê hetanî 23-an nivîsîne. Hinek nav hene ku çavkaniya wan yek e û li ber çend navên wisa eynî reqem nivîsandiye. Herweha berê xwe daye hemwelatîyên xwe û gotiye: "Fermo, ev e lîsteya helbestvanên Kurd ji we ra:

- 1- Ehmedê Xanî.
- 2- Ehmedê Cizîrî.
- 3- Feqiyê Teyran.
- 4- Melayê Bateyî.
- 5- Bekir Begê Erzî.
- 6- Eliyê Amêdî (Elî el Emadî).
- 7- Şêx Nûredînê Birîfkanî.

8- Şêx Şemsedîn Qutb.

9- Memdûh Birîfkanî, muleqebê bi Xelatê.

10- Remezan Axa Cizîrî.

11- Laxerê Cizîrî.

12- Şêx Ebduselamê Cizîrî.

13- Şêx Ebdurehmanê Axtepî.

14- Siyapoş.

15- Sa î.

16- Cegerxwîn.

17- Şiblî Sindî.

18- Emadedînê Hekarî, Hakimê Hekarî (1).

19- Sebûrî, Hakimê Hekarî.

20- Şêx Tahîrê Şûşî.

21- Şêx Ehmedê Hilî yê Rimanî.

22- Xalid Axayê Bisrî.

23- Mihemed Axayê Bisrî.

24- Xalid Axayê Zîbarî.

25- Mele Xelîlê Sêrtî.

26- Mele Ebdulkerîmê Banî.

27- Mihemed Emînê Hilalî (Goyan).

28- Macid.

29- Hicrî.

30- Elî Herûrî.

31- Mêzer Rast.

32- Mistefa Beg (2).

33- Taha (3).

34- Heme Kûr (4).

35- Xakî.

36- Huznî (5).

37- Mihrî (6).

38- Husnî (7).

39- Feqe Ehmed Rusî (El Muxliss).

40- Ebdulqadir Kuvlî.

41- Ebdulqadir Beg Guş -Feqî Sirayî-, (Dibe Goş yan jî Gûş e- nm)

42- Mele Mehmûdê Hoserî.

43- Şêx Qedriyê Cezerî.

44- Şêx Nûr Mihemed (8).

45- Xerîb (9).

46- Sadiq.

47- Murad Xanê Bayezîdî.

48- Xan Ebdalê Cezerî.

49- Miskîn.

50- Seyfiyê Hekarî.

51- Newres (10).

52- Axa Şewkiyê Bêdarî.

53- Ehmedê Mirzayê, Wanî (11).

54- Ehmedê Katib (12).

55- Enwerê Mayî.

56- Îsmail Bayezîdî (13).

57- Bihnarî (14).

58- Celadet Bedirxan.

59- Halet Efendî (15).

60- Hamidê Mayî.

61- Hesenê Bamernî (16).

62- Hesenê Kewaşî (17).

63- Huseynî (18).

64- Hemîdî (14).

65- Xalidê Sêrtî (11).

66- Xeyat (18).

67- Derdî (18).

68- Remezanê Bedlîsî.

69- Sewdaî (18).

70- Sewadî (19).

71- Seyid Eliyê Findikî.

72- Seyfî (20).

73- Selûnî (11).

74- Sûriyê (yan Sewriyê-nm) Xanima Diy- arbekrî (11).

75- Sariya Mistefa Doskî.

76- Şerefxanê Hekarî (13).

77- Şewket (21).

78- Şêx Salihê Êtûfî.

79- Şehabê Hekarî.

80- Tahîrê Re' dî yê Amêdî.

81- Teyfiyê Hekarî.

82- Ebdurehîm Rehmîyê Hekarî.

83- Ubeydulahê Birîfkî.

84- Xerîbî (22).

85- Ebdurehîm Şewqî.

86- Xiyasedînê Neqşebendî.

87- Feqî Reşîdê Şalekî.

88- Fethulahê Sêrtî (11).

89- Kamîran Bedirxan.

90- Macin.

91- Mensûrê Girgaşî.

92- Mihemedê Zêbarî.

93- Mihemedê Mexribî.

94- Mihemed Hezînê Xalidî (11).

95- Mihemed Seîdê Birîfkî.

96- Mihemed Sedîqê Şernexî.

97- Mistefayê Bitarî.

98- Mihrebana Berwarî.

99- Mîna (23).

- 100- Nadirê Kanîsarkî.
 101- Necmedînê Bamernî.
 102- Nesîmî (18)."

"Jêder û dehmen:

(1)- Birîfkî li Ferûzê nivîsiye: El meqsûd mîn-el Einîr Emadedîn, huwe emîr-ul kebîr Emadedîn el Hekarî, ellezî kane hukemau îla saenetî 1049 hicrî/ 1639 mîladî. We huwe leyse mîn-el umera-ul Cizîretî.

(Birîfkî di Ferûzê de nivîsiye ku amac ji Mîr Emadedîn, ew Mîrê Mezin ê Hekarî ye, ku hetanî sala 1049-ê Mişextiyê/ 1639-ê Zayîne dadmendî. Ew ne ji mîrekên Cizîrê ye-nm)

(2)- Mistefa Begê Hekarî, nasnavê wî "Petro" (Pertew-Pertewî-nm) ye.

(3)- Du hozanvan hene bi navê "Taha": a) Tahayê Birîfkî, b) Şêx Taha kurê Ebdurehman Mayî, bapîrê hozanvan Şêx Taha Mezher Mayî.

(4)- Hemikê Tovî ye.

(5)- Du hozanvan bi nasnavê "Huznî" hene, a) Ehmed Tahir, kurê Şêx Mistefayê Birîfkî, b) Ebdurehman Nêrweyî, hozanvanê Smahîl (Îsmahîl-nm) Paşa yê duwî (duyemîn-nm).

(6)- Navê wî "Mihemed Seîd" e, neviyê Mele Yehyayê Mizûrî ye.

(7)- Husniyê Bamernî, kurê Mele Ehmedê Banekî ye.

(8)- Nûr Mihemed kurê Şêx Abdulqadirê Birîfkî ye.

(9)- Ne dûr e ku hozanvan Mihemed Xerîb Şûşî bit.

(10)- Ne dûr e ku Şêx Seîdê Newresî bit.

(11)- Elaedin Sicadî/ Mêjûyî Edebî Kurdî/ berper: 588, 606, 607, "Selîmî" = Selîmê kurê Silêman ê xwediyê (pirtûka-nm) Yûsuf û Zuleyxa ye.

(12)- Katîbê Qubad Beg ê Mîrê Amêdiyê.

(13)- Eliksader Jaba/ Camîê Rîsaleyan û Hikayetan Bi Zimanê Kurmancî/ berper: 12.

(14)- Dr. Mes'ûd Kitanî/ Hêştê Hozanvanê Kurd/ Rojname Bizav/ hejmar: 33.

(15)- "Halet" nasnavê hozanvan Xalid Axa yê Serênî ye.

(16)- Kurê Mele Ehmed Babek e. Enwer el

Mayî/ El Ekradu Fî Badînan/ berper: 212.

(17)- Dr. Me'ûf Xiznedar/ Mextûtataf Ferîde./ berper: 17-19.

(18)- Ebdureqîb Yûsuf/ Kovar: Rewşenbîrî Nûyî/ hijmar: 119.

(19)- Sewdayî, nasnavê hozanvan Harisê Bedlîsî ye, xwediyê (pirtûka-nm) Leyl û Mecnûnê.

(20)- Seyfî, nasnavê Şêx Ebduletîfê Şûşî ye. Hezretî Şûşî/ (kovara-nm) Kerwan, hejmar: 75.

(21)- Sadiq Behaedînê Amêdî, Hozanvanê Kurd, berper: 12. (Hinek şaşî di vê çavkaniyê de heye. Lewra di vê nusxa li cem min a pirtûka Hozanvanên Kurd de rûpela 12-an tune-nm).

(22)- Xerîbî, nasnavê hozanê Mihemed Teyar Paşa ye.

(23)- Ebdureqîb Yûsuf/ Dîwana Kurmancî/ berper: 4."

Belam çewa ku piraniya xwendevanan pê dizanin, di pirtûka min a bi navê Nimûne Ji Gencîneya Çanda Qedexekirî de, navên not (90) helbestvan û nivîskarên Kurd ên ku bi kurmancî berhem afirandine cih girtine. Lê şêş ji wan bi zaravayê diinîlî (zazakî) nivîsîne. Herweha tê de çend berhem jî hene ku min xwediyê wan tesbît nekiriye.

Ew sed û du (102) navên ku di Rojnameya Botanê de hatine weşandin, digel van not (90) navên ku di Nimûne Ji Gencîneya Çanda Qedexekirî de hene, dikin 192. Lê hinek ji wan navan çewa ku di Nimûne... de hene, di Rojnameya Botanê de jî hene.

Îcar min ev herdu çavkanî, bi umîda dê ji kurdolog û lêkologan re bibin afîkar ji NÛDEMÊ re nivîsîn. Hem jî ez ê di pêşerojê de li ser van navan bişixulim û bi umîda berfirehkirina vê xebatê jî nîfşên nûhatî re ku dê bibe mîna sifreyeke hazir...

BI ALAV ALATLÎ RE JI HER ALÎ VE

Abdullah KESKÎN

"Gotin rûmet e"

"Vîva Muerto (Bijî Mirin)", romana Alev Alatlî ya ku di sala 1992'an de bi sernavê "Kes li Wir Heye?" dest bi weşanê kiriye, cildê vê romanê yê yekemîn e. Wexta mirov kitêbê digire destê xwe di rûpelên pêş de rastî nivîskarek û romaneke cihê dibe. Roman wiha destpêdike: Cenazeyê şaîr rojêke ku baran dibare piştî nimêja nîvro wê ji mizgefta Şişliyê rabe. Koma ronakbûran hewşa mizgeftê dagirtine. "Ev çend sal in wek gala û faalîyetên hunerî" dibe serkesa romanê Gunay Rodoplu; "cenazan jî misyoneke zêdetir; yekîtiya xwe ya îdeolojîk ji hev re teyid, ji 'ên din' re jî îlan, tûnin cih." Cenaze bi tenê ne yê şaîrekî ye, cenaze bi tevayî, cenazeyê "ronakbîrên Tirkîyê ye. "Ronakbîr"ê ji dinyayê bêxeber, ji civaka lê dijî û ji xwe re biyanî... Alatlî di romana xwe de bi taybetî dîroka Tirkîyê ya nêzik, bûyer û fenomenên van 20-30 salên dawî di ber çav re derbas dike û dinirxîne. Ma kî nîne di vê romanê de: Ji misilmanên profesyonel ta bi ronakbîrên xas-pispor yê sistêmê, ji Cemîl Meriç ta

bi Abdullah Öcalan, malbata Purîten û Yahudî Pavloviçan, Malbata Örenan ku ji Mêrdînê ji ber dijminê xwe bazdane hatine Stenbolê, ji reyisê belediyê yê sosyal demokrat Şafak Özden ta bi Serokê Înstîtuya Kurd ya Parisê Kendal Nezan... yelpazeyê gelekî fireh di romanê de cihê xwe digire. Li ser van şexsiyetên ji dil ku ji jiyana rojane koçî romanê kirine disekine, bilindbûn û nimzêbûna wan, evîn û kederên wan bi tevayî tecrubeyên wan ê jiyana berbiçav dixê. "Kes Li Wir Heye?", herkesî dawetî cidîyetê dike. Pirsgirêka Alatlî Ji bi peyvan re ye. û "Kalam bi tevayî heysiyet e." Alatlî, berî her tiştî xwediyê gotinan dawetî heysiyetê dike. Herkes divê li gotinên xwe xwedî derkevin. Di sohbeta me û Alev Alatlî de carinan gotinên Gunay Rodoplu ku di nav rêzan de winda bûne, nutukên wê yên îtalîk; carbîcaran jî em bi Rodoplu re bûne yek û me berê xwe da Alatlî, ji dijîyatiya rojhilat û rojava ta bi usluba wê ya "welatparêz" û xelata ku ji TYB'ê standiye- me fikr û tawrên wê muhasebe kirin.

EZ JI ÎNSANÊN JI DIL BI RÊ KETIM

- *Di romana we ya bi navê "Kes Li Wir Heye?" de li ser dîroka Tirkîyê ya nêzik tê sekinandin; gelek fenomen û bûyerên felsefî, dîrokî û civakî tîn munaqesekirin. Mirov tê de rastî politikvanan ta bi "ronakbîr"an û gelek sîmayên nasyar dibe. Herhal di serê romanê de qeydeke wiha nedihata danîn: Tu tîkiliya kes û bûyerên di vê kitêbê de, bi kes û bûyerên di jiyana de tune ye.*

- Helbet, qeydeke wisa nedihata danîn.

Plana pêşî ya romana min civaka dema 1970 û '90' î ye. Her wiha referansên min jî insanên wî çaxî ne. Tiştê ku ez dikim ne tişteki orijînal e. Dostoyevskî jî ji însanên jidil bi rê diket. Wî nav nedida, lê min da. Lewre min nedixwest tu aliyekî muxlak di reaksiyonên Rodoplu de bimîne.

- *Xwendevanên we di navbera Gunay Rodoplu û Alev Alatlî de wekhevîyekê dibînin. Di axaftinên me yên berê de fikreke wiha bi min re jî çêbû. Hûn çî dibêjin; hûn xwe, jiyana xwe dinivîsînin gelo?*

- Di dawiyê de her romannivîs "xwe" dinivîse. Ger em bîna pîrsa, «Gunay Rodoplu Alev Alatlî ye?», Mehmet çiqas Alev Alatlî be, Rodoplu jî ewqas Alev Alatlî ye. Wek Elenî Naciye ya di "Yasemîn hê jî geş in?" (Yasaminler Tüter mi Hâlâ?) de Alev Alatlî ye, an jî bi qasî îşkenceciyê di "îşkenceci" de Alev Alatlî ye. Li gor fikra min romannivîsek çiqas karibe karakterên xwe li gor yê "jidiî" ava bike ewqas çêtir romannivîs e. Bi rastî di vî warî de ez xwe serkeftî dibînim. Lê dîsa jî bi awayekî vekirî bibêjim: Piştî xwendina romanê hûnê bibînin ku Rodoplu "Tirkiye" bi xwe ye. Romana "Kes Li Wir Heye" di nav çar parên romanê de bi uslûbeke "flash back" hatiye nivîsîn. Dilketiyê jinikê yê yekem ûlkücüyek e; ev rewşa Tirkiyê ya dema netewebûnê dide berçav. Dû re Şîran û Mehmet tîn; ew jî rewşa 70'yan, paşî jî bi sosyal demokratî re flort dest pê dike, yanî bi Şafak Özden re. Tabî di vê navê de sergêjahiya me ya mezin: Rojava. Teza vê romanê xwe mahkûmkirina "Muerte" ye

ku wek Rodoplu tu tiştî hîn nebû û bi xwexapandinek û dilgermiyeke mezin her got "Vîva" û her tîm "Vîva."

HEMBERIYA KAFKA

- *Li gor we roman kare bibe çavkanî ji lêkolînên "zanistî" re? Lewre di kitêbên we de mirov gelek caran ji her warî rastî doneyan dibe û dibê qey mirov kitêbeke lêkolîni ya sosyolojîk, metnek felsefî an jî dîrokî dixwîne. Herwiha bi van gotinan naxwazim aliyê romanên we yên hunerî û taybetmendiyên edebî ji ber çav bidim alî.*

- Li gor min, erê, romanek kare bibe çavkanî ji lêkolînên zanistî re. Lê bi tenê ne "erê" jî. Ger meseleyeke we ya klasîkbûnê hebe, divê baş xemilandî be ku karibe bibe jêder. Li aliyê din jî bi min divê tu ilmên civakî tenê ji civaknasan re neyên hiştin. Eynî tişt em karin ji bo ilmên fennî jî bibêjin. Jixwe eslê "edebiyata" ku ji "edeb"ê tê û yê "lîteratura" jî ev e. Binêrin, herçiqas bi xweecibandîne bême sîcdarkirin jî, ez dixwazim bibim şahidê çaxê xwe û di veguhertina çaxê de dixwazim bibim xwedîpar. Bi awayekî din ez dixwazim di nivîskariyê de pîr bilind bibim. Min divê ez bibim hemberê *Sartre, Kafka, Gorkî û Ghiorgiu* û hwd... Baş e?

- *Hûn di romana xwe de ji gelek kitêban rasto rast tiştina digirin. Wek Edward Said, Rafet Ballî, Ahmet Hamdi Dinler û hwd... Ev nedibû kitêbeke lêkolîn û lêgerînê, çima we roman bijart?*

- Ez dibêjim qey min bersiva vê pîrsa we berî niha dabû. Dixwazî bi vî awayî bifikire: Hûn dikarin *Şîran Ören*'ê min,

tevî eş, bêrî, şahî û kêmasiyên wî, *Şîranê* min di kûdera kitêba *Rafet* de bi cih bikin? *Rafet* wê "*çi bûye*" binivîse, ezê "*Tiştê bûyî ji ber çi bûye*" binivîsim. Ewê doneyan bîne, ezê şîrove bikim. Mesela "*Pênc Parçevan-Beş Parçacîlar*" ên wî rêxistinek in, di semayê de cihê xwe digirin; li aliyê din "*Pênc Parçevan*" ên min jî komek xort in. Nizanim tê fêmkirin? Ji bo min ji qewimandina tiştêkî bêhtir sedemên qewimandina wê muhîm in. Bersiva bi vî awayê nêrînê jî incax roman dibe. Bi serê xwe dîrok têr nake, bi vî awayî bi serê xwe polîtîka jî ne bes e. Psîkolojî, sosyolojî, felsefe, estetîk, huner, îklîm û hwd her şaxê ku destê nivîskar bigihîje divê têxe navê.

- *Mirov mecbûr dimîne gelek peyv û mefûman wek axaftinên îtalîk yên Rodoplu di nav neynûkê de bi cih bike. Lewre di her warî de tevliheviyeke mefûman heye. Qey em ê li hêviya Konfucyusên nû ku maneyan peyv û mefûman yên ji dil bidin wan bin? Em ê kengê û çawa ji dest "mefûmên ku her yek ji wan bûne orispî û xayin" xelas bibin?*

- Dema zanîna me bi entelektueliyeke dewlemend xemilî û ji aliyê entelektueliyê ve di tangekê de em gihîştin hev, wî çaxî em ê ji van xelas bibin. Heta wî wextî wek nexweşê hemberî hekim em bêçare ne. Wê hekim komek semptoin, komek termên tibbî bi rêz ke û em ê jî bi nezaniyê dermanê ku bide me bixwin û rûnin. Aciziya Rodoplu ne ji şîrovekirina nexweşiyê tenê tê. Jê pê de ew bêhtir ji vî yekê aciz e ku çima xwe mecbûr dibîne bi

wî awayî şîrove dike. Lê ev di tibbê de hêsantir e. Tu hekim gava dermanekî bidin, xwe mecbûr nabînin ku mudaxleyî formula wê bikin.

- *Ji bo Tirkiyê mirov dikare behsa "yekûtiya zanyariyê" bike? Hûn bi hêvî ne an na?*

- Li Tirkiye îro mirov ne dikare di warê pisporî û ne jî di ya tevahî de behsa yekûtiya zanyariyê bike. "*Zanyariya*" her warê civakî cihê ye. Tevî vî jî di nav sewiya zanîne de jî cihêû heye, ku nayê hesabkirin. Tabî ev ne tiştêkî ku nayê çareserkin e. Lê belê ku hê jî ne di rojevê de be mirovê li gor çî hêvî bike?

- *Gunay, bi mesafe nêzîkî îdeolojiyan dibe. Çi ferqa zanîneke bêarmanc û beredayî, ji komkirina agahdariyan heye?*

- Rast e. Rodoplu zû bi zû xwe nêzîkî îdeolojiyan nake. Wê bê bîra we jî, ku dibêje "*Bi rastî ev hemû jixvedest in (uydurma, ji ber xwe ve hatine gotin). Di vî dinya genî ya ku ji Sistema Rojê û Galaksiya Kadizan hatiye de, beşer ji bo demeke kurt di ber hev de dibuhurin. Dû re herkes bi riya xwe de diçe. Bi tenê, bi ser xwe.*" Pêşiyên me, di vî dinya ku beşer ji bo demeke kurt di ber hev re dibuhurin û ew dema ku em jê re dibêjin emr û pirr kurt de "*nexşeyek*" dane destê me. Di vî nexşeyê de behsa nasnameya me, statuya me, divê em çî bikin û ber bi çî ve herin, tê kirin. Em jî van bi vî awayî hîn dibin û qebûl dikin. Dû re jî em leqayî hin kesan dibin ku nexşeyên me û yên wan ne ji hev in. Vêca em dikevin serê nexşeya ka bê ya

kê ji me rasttir e. Binêrin, însan mecbûr e bi awayekî xwe û alema ku tevî wê dijî şîrove bike. *Eyvallah*. Ew baweriya ku di *Eyvallah* de dibêje "Ya rastirîn ez im" bêmesned e. Ev aliyekî wê. Aliyê din jî ber bi fêdeyê ve çûyîna tevahiya zanînê ye. Ber bi fêdeyê ve ango ber bi kêfxweşiya wî emrê biçûkî beşer ve. Lewre ji bo hemcinsên xwe ji vê -pê de jî em nikarin tişteki din bikin. Ha, ku ev jî nebe, ew tişt a em jê re dibêjin "zanyarî" vêca beredayî be jî, wax li minê!

ROJAVA:

CIVAKA SÎSTEMATÎZE

- *Ez dixwazim bizanibim li gor we Rojava-Rojhilat çiya . Ev herdu çand an jî herdu dinya bi çi awayî ji hev vediqetin?*

- Ku bi awayekî kurt em bêjin, Rojava civakeke hatî "sîstematîzekirin" e îro. Rojhilat ne wiha ye. Wekî berî niha jî me anî zimên; Rojava, çi di pisporî û çi jî di tevahiya de xwedî yekîtiya zanyariyê ye ku ev yek li cem me nîn e. Lê ev yekîti jî nexweşiyên xwe di xwe de dihewîne lewre muxalefeta eslî ji holê radike, "rastiyên" herkesî eynî ne. Di vî warî de mûtabaqateke asê heye. Nizanim tê fêmkirin an na? Lê li cem me tu dibê qey rewşeke tam berevajiyê vê heye: Rastiya her kesekî ji xwe bi xwe re ye. Ev jî kaosek bi xwe ye. Kîjanî biçibînî wî ji xwe re dibijêrî.

- *Hûn femînîstên Ereba rexne dikin ku çima li şûna Kitêba Muqedes berê xwe didin Qurana Kerîm. Dema behsa "Despotîzma Şerqê" dibe, hûn di cih de ji dîroka Rojava bi mînakên ji vê wêsfê bi*

pêştir bi rê dikevin. Dibe ku mirov mînakên zêdetir bike. Ev tewr rê li ber rexneyan nagire?

- Na, ev ne ku rê li ber rexnekirinê digire; dike ku rexnegir bi cidîyet haya xwe bidin xwe. Dîsa dibêjim li ber destpotên wan ên bêhempa - Peve di sedsala 20'an de- *Hîtler û Stalin* yên me pîrr masûm dimînin.

- *Hûn bi hesasiyeteke mezin xwedî li "yên ji me", "berhemên van axan" û "herêmi" derdikevin. Çi ferqa vê ji helwestê ew kesê ku dibêje; "Adet û toreya qebîla min di dinyayê de yên herî baş in" dimîne?*

- Ferq di vir de ye: Ez sedemên îdfayên xwe dikarim bi riya qiyasê şîrove bikim; zîlamê qebîlê nikare vî tiştî bike. Ew jî derî qebîla xwe tu qebîleyên din nas nake wiha diaxive, lê ez bela pîrr baş dinasim wiha diaxivim.

- *Bi bêhna sêvên kesk, catirî û darçînê Şafak Özden, Şîran, Nesîbe û Remezan bi hûn aliyên xwe yên lokal bala Gunay dikişînin. Ji xeynî Remezan ji van xisletên xwe nexweş bûn ji xwe wî jî gerîlatî tercîh kiriye. Hûn dibêjin "Şerê Tirkîyê, şerê navbera biyanîti û xwemayîtiyê ye." Hûn karin hinekî vê meşhûma "xwemayiyê" şîrove bikin? "Xwemayî" kî ye?*

-Xwemayî yê ku "wek ..." nake. Xwemayî ew kes e ku xwe înkâr nake.

- *Hûn qedir didin "xwemayîtiyê" û hûn*

di navbera xwe û Rojava de tu bendan ji nahonin. Çima ew kesên ku "ji malên xwe bi smokînan dertên û li Hilton û Dîvan piştî servîsên chateaubrian tên li malê bi kevçiyar girarê dixun" ji we re ecêb tî?

- Ne ku ji min re ecêb tî. Lê ez bi vê rewşa şizofrenîk diêşim; hew. Hûn vê rewşê wek mînakê ji mefhûma Marks ya li xwe biyanîbûnê nabînin? Wek karkerê ku di Kargeha Napalmê de bixebite, jiyana xwe ya xebatê û ya taybetî dûrî hev bibîne.

- *Gunay Rodoplu dibêje "Ez alîgirê hîlal li ser komunîzmeke hov diberiqê me." Hûn dikarin vê yekê bi awayekî vekirîtir şîrove bikin?*

- Wê bersiva min girêdayiyê pîrsa we ya berî vê be: Ev îfade bêfikirîna sentezekê ye: Li şûna ku mirov dijraberiya navendîseyên îlahî û dinyayî yê mirovatîyê bikole, mirov wan bîne rex hev. Wek ku Rodoplu dixwaze li ser nêrînen xwe yê zanahiyê mirov ji nû ve hûrtir bifikire, bi awayê ku tê gotin; "*Yên ne ateîst bin nabin sosyalîst jî.*" Ger Dr. Kivılcımlı bi bîra we bê, hûnê bibînin ku jînik qet jî ne orijînal e.

ÎNGİLİZ ÇIMA HINDIYAN NEKUJIN?

- *Hûn oryantâlîzmê wek Edward Said bi wesfa "mîlekî keşfê yê kolonyalîzmê" dinirxînin. Cemil Meriç di Jurnal'a xwe de pêwîstiya hin xebatên oryantâlîstan tîne ziman û dipirse: "Ajan em in an Rojavahî ne." Hûn berbavî van aliyên oryan-*

talîstan dikevin an na?

- Di vî warî de *Cemil Beg* hinekî mafdar dibînim. Bêşik ez hurmetdar im ji kedê re. Lê çawa ku her ked ne xêrxwaz be wisa ne bê armanc e jî. Endamê civakekê sistematîkbûyî incax kare civakên ku nehatine sistematîkkirin di nav sînorên sistematîkiya xwe de analiz bike, lê ev jî çewtî ye. Di destpêkê de bêşik ev însan ne bi armanca ajanbûnê bi rê diketin, lê encam vê yekê bi xwe re tîne. Tu dixwazî em vê derê hinekî zelal bikin: Mesela ger hûn kamîkazeyên Japonî ku di erê Dinyayê yê Duyemîn de li şûna jiyaneke bêrûmet biryara mirinê didin, li gor "*rastiyên*" xwe inazosîst an jî nenormal qebûl bikin, hûn nikarin di serê xwe de fikra ku divê ewên "*nenormal*" ji ser rûyê erdê neyên rakirin bihewînin. Dîsa wisa, *Marks* rabû got, Hindî bi îngilîzan naêşên ku ew wan dikujin. Çima? Lewre li gor dinya wî pîvanên dilêşiyê cihê ne û ew "*rast*" in! Ji ber vê jî bi hêsanî kare bibêje pîrsgirêka ku Îngilîz Hindiyan dikujin ne ew çend jî mezin e. Hûn rabin bibêjin Quran ji serî heta dawî bi tiştên dijraber û nayên fêmkirin dagirtiye, lê ku kesek rabe ji bo vê nakokiyê mirinê bide ber çavê xwe belkî hûn berbavî wî jî nekevin. Cihê ku ez *Meriç* mafdar dibînim em weke Rojavahiyar bibirrin nabin. Lê însaf, mesela *ibnî Xaldûn* ji xwe ne "*em*" bûn? Oryantalîstê Rojavahî dawî *ibnî Xaldûn* derbasî sistema xwe dike. Dema wiha dike ji aliyê entellektuelî ve hem dewlemend dibe hein jî rê nîşan dide. Xusûsa ku em tî de diertîlin, mesela em ji îslamê Terîqeta Qederîye û ji Felsefa Rojava mesela "*free-will*" di yek riyê de nikarin bifikirin. Her

tim em di xweparêziyê de ne. Lewre em bi xwe re nabînin serê xwe rakîn û binerîn bê ka çi diqewime. Li gor min ev rewş me nake ajan lê dike hevkar.

QANÛNA TU JI KU DERÊ DIZANÎ

- *Hûn têra xwe ronakbîran jî rexne dikin. Berî her tiştî dixwazim hûn bibim: Li gorî we "ronakbîr" kî ye?*

- Bi min ronakbîr ew kes e ku li ser rûyê erdê serpêhatiya beşer tevî têkiliya sedem û encamên wê ji xwe re kiribe bingeh û bêyî ku li reng, zimên, dîn û netewa kesî binêre bi awayekî giştî karibe li pirsgrêkan binêre. Herwiha çawa ku ronakbîr bêarmanc nebe wisa jî divê xwedî exlaqekî unîversal be.

- *Ji xeynî kategoriya "Zamparayên Meşrûtiyetê", "ronakbîrê sîstemê ye xas-pispor", "vakanivîsên derdora xwe" mirov dikare behsa kategoriyeke ronakbîrî bike?*

- Ronakbîrên ku Gunay Rodoplu wan bi zamparayên meşrûtiyetê, ronakbîrê sîsteme yê xas-pispor, vakanivîsê derdora xwe nav dike yê ku ji tarîfa ronakbîriyê dûr in. Li Tirkiyê iktîdara van kesan perdê dikişîne ser bûyeran, obskurantizim bi cih dixê. Di vê nuqteyê de ez û karaktera romana xwe wek hev difikirin. Lê ez vê jî bibêjim; di romaneke din de hûn dikarin rastî tarîfeke din jî bibin.

- *Wek qanûna «Te ji ku derê peyda kir?» ku qanûneke "Tu ji ku dizanî jî derkeve wê halê me çi be?"*

- Bi min wê gelekî baş be! Belkî em êdî derewên ji xwe mestir nekin.

- *"Kelam bi tevahî heysiyet e." Ku em li gor vê xebardane li dinyaya fikrî binêrin em ê leqayî çi werin?*

- *Facîa! Kaos! Ku kelam bêheysiyet be fikir ne mumkûn e! Ger hûn maneya peyvnan ji hevokê ta bi ya din biguherin, hûn ê çawa bibin xwedî fikreke honandî? Bi min şepirzetiya me ya fikrî ji vir tê.*

- *Di destpêkê de Cumhûriyeta Tirkiyê di gelek waran de "şoreş" pêk anî. Wek "Şoresa Şewqê", "Şoreşa Herfan" û hwd "Şoresa Zimen" jî. 60-70 sal bi şûn ve ku lê dinêrin hûn mudaxeleya dewletê ya li ser zimên çawa dibînin û dinirxînin?*

- Ez bersiva vê pirsê li vir nedim nabe? Lewre di kitêba "Nuke Turkiye" de min dûvdîrêj nivîsî, ez êdî aciz bûm.

ME KURDISTAN JI SERBAZÊN ÎNGÎLÎZAN BIHÎST

- *Hûn dibêjin "Kurdistanê, ne kurdan bi me da naskirin." Di notên romana Rodoplu de cih bi cih şûr û stranên kurdî hene. Hûn û kurd, kurdî we çawa hev nas kir?*

- *Wekî ku Mehmet jî dibêje, em û kurd dema me dest avête îdeolojiya xwe ya resmî em leqayî hev bûn. Min bi xwe jî li Karakoseya Erzeromê xwendîye. Lê ku digotin Kurd jî hin kesên ku tirkiya wan hinekî bi aksan pê ve kesek nedihat bîra min. Heta van salên dawî ku hin nasan gotin "Em, ne ji we ne" û ez bi nasnameya xwe vecinîqandim. Ez difikirîm,*

min digot gelo dibe ku gotinên wan rast bin ? Ji vê û pê de jî weke herkesî pêş zimanê wan, *Mem û Zîn*'a wan û paşê jî leqayî stranên wan bûm. Lê aliyekî îronîk jî heye tabî. *Xetice Yaşar* a Haymanayî wê bi bapîrên xwe yê Şêx Bizeynî yên Kerkûkî bihise ez ê bi kalê xwe yê ku li Gyor veşartiyê nehîsin? Bi çi awayî dibe bila bibe di dawiyê de me împaratoriyeke tasfiye kiriye. Rast e. Me Kurdistan ji bîranîna serbazên îngilîz ku ketûbûn Şerê Dinyayê yê Yekemîn bihîst. Divê ev normal bê qebûlîkirin. Lewre ew civakên ku bi edebiyateke devkî mabin û xwe derbasî nivîsê nekiribin her tim wê ji aliyê kesên derî xwe ve bîr nivîsîn û wê ev jî her tim biqusûr be. Di dîroka dinyayê de bi sedan mînakên bi vî rengî hene.

- *Hûn bi çavê "Ji nû ve parvekirin" li pîrsgirêka kurdan dinerin. Ku bi giştî li pîrsgirêkê bê nihêrtin -ne tena girêdayê Tirkiyê ye- hûn dikarin çi bibejin?*

- Bi min her tevgereke siyasî bixwe ji nû ve pîrsgirêka parvekirinekê ye. Ev li kîjan welatî an jî welatan dibe bila bibe, wisa ye. Ger di jiyana xwe de hûn li ser xwe bi neheqiyekê nehîsiyabin, xebat û taba we ya li ser lêgerîna eslê we ji fantazyeyê folklorîk pê ve tu maniyeyê din îfade nake. Dema vê dibêjim min hay ji îzafîya biheq û neheqîtinê heye. Ne wisa be, mesela Almanya wisa dihesiband ku neheqî lê hatiye kirin piştî Şerê Yekem yê Dinyayê û bi vî awayî bû sebebê Şerê Duyemîn yê Dinyayê. Qey di vir de biheq bûn?

- *Li hember nivîseke Kendal Nezan hûn dibêjin: "Min ji te re gotibe 'Tirkê Çiyê' qey nabe ku min xwestibe te ji derî xwe nehêsinim, delalîyê min?" Di pratîkê de ev wiha nebûye kî! Bi vî awayî înkari, demeke dirêj bûye sedemê ku ji bo xeberdana her peyveke Kurdî nizanîm çend qurûş pere dane...*

- Çawa aliyên ku xwe nîşan dabîn hebin, yên ku xwe nîşan nedabîn jî hebûne, ne wisa ye? Ger ne wisa be em ê ji hezkirinê çawa mijûl bin? Ez, li hember wan zanînên ku hatine sîstematîkkirin im. Tiştê ku ez red dikim tevahiya zanînên sîstematîk e. Ger li dijî tewrê înkarkirinê em tewrekî ku înkar nake jî qebûl bikin, bawer dikim em ê ji şablonan xelas bibin.

STENBOL DEYNDARÊ CİZİRÊ YE

- *Ji notên romana Rodoplu: "Ji Mêrdînê bi rê ketim. Ji ser Midyadê ber bi Cizîrê, Cizîra memleketê Mela. Minê sahtûreke kirê bikira. Ji Dicle berjêr, ber bi Mûsilê, Deştê Heranê, Horsabadê û xirabeyên Dar Şarrukîn ve. (...) Min xwest çok bidim li ber Stenbolê. Şiyar bibim li siya xeyalên xwe yî hênîk, lê Mem nehişt. Got: Ger tu negihîjî Qesrê tê telef bibî. Di dilê xwe de min got, di vî riyê de deyneke didim. Ez deynên gunehkariya ku Stenbolê bi van însanan kiriye didim. Ew însanên ku tenê ji bo karibin baca mal û canê xwe bidin bi sedan sal e hatine şêlandin û belengaz bûne." Li gor we em vî deynî didin, bi awayekî din em deyndariya xwe qebûl dikin an na?*

- Divê em qebûl bikin. Kes nikare cehaletiya xwe ya ku ji îdeolojiya dewletê ya resmî tê heta û heta ji wijdana xwe re bike mortal! Wekî din, çawa her yek ji me em súbjeyên dewletê bin herwiha objeyên wê ne ji. Temamê dewletê dawî ji karmendan (nemûran) pêk tê. Ew karmend jî ji heyvê danakevin. Ez û hûn û em hemû divê rolên xwe yên di vî warî kêman zêde pêk bînin.

- *Di pirsgirêka kurdan de baweriya Rodoplû, bi ronakbîrên çepgir nîn e. Rastgir ji xwe ji vê pirsgirêkê dûr in. Hûn nêrînên ronakbîran li ser pirsê kurd çawa dinirxînin?*

- Rodoplû wek oryantalîstan bi ronakbîrên çepgir ewle nabe. Di vir de tişteki ecêbmayînê jî nîn e. Lewre sosyalîzm jî bi Rojava re hatiye qebûlkirin. Ew jî tiştê di nav şablonên xwe de şirove dikan. Ev, riyên pêşiya çareserkirinê dixitinîne. Nêrînên ronakbîran yên li ser pirsgirêka Kurd ji nêrînên wan ên li ser pirsgirêkên din cihêtir nîn e! Bêhlûtîmam, sloganwarî û karyerîst e. Riya çareserkirina pirsgirêka kurdan di çareserkirina pirsgirêka tirkên de dibuhure. Yek bê ya din nayê çareserkirin. Jixwe bi metodên wek "*Ji Helsînkî hatiye gotin*" qet nabe.

- *Li gor we çima civak, ronakbîr û medya ji meseleyê re ewçend dûr disekin? Çima ewqas jê sar in?*

- **BI-YA-NÎ-BÛN!** Ji vê re kurdbûn an tirkbûn çî ferq dîke? Mesela berî bi demekê ji welatên Balkan bi 84 serokan civînek li dar ket, tu his û bis ji medya û

ronakbîran nehat. Ev 84 serok jî di civaka xwe de hindiktirîn bi qasî Barzanî biqîmet bûn. Tew! Hûn gundê kê ji kê dipirsin?

- *Di salên 1970'yan de li Farqînê komandoyan li ber çavên jinan, mêr tazî kirin û piştî re ben li penîsên wan girêdan li ber çavên xelkê gerandin. Sedema ku ev rewş îşkence nehate hesibandin Rodoplû bi filmê "*Li Parîsê Tangoya Dawî*" ku li Stenbolê di televîzyonê de bû, girê dide. Mirov kare ji tesîreke wiha qal bike? An jî ev dibe sedem?*

- Tabî ev nabe "sedem!" Lê biyanîbûn hissiyatê dikoje. Ku hest tîn kojandin ji zilmê re rê vedibe. Rodoplû dixwaze balê bikişîne ser vê yekê. Ger hûn romana min î bi navê "*Îşkenceci*" bixwînin, hûn ê têbigihîjin ku diwazim çî bibêjim.

- *Hûn bawer dikin ku Tirk "li hember Kurdên Aryan wek Cihûyên berî Sîyonîzmê stûxwar" bisekinin? Ji bo pêşerojê endîşeyên we yên wiha hene?*

- "*Bawerkirin*" ne peyveke rast e. Ji vî awayî ve Rodoplû ji aliyê dil ve westiya ye. Di bin vê de jî nefreta wê ya li hember faşîzma nîjadperest heye. Ku navê "*Aryan*" dibihîze dîke dîm bibe. Divê ez vê jî bibêjim: Rodoplû jî bi tirkbûna xwe ji aliyê Rojava ve gelek muameleyên nexweş dîtine. Bêyî ku heq bike jî. Êşa vê di xwe de dihevine. Dema ku leqayî wan kurdên ku her tîm jixwe zanibûye, lê wan ji "wî" alî ve nîşan didin, dibe pîrr aciz dibe. Dibêje qey pê re xayînî hatiye kirin. Wekî din jî dîtina faşîzma nîjadperest bi tu awayî ne fikreke ku em wê qebûl bikin.

QEY TIRK TENÊ BERPIRSIYAR IN

- *Ji bo çareserkirina pirsgirêkê gereke çî bê kirin?*

- Divê çareyek wisa jê re bê dîtîn ku her însanekî li ser vê axê dijî karibe jiyana xwe li gor fikr û dilê xwe tanzîm û ava bike. Çûna ji bêedebê ku li Farqînê ben li penîsê Abdulbarî girê da wek tırkekî tenê ez berpirsiyar bê me dîtîn! An ji rewşa aborî, an ji karên dervelhî an jî, ji tşkiliya bi Rojava re?

- *"Neteweperest karin pirsgirêka Kurd çareser bikin." Çawa? Di destpêkê de ihtîmalên nexweş tên hişê mirov.*

- Vêga ev peyva "neteweperest" zor e hinekî. Lewre di xwe de telmîhên şovenîzmî, nîjadperestî, mêtingelkarî û hwd dihewîne. Lê mixabin min gotineke jî vê tekûztir peyde nekir. Tevî vê jî ez ji xwe re dibêjim neteweperest. Lewre ez ji neteweya xwe hez dikim. Ji egîtiya wê, fedakariya wê û hwd hez dikim. Ji dilpakî û xêrxwaziya wê dilxweş im. Mesele ku *Güner Karabacak* dest bi kilama "*Kaniyên Kütahya*" an jî *İlhan Kesici* dest bi "*Çûka Huma*" dike çavên min tije dibin, dikim bigrîm. Ez ji însanên xwe hez dikim. Ji ber vê ye ku dema kurdek dest bi "*De were lawik de were*" an jî "*Dotmam*" dike ez dizanim çî difikire. Van hissên ku layîqî xwe dibînim çûna layîqî kurdan nebînim? Çawa karim tişteki wiha bikim? Weke mesela ku kesê jî diya xwe re nebe yar ji kesî din re jî nabe, ê me jî ev hesab e. Ên

ku ji neteweya xwe hez neke kare ji neteweyeke din hez bike? Kesî ku ji tirkên hez neke, wê çawa ji kurdan hez bike?

XELATA TYB'Ê NE BI DILÊ MIN BÛ

- *Hûn bi kitêba xwe ya "Valla Kurda Yedirdin Beni (Te Ez Bi Gur Dame Xwarin) ji aliyê "Jinên Hilala bi Bibereket" (kovara Kadınca) ve ketin nav "Jinên salê" yên 1993'an. Hûn çî fikirin? We bersiveke Rodoplû ji bo vê pirsê hebe?*

- Erê, gelekî matrak bû, ne wisa? Prensîbeke min heye. Ji tu komele û sazî û filan xelatan nagirim. Ger wê xelatê kovara "*Bereketli Hilal'in Kadınları*" dabûna min ne mumkûn e, min qebûl nedikir. Lê bi rastî jî xwendevanên wê dabûn min. Ku tabîr rast be xwendevanên min "*aniyeke hevgerî*" avakirin û bi wî awayî ev xelat dane min. Wekî din kovar bi xwe bi min re hevpeyvînek jî çênekiribû. Berpirsiyarên kovarê binamûsî kirin, an na karibûn rayan bi sehetî bindoşek jî bikirana.

- *Lê we Xelata Yekitiya Nivîskarên Tirkiye (TYB) red nekir...*

- Bi temamî rast e. Lê ew xelat bi tevahî surprîzek bû. Ez nizanim kê, kengî, bi çî awayî ez nîşan dame jî. Min saziyê bi xwe jî nas nedikir. Di sersalekê de ez ji televîzyonê hîn bûm. Xelat ne bi dilê min bû. Carbicaran dibêjim qey min ew xapandine. An însanên fevkalade bûn an jî kitêb baş nexwendibûn. Muxtemel e ev

herdu jî rast bin.

- *Hûn saziyên wek TYS û PEN'a Tirk rexne dikin û dibêjin ku "Komeleyên misêwa pesnê hev didin" in. Lê hûn zêde li ser yên wek TYB û Kubbealtu nasekinin. Fikra we çi ye, hûn dixwazin çi bikin?*

- Ev rewş fiilên ji ber statuya ku ez tê de me tê. Ez ji statuyeye wisa tîm ku herdem di avakariya sîstemê de bideng bûye. Ji ber tîkiliya malbatî ve jî her tîm em û dewlet nêzîkî hev bûne. Ne bi statuya polîtîkvanekî lê di burokrasiyê de an jî di tadrîsatê de em bêpar nebûne. Wekî din jî ez ji çepgiriyê tîm. Ku ev herdu rê digihîjin hev mirov êdî zehf dibe xwedî zanîn di heqê îktidarê û tîkiliyên wê de. Li aliyê min îktîdar her dem ji çepgirî pêk tê. Lê ev çepgir ji aliyê reng û dereceyê ve cihêtiya wan heye. Xwezî kesên ku van "komeleyên pesnê hev didin" yên din jî binivîsandina. Wê ev jî bibe lê bela hê nebûne îktîdar nabin hedef ji tîran re.

"O.K. MUSTÎ TIRKIYE TEMAM" E?

- *Kitêba çaremîn ya rêzê wê kengî derê? "O.K. MUSTÎ Tirkîye Temam e" di xwe de bedbîniyê nahewîne? Tirkîye temam e?*

- Wê kitêb di nav du sê mehan de derê. Na, ne bêhêvî ye; lê nîşan dide ku ji bo Tirkîye deriyê dewrekê êdî tê girtin. Ev nayê wê maneyê ku Tirkîye ji wê holê rabe. Wê biguhere. Mesela tevî exlaqekî lîberal wê bibe welatekî "inureffeh" û wê di nav Yekîtiya Awropa de cihê xwe bi endametiyeke hurmetdar bistîne.

- *Xebatên we yên nû hene?*

- Ez niha di xebata romaneke bi nave "Çiroka Evîneke Alternatîf- Alternatîf Bir Aşk Hikayesi" de me. Cildên duyemîn û sêyemîn yên "Yasemîn Hê Ji Geş in" berhev dikim. Wekî din dixwazim romaneke leşkera çêkim. Tabî ku tişteki din nekeve wê navê! Li aliyê din ez li ser kitêbeke biqiyas ya dîroka ramyariyê dixebitim. Wê ev kitêb wiha be, mesela 1201'î de St. filan kes wiha gotiye, di eynî demê de nizanim Îbnî-kî filan tişt gotiye. Di warê zanyarî de wê ne kitêbeke xwedî-Îdia be lê wê populariya wê hebe.

- *Werger jî nûn in?*

- Hin kitêbên ku muheqqeq divên wergerin tirkî hene li gor min, bes ez têrê nakim.

PORTRE / ALEV ALATLI

Di sala 1944 an de li Îzmîrê hate dinyayê. Dibistana navîn li Tokyoyê li Lîseyaya Amerîkan temam kir. Ji ODTÜ

Beşê Ekonomiyê mezun bû. (1963) Piştî ku li Amerîka master li ser felsefê qedand (1968) li Maina College dersên

iktîsadê dan. (1969) Li DPT bû pispora iktîsadê. Piştî veqerîya Tirkîye kovara "Bizim English" derxist.

(1981-84) Di YAZKO de jî xebitî ye. Berhemên wê: (Roman) Yaseminler Tüter mi Hala? (1985), İşkenceci

(1986), Viva la Muerte (1992), Nuke Tirkîye (1992), Valla Kurda Yedirdin Beni (1993), Kadere

Karşı Koy A.Ş. (Tiyatro), Aydın Despotizmi (lêkolîn). Alatli ji Edward Sai û Xeyreddîn Paşa 3 kitêb

wergerandine tirkî.

BIZAVA HUNERÎ LI ZAXOKA BEHDÎNAN



Beşîr BOTANÎ

Piştî serfihildana 1991'ê huner li başûrê welêt geş bû, firehtir bû û baş hatiye pêşxistin... Ew jî bi saya serê şehîdên ku bi xwîna xwe welat rizgar kiribûn.

Li dûmahiya bihara 1994'an ez vegeyriyam Zaxoka Behdînan. Min axa rizgarkirî maç kir. Ez çûm xwendegeha xwe, navê wê Zaxo bû, niha bûye xwendegeha Botan û Amedeya Zaxo, ya bûye Amedeya Be-

dirxan. Ez çûme ber ava Xabûrê, min dît ku coka Hazim Begî kaviy û wêran bûye. Ez li Zaxokê baş geriyam. Li her derê dawet û şahî bû; komên muzîkê yên nû, tomargehên biçûk, komên şanoyî û hwd... Cilên şal û şapikên Botan kêm bûbûn, şirwalên cawî (qumaş) û cilên nû bêhtir bûbûn. Lê zarokên me weke berê "boyaxçî" ne. Yên ji du salî û mezintir, ji berê bêtir cigarê dikişînin.

Komeleya Hunermendên Kurdistanê

Li rêketa 4.1.1994 hîlbijartîneke demokratîk hatiye kirin. Yanzdeh kesan xwe pêşniyaz kirine û pênc kes ji wan hatine hîlbijartin.

Endamên vê komelê 68 kes in û roj bi roj bêhtir dibin. Li derveyî komelê jî mişê hunermend hene û her nayêne hejmartin.

Şano

Îro li Zaxoyê bi kêmanî çar şanoyên baş hene. Ev çar şanoyên han her dem têne bikaranîn.

- 1- Yekîtiya mamosteyan, taybet.
- 2- Gazîno kornîs, taybet.
- 3- Amadeya kişt û kal, xwendevan in.
- 4- Navenda lawan, niha rawestiyaye.

Êvarên cejnê

Li gazîno û mala bêhnvedanê ya yekîtiya mamosteyên Kurditanê, sê şanogerî ji aliyê koma şanoya Zaxoyê ve hatine pêşkêşkirin.

Roja yekê ya cejnê, Wey serçava nexweş.

Roja duwê ya cejnê, Heybet.

Roja siyê ya cejnê, Nere gidîyorsin?
Di gel vê jî her roj henek, çalakî û
karîkatorên "Bilo û Silo" hebû...

Şêwekarî

Ev beşa han berê li Zaxoyê kêrî bû.
Lê niha li her cihî heye û baş diyar e.
Piştî serfîhildana 1991'ê û ta niha bi he-
zaran tablo hatine durustkirin. Beşekî
mezin ji wan turîstan kirîne.

Îro beşek ji hunermendên Zaxoyê ji
xwe re dikan vekirine û tê de tabloyan
çêdikin, wêneyên wan weke "postkart" ê
digirin û hemû difroşin.

Ji aliyê hunermendên Zaxoyê ve gelek
pêşangehên hêja û serkefî hatine berhev-
kirin. Îro ew dixwazin beşekî ji tabloyên
xwe biparêzin, bikin postkart, berhevok,
an jî pirtûk. Lê rewşa aborî sext û giran
e.

Muzîk

Îro gelek muzîkvan, dengbêj û awaz-
van li Zaxoyê hene. Di gel vê yekê jî
fêrkarên muzîkê li cadeyên Zaxoyê, li
kolanên wê û li her tirimpêlekê dengê
muzîkê bilind e. Herweha li radyoya
Zaxoyê û Tv:a Kurdistanê jî...

Fêrkerê muzîkê Sebah Zaxoyî dibêje:
*"Ez li navenda lawan fêrkerê muzîkê me.
Her kursek ji şeş heyvan ta salekê ye.
Amûrên (aletên) me ji tembûr, ûd,
keman, org, rîtm û hwd pêk tên. Xwen-
devan keç û kur in. Ji bilî hindê, em
dengxweşan bo koralê jê digrîn."*

Hunermendê mezin Beşar Zaxoyî
dibêje: *"Min ji bo strana kurdî ya nû
gelek xwe westandîye û niha alîkariya
nivîşê nû dikim."*

Nîgarî to le dîwarî zîndanekem heldekolim



Pirtûka Ferhad Shakely ya
helbestan li Swêdê derket. Wek tê
zanîn Ferhad Shakely yek ji
şairên Kurdistana Iraqê yê zara-
vayê soranî yê bijarte ye. Ji bilî
şairîtiya xwe ew bi kovarên xwe
Svensk-Kurdisk Journalen (bi
Swêdî) û Manostayê Kurd jî (bi
kurdî) navdar e.

Shakely di vê berhevoka xwe ya
bi soranî û bi tîpên erebî de, li
ser felsefê, evînê, welatheziyê,
xerîbiyê û bêrîkirinê radiweste.

Pirtûk dikare ji vê navnîşanê bête
xwestin:
Mamostay Kurd
Box 615
191 26 Sollentuna-Sweden

HEVPEYVÎN BI XORTEKÎ 75 SALÎ RE

Fîrat CEWERÎ

Cara pêşî ez di sala 1978'an de bi du hevalên xwe re çûbûm Stîlîlê, mala Mûsa Anter. Ji wê çaxê de vî canêrî bala min kişandibû. Lixwekirina wî, rabûn û rûniştina wî, tevgera wî, nefsbîçûkahiya wî, hizir û ramanên wî yên nûjen tesîreke pir erînî li ser min hiştibû. Hingî ji me re behsa astronomiyê, felsefê, medeniyeta girêkiyan, dînê Zerdeşt û dîroka mirovatiyê kiribû. Lê romantîkbûna wî jî ji ber çavan nerevîyabû. Estetîka bexçê wî, dar û gulên wî yên têvel, cihokên di hewşê de çêkirî û tijî masiyên cûr be cûr, Mûsa Anter bi sed salî ji gundiyan bi dûr dixist. Lê di gel wê nûjenbûn û zanebûna xwe Mûsa Anter tu caran xwe ji gundî û mirovên xwe bi dûr nedixist, kul û derdê wan, êş û jana wan, kêf û şahiya wan bi xwe re par ve dikir. Bi sed salî di pêşiya wan de, lê mil di mil de, bi wan re dimeşiya.



Min ev camêrê han piştî serîhildana Nisêbînê, di nehê tîrmeha 1990'î dîsan dît. Di ser re tam donzdeh sal derbas bûbû. Ji şêst û sê salî bûbû heftê û pênc salî. Min di serê xwe de Mûsa Anterekî kal, ku nikare bimeşe, nexweş, bi êş û elem û xurîfî çêdikir. Lê ne wisa bû. Ew bi her awayê xwe weke xortekî bû,

xortekî 75 salî...

Bi bawerîya ku wê jiyana vî xortê 75 salî ji bo hevweletiyên min balkêş be, min xwe negirt û jê pirsî:

- Çi bigire îro navê Mûsa Anter ji aliyê hemû kurdan ve tête zanîn, nemaze ji aliyê kurdên Tirkîyê ve...*Hin kes wî weke nivîskarekî, hin kes jî wî weke siyasetsvanekî dizanin. Gelo tu bi xwe wî çawan didî naskirin?*

- Ez dikarim bêjim, ku ez nivîskarekî siyasî me. Heta ji min hatiye jî, min xwestiye ez siyasetê bi awayekî mîzahî bikim. Ji ber ku ta bi niha me firsenda ku em bikaribin fikir û ramanên xwe eşkere û vekirî bibêjin, nedîtîye, min riya mîzahê ji xwe re neqandiye. Nivîskarê Hindî jî wilo kiriye. La Fontaine jî di dema xwe de siyaseta Fransayê bi heywanan, bi fabel îzah kiriye. Mirovên min, der û dora min, kurd in, dinya min Kurdistan e. Kurdistan jî perîşan e. Ez bawer im, ku ez ne kurd bûma jî, min ê dîsan li ser kurdan binivîsanda.

- *Ji bilî xebatên te yên siyasî, em te bi Qimil, Birîna Reş û Yarasarlar nas dikin. Ji bo çî te hewcedariya nivîsandina van pirtûkan dît, kê tu ajot ser vî karî?*

- Yê min ez ne tu sîlahşor bûm. Tu ordiyên min jî tunebûn. Ji ber ku min neheqî qebûl nedikir, min hewcedariya van pirtûkan dît. Mehemed Akif heye, şairekî arawit e, dibêje: Mirov di bin lingan de be jî, divê mirov bêje xebera min e, weha ye. Gerçî ez zeyif bûm, ez yekî bi tenê bûm. Eybe ez bibêjim, lê ez karim bibêjim, ku piştî Cumhûriyetê min dest pêkiriye. Niha ez ne poşman im. Hin bi hin hevalên min li min gihan û niha yê ku ez derbas kirime jî hene. Mirov her dixwaze ku lawê mirov ji mirov çêtir be. Niha ez dibînim xortên kurdan dest avêtine vî karî, gelekî kêfa min tê. Di dema me de xortên xwende

kêm bûn, çî bigire tunebûn. Di nifûsa Nisêbînê de kesên ku biçûna dibistana navîn û lîse, mebûn, ez bi tenê bûm.

Vêca fêda min ya herî mezin ew bû, ku pir ji malbata me, mala apê min ew li binxetê bûn. Havînan gava ez ji mektebê dihatim, ez diçûm Sûriyê. Li wir Hawar derdiket, Ronahî derdiket, ez di bin tesîra van kovaran û nivîskarên wan, wek Celadet Bedirxan, Kamûran Bedirxan, Cegerxwîn, Qedrîcan û Osman Sebrî de mame. Ya rastî tu bixwazî meraqa min jî ji nivîsandinê re pir hebû, ji ber vê yekê min dest pêkir û xwest wê valahiya ku hebû dagirim.

- *Wek tête zanîn, tu wek nivîskarekî aktîv di pir kovar û rojnameyan de jî xebitîyî. Tu dikarî ji kerema xwe re bi kurtî behsa wan biki?*

- Jiyana min ya weşanê, di sala 1948'an, li Stembolê dest pêkir. Hingî me Dicle derxist. Piştî ku ew hate girtin, di sala 1950 de me kovarek bi navê Şark Mecinûasi derxist. Piştî hatina qaşo demokrasîyê, ez vegeriyam welêt. Li welêt ez dîsan nesekinim, me li Diyarbekirê Şark Postası derxist. Piştî wê bi çend salekî ji bo eskeriyê ez dîsan çûm Stembolê. Bi dû xelaskirina eskeriya xwe re ku ez vegeriyam welêt, îcar di 58'an de me Îleri Yurt derxist. Piştî derxistina Îleri Yurt'ê me çapxane kirî û me dest bi weşana Mezopotamya kir. Derketina Mezopotamya bû sedema girtina me. Ji 59'an heya 61'ê ez girtî mam. Gava ez hatim berdan, min di kovara Ahmet Hamdi Başar, ya ku li Stembolê derdiket de, nivîsand.

- *Baş e, di ser dîroka wan pirtûkan re demeke dirêj derbas bûye. Ew dema dirêj di ser kovar û rojnameyên ku tu bi wan re dixebitî jî, derbas bû. Tiştê ez dixwazim bibêjim ev e: Bi salan tu xebatên te xuya nekir. Ji bo çî? Sedema ku te nenivîsand çî bû?*

- Min nivîsand. Pir kes jî bi vê yekê dizanin. Çar kitêbên min yên ku ji to çapê amade bûn, hebûn. Herçar kitêb jî ji aliyê polisan ve hatin girtin. Yek ji wan kitêban ferhengek bi tirkî û kurdî bû. Yek jê jî 38 *Numaralî Hücre* bû. Navê kitêbekê jî *Diyarbakir Wê Şevê Çiqasî Reş bû*. Min bîranînên xwe jî nivîsandine. Ew niha amedeyî çapê ye. Ez hêvîdar im, ew ê ji niha û demeke nêzîk berpêşî xwendevanan bibe.

Weke tu dibînî, ez nesekinî me. Tiştê ji destên min hatiye min texsîr nekiriye.

- *Ji bo çi tu ji Stembolê vegeriya, te xwe ji jiyan û hewa entelektuelî bi dûr xist û li gund bi cih bû yî?*

- Ji 70 heta 75'an ez sî û sê mehan girtî mam. Pişî ez hatim berdan, ez hebekî nexweş ketim û ez têra xwe jî westiyabûm. Ez hewcedarî bêhnberdanê bûm. Min xwe li gund baş rihet kir. Vê yekê ta 87'an dom kir. Di 87'an de ez cardin rabûm sergovendê, min dîsan dest bi nivîsandinê kir.

Ez ê ji te re çirokek Rustemê Zal û bavê wî bibêjim. Hîn Rustem zarok bû, bavê wî rojekê bang dikê û dibêje were lawo, ez ê vê şerîeta xwe, îşê xwe hemî bispêrim te. Dijmin bi vê yeka han dihesa, tê ser wan û li talanên wan dixê. Hatin ji Rustem re gotin, dijmin li talanên me xistin, Rustem got, tişt nabe, me jî li talanên wan xistiye. Paşê hatin gotin, kuro bi şerîtên konê me ketine, kon bi ser me de xerab dikan, dîsan got, tişt nabe, me jî konê wan bi ser wan de xerab kiriyê. Dawî dawî hatin gotin, heyran dest davêjin namûsa me. Hingî Rustemê Zal hêrs bûye, gotiye, îcar nebû, kanî hespê min û gurzê min ji min re bînin. Rustemê Zal xwe avêtiye ser piştê hespê xwe û bi hêrs û rikekê li hember dijmin rabûye.

Yê me jî li me xistin, îşkence bi me kirin, bawer bike gundiyan me hemî bi

darane ve girêdan û tiştê nemayî anîne serê wan, rezalet kirin, zarokên me hemû girtin, kezeba me şewitandin me deng nekir. Hetaa ku êdî gûyê me dane me, dest avêtin namûsa, şerefa me anîne perakî. Wê çaxê min hew xwe girt. Yê min tu gurzê min mîna yê Rustemê Zal tune ye, lê qelema min heye. Niha min rahiştiye qelema xwe û bi vê kalîtiya xwe min xwe avêtiye meydana şer.

- *Di vê meydana şer de pir xort jî hene ku hespê xwe dibezînin. Me bîska din li ser nîşê kevin, yanî nivîskarên der û dora Hawarê sohbet kiribû. Gelo ger tu nivîşê nû û yê kevin bidî ber hev, çi ji nivîşê nû dikeve serê te? Tu tu hêviyê di nivîşê nû de dibînî?*

- Yên berê hem hindik bûn, hem jî kevin bûn, yanî klasîk bûn. Lê xortên niha, ya jî nivîşê niha moderntir in. Nivîskar dibe, şair dibe, her kes li gorî kultura xwe dinivîsîne. Mesele yê kevin, pir ji wan ne xwedî kultureke kûr bûn, di medresan de, bi xwendina dîmî gihîştibûn. Rebenan negeriyabûn, nedîtibûn. Cegerxwîn li Qamîşlokê dinivîsand, hûn li Swêd dinivîsin, ferq ev e.

- *Îro kêm zêde mirov dikane behsa zîmanekî kurdî yê standart bike, an jî behsa edebiyateke kurdî... Wek hûn jî dizanin, îro bi zîmanê kurdî roman, çîrok, helbest, lêkolîn û heta em dikanin bêjin ku nivîsên felsefî jî tene nivîsandin. Lê piraniyê vê xebatê li derveyê welêt dibe. Rola vê yeka han di têkoşîna gelê me de çi ye? Li welêt ev îmkan çêbibe wê pêşketin xwe bi çi awayî nişan bide?*

- Rola wê ya hêja û giranbuha nayê munaqesekirin. Ma gelo kî bê tiştên wilo karin bi ser kevin? Edebiyat, an jî nivîsandin riya têkoşîna rohmî dike. Lê mixabin, zîmanê me hîn ew çend bi pêş neketiye. Heta ku zîman nekevin warê nivîsandinê bipêş nakevin. Her kes mîna

malbata xwe dipeyivin. A niha ku jinek were gund û zarokê jê re çêbibe, ew zarok ne wek gundiyan, lê wê weke diya xwe bipeyive. Ji ber vê yekê ye ji zaravayên me pir bûne, ji hev bi dûr ketine.

Ez bawer im ku zimanê kurdî têkeve warê nivîsandinê, dûrbûna zaravayên kurdî wê roj bi roj nêzîktir bibe. Em û zaza û soran, em ê bikaribin bi hêsanî ji hev têbigihên, wê bibe zimanek. Tiştêkî din ji heye, ku em kurd ji her kesî bêtir ti û birçiyên ilim û nivîsandinê ne. Niha ku yekî têr û yekî birçî li ser sifreyekê rûnên, ma wê bi bi qasî hev bixwin? Yê me jî wilo ye. Ger kurancî serbest bibe, em bikaribin çapxane û weşanxaneyên xwe li dar bixin, em ê di demeke pir kurt de ji cîranên xwe derbas bikin. Ez bi xwe di vê baweriyê de me.

- Çi ji siyasetê Tirkiyeyê ya îro dikeve serê te? Hişyarbûna kurdan di çi dereceyê de ye?

- Li Tirkiyeyê ebed siyaseta ilmî tune ye. Qeşmerî heye. Ew bi xwe jî dizanin êdî bi yasaxan, bi girtin û îşkenceyan ev kar naçe serî. Ew mecbûr in xwe biguherin. Ji aliyê din ve jî em kurd şiyar bûne.

Min di dema xwe de çirokekê di "Dicke Kaynağı" de nivîsandibû. Hingî wan ez girtim, li min xistin, îşkence bi min kirin, gotin, kuro tu kî yî, tu çi teba yî? Em ê serê te bipelçiqînin. Axirê ez derketim, lê min careke din nivîsand. Çîrok bi kurtî wilo bû; pîrekek, zilamek û zarokêkî wan yê çar-pênc salî hebû. Ew karker bûn, jin û mêr di xew de ne, lawik jî di xew de ye, lê gava diz dikevin hundur, lawik şiyar dibê. Yek ji dizan diçe li ser serê lêwik di sekine, kêra xwe dikşîne û dibêje, deng ji te derkeve ez ê te bikujim. Dizê din jî diçe sindoqa diya wî dişikîne û heinû firaxên wê dixê kîsekî. Kezeba lêwik dişewite, lê rebeno çi bike, kêr jî di ser serê wî re ye. Ji bo ku lawik dê û bavê xwe şiyar bike, bang dike, dibêje, avê! avê! Yek ji dizan dibêje, hişbe kuro! Yê

din dibêje, tişt nabe lawo, zarok e, tirsiyaye, avinê bidê. Tasek av didin lêwik. Gava lawik avê vedixwe, dîsan ji bo ku dê û bavê xwe şiyar bike, bi dengêkî bilind dibêje, ooxxx!... ooxxx!... ooxxx!... çiqas av xweş e. Lê dê û bav dîsan şiyar nabin. Yê diz destê xwe bilind dike û dibêje, hişbe kuro, ez ê kulmekê li devê te xim ha! Îcar lawik bi dengêkî bilind bang dike, dibêje ay devê min! Ay devê min! Ay devê min!

Hingî dê û bavê lêwik şiyar dibin.

Min jî got, lawo, ez dizanim ku ez wek wî zarokî me, kêr li ser serê min e, ez nikanim bi we û dê û bavê min jî razayî ne. Mexseda min ez wan hişyar bikim.

Îcar niha dê û bav hişyar bûne, dilê min rehet e. Di destên dizan de bi tenê bazdan maye. Dûr nêzik ew ê bazdin.

- Şîret û pêşniyarên te ji van karkerên kulturê yên derveyî welêt re çi ne?

- Ez xebata we ya li derveyî welêt gelekî dicibînin. Mesele Jon Tirkan jî li Ewrûpa karê xwe dikirin. Gandî li Îngîltêre, Ben Bela li Fransayê xwe gihand. Em jî hêvîdar in ku hûn rojekê bîn û li welatê xwe xwedî derkevin, karîna wê têxin destên xwe.

Divê hûn tu carî bêhêvî nebin. Tarîxa miletan dirêj e. Emrê min va ye bûye 75 sal, ev 55 salên min e ku ez di navê xebatê de me, hîna jî min bi qasî qirşekî tiştêk ji hêviya xwe wînda nekiriye. Tiştê hûn dikin pir bi qîmet. Belkî niha xatirê wê nayê girtin, lê wê rojek were ev heinû tiştên ku we nivîsandine, wê mîna beyraqan li welêt li ba bibin.

Ev hevpeyvîna bi Mûsa Anter re, di sala 1990'î de di Kurdistan Pressê de hatibû weşandin. Bi hinceta biranîna yeksaliya wî û bi niyeta ku wê bi girseyî negihîştibe xwendevanên kurd, em careke din diweşînin.

Bîblîografya û Çîrokên Hawar, Ronahî û Roja Nû

1932-1935/1941-1943



Amadekirdinî: Ferhad PîRBAL

Govarî Hawar (1932-1935/1941-1943), ke Celadet BEDIRXAN le Dîmeşq (Sûrye) bilawî dekirde, xawen behayekî edeby î gelek mezine. Mixabin, heta îro jî, hîç vekolînekî şayste û firawan li ser nawerokî em govare çê nebûe.

Teknîk û formî wan Çîrokên kû li

Hawar da hatîne bilavkirin gelek hunery û pêşkewtûn. Nawerokî wan jî, wek neynîkekî saf û rengîn, jiyânî gelî Kurd li salanî seretay em sede ye da pîşan deden: gewahînameyekî bêgerd û nazikin li hember dîrok û trajîdya û jiyânî mirovî kurd. Gereke em çîrokane, wek dokumentên dîrokî, hinerî û estefîkî bêne qeblandin; vekolîn li ser wan binûsrêt.

Piraniya wan çîrokên (69 çîrok), ne le Kurdistanî Îraq û ne le Kurdistanî Tîrkiya, Êran û Surye da, nîn û dest nakewin. Nivîskar û xûndevareên kurde nizanin kû di wê salên 1930 û 1940 da, jyanekî edebî û kulturî dewlemendî kurdan le Dîmeşq hebûe. Ême detwanîn desnîşanî heft çîroknivîs bikeyn ku le govarî Hawar da çîrokî xweyan bilaw kirdotewe: Kamuran BEDIRXAN (12 çîrok), Celadet BEDIRXAN (11 çîrok), Osman SEBRî (7 çîrok), Nûreddîn ZAZA yê Çîkofa Kurdan (7 çîrok), Mistefa Ehmed BOTî 6 çîrok), QEDRÎ CAN (5 çîrok), Bişarê SEGMAN jî (4 çîrok).

1- Kamuran BEDIRXAN: Du Egîd, H° 2, 1 Juin 1932, R. 5.

2- Celadet BEDIRXAN: Ber tevna mehfûrê, II° 4, 03. Tîrmeh 1932; R. 1 - 4 û 2 - 6.

3- Kamuran BEDIRXAN: Lawkê min, H° 4, 03 Juillet 1932, R. 6 - 7.

4- Kamuran BEDIRXAN: Dildiziya gulekî, H° 5, 20 Tîrmeha 1932, R. 5.

5- QEDRÎCAN: Besreka zêrîn, H° 5, 20
Tîmeha 1932, R. 5-7.

6- Celadet BEDIRXAN (Çîrokbêj): Mar
û mirov, H° 6, le 08. Tebax 1932; R. 3 -
4.

7- Celadet BEDIRXAN (Çîrokbêj): Dîk
û Rûvî, H° 6, 08. Tebax 1932; R. 4.

8- Celadet BEDIRXAN: Şîranî ya
zimanê kurdî, H° 8, 12 Eylul 1932, R. 1
- 2.

9- Kamuran BEDIRXAN" Koçerê botan
": Mîr û mar, H° 9, 30Sept. 1932, R.2 -
3.

10- HACO, Cemîlê: Melayê Gulî, H°
9, 30 Sept. 1932; R. 2-3.

11- Kamuran BEDIRXAN: Mîr û Qeşe
, H° 9, 30 Sept. 1932, R. 2.

12- Kamuran BEDIRXAN" Koçerê
Botan ": Leylana rastiyê, H°10, 23 Oct.
1932, R. 1 - 2.

13- Kamuran BEDIRXAN" Koçerê
Botan ": Mîr û gund , H° 10, 23 Oct.
1932, R. 3.

14-BOTÎ, Mistefa Ehmed: Kew û qitik,
H° 12, 27 Nov. 1932; R. 5-6.

15- Celadet BEDIRXAN (Herekol
AZIZAN): Çîroka Bingolê, H°11, 10.
11. 1932; R. 6.

16- K. BEDIRXAN, Koçerê Botan: Ker
gur û rêvî, H°12, 27 Nov. 1932, R. 5 - 6.

17- Celadet BEDIRXAN (Herekol
AZÎZAN): Siyabendê Silivî, H°13, 14.
12. 1932; R. 5 - 6.

18- QEDRÎCAN; Buhara Dêrikê,
H°13, 14 Déc. 1932; R. 4-5.

19- HACO, Cemîlê: Biserhatiya
Reşoyê Darî, H° 14; 31 Kanûna yekem
1932; R. 4-5.

20- Anonymê (K) : Li Kurdistanî
xwênî da, H° 14, 31 Kanuna yekem
1932; R. 6.

21- BOTÎ, M. Ehmed: Cuhabên koçerê,
H° 15; 23 Kanûnî dwem 1933; R. 6 - 7.

22- BOTÎ, Mistefa Ehmed: Şêr û ga yê
zêr, H° 18; 27 Nîsan 1933; R. 5.

23- Celadet BEDIRXAN (Herekol
AZIZAN): Biyaniyekî çî dîtine, H° 19,
1933; R. 7 - 8.

24- HESEN: Xewna rastiyê, H° 19; 17
Nisan 1933; R. 5.

25- Celadet BEDIRXAN (ÇÎROKBÊJ):
Xurtiya binahînê, in Hawar, H° 20, Ayar
1933; R. 5.

26- Kamuran BEDIRXAN: Du Dengbêj
, H° 20, 18 Ayar 1933, R. 6 - 7.

27- SEBRÎ, Osman: Li goristaneke
Amedê, H° 21; 5 Huzêyan 1933; R. 2-6.

28- Kamuran BEDIRXAN: Eyloyê pîr ,
H° 21, 1933, R. 1 - 4.

29- Celadet BEDIRXAN: Elyas Efendî
, H° 21, 1933, R. 6 - 7.

30- BOTÎ, Mistefa Ehmed: Bîrhatiyeq, H° 21; R. 7.

31- Kamuran BEDIRXAN: Nivîsevan , H° 22, 1 Tîrmeh 1933, R. 1 - 2.

32- CIGERXWÎN: Mîr Mihê, H° 22; 1 Tîrmehê 1933; R. 8.

33- HESEN, E.: Tirba sipî, H° 22; R. 2-3.

34- BOTÎ, Mistefa Ehmed: Çûk û fil, H° 24; 1 Nîsan 1934; R. 8.

35- Kamuran BEDIRXAN: Koçera mîran , H° 26, 18 Aoûg. 1935, R. 7 - 8.

36- Celadet BEDIRXAN: (Xwedyê Hawarê): Ehmedê Zeydan, H° 26, 18. 08. 1935; R. 4 - 6.

37- ZAZA, Nureddîn: Xurşîd, H° 27; 15 Nîsan 1941; R. 10.

38- Çiyayê Agirî: Şiwan û beran, H° 28; 15 Gulan 1941; R. 6-7.

39- RESUL, Subhî: Dilawerê çarde safî, H° 29, 10 Huzêyran 1941, R. 7.

40- ZAZA, Nureddîn : Gulê, H° 29; 10 Huzêyran 1941, R. 8 - 9.

41- PAŞA, Fyad CEMÎL: Dilgirsî û di-lovanî; H° 29; 10 Huzêyran 1941; R. 11.

42- ZAZA, Nureddîn: Keskesor, H° 30; 1 Juillêt 1941; R. 4 -5.

43- BEGZADE, Têlêf ELÎ: Kulîlkên ku ji Kurdistanê tên, H° 30; 1 juillêt 1941; R. 7.

44- Rasteder: Bi xwêhên gûhdirz da, H° 30; 1 Juillêt 1941; R. 12.

45- Derketiyekî Dêrsimî: Kurd yek in, H° 30; 1 Juillêt; R. 13 - 14.

46- ZAZA, Nureddîn: Ji xurtan ra, H° 30; 1 Juillêt; R. 14.

47- CIGERXWÎN: Behramê gor, H° 31; 1 Août 1941; R. 6.

48- DIYARBEKRÎ, Subhiyê: Dêrmanî nêzanîne, H° 32, 1 Sêpt. 1941; R. 8.

49- ZAZA, Nureddîn: Şîretê Ehmedê XANÎ, H° 32, 1 Sêpt 1941; R. 12.

50- Dilistan: Mêlik û koçer, H° 35, 12 Nov 1941; R. 6.

51- ZAZA, Nureddîn: Perîşanî, H° 35, 12 Nov 1941; R. 7 - 8.

52- QEDRÎCAN: Sond, H° 35, 12 Nov 1941; R. 8 - 10.

53- Rasteder: Kêvîr î Musa yê Ehmed, H° 9, 1 Dec 1941; R. 5 - 6.

54- ZAZA, Nureddîn: Evîna Perîxanê, H° 37, 20 Déc 1941; R. 5 - 6.

55- QEDRÎCAN: Guneh, H° 39, 20 Déc 1941; R. 6 - 8.

56- Şêx Abîd: Segê har, H° 45, 20 Huzêyran 1942; R. 6 - 8.

57- SEBRÎ, Osman: Nêçîra hirçan, H° 48, 15 Août 1942, R. 4 - 6.

58- SEGMAN, Bişarê: Kleopatra, H° 50, 15 Oct 1942, R. 3 - 7.

59- SEGMAN, Bişar: Selahedîn û Riçardê Şêrdil, H° 51, 15 Nov 1942; R. 3 - 5.

60 - SEBRÎ, Osman : Warê dil, H° 51, R. 5.

61- SEGMAN, Bişarê: Şûşa dilan Çîroka tarîxî, H° 51, R. 6 - 7.

62- SEGMAN, Bişarê: Kêleha Şahîn " Çîroka tarîxî", H° 52, 20 Kanun Dwêin 1943; R. 3 - 5.

63- SEBRÎ, Osman: Pîra gêndêrê, H° 52, 20 K Dwêin 1943; R. 8.

64- QEDRÎ CAN: Rojên derbasbûyî, H° 52; R. 9 - 10.

65- SEBRÎ, Osman: Şeytan qûnî (1), H° 55, 15 Huzêyran 1943; R. 7 - 8.

66- SEBRÎ, Osman: Şeytan qûnî (2), H° 56, 15 Juillêtt 1943; R. 3 - 4.

67- BOTÎ, Mistefa : Mêşhingivî, H° 56; P. 15 Juillêtt 1943; R. 5.

68- Celadet BEDIRXAN (CEMŞÎD): çîrokeke Misra kevin, H° 56; 15 Juillêtt

1943, R. 6 - 8.

69- SEBRÎ, Osman: Şeytan qûnî (3), H° 57, 15 Août 1943; R. 6 - 8.

Çîrokên werger

1- Alphonsê DAUDET: Stêrk (Ferensî), Nureddîn ZAZA kirdûye be kurdî, H° 33, 1 Oct 1941; R. 4.

2- Anonymê: Îşê paqij, Şevger kirdûye be kurdî, H° 42, 15 Nisan 1942; R. 6.

3- Frank STOCKTEN: Xatûn an piling, Nureddîn ZAZA kirdûye be kurdî, H° 44, 20 Gulan 1942; R. 5 - 6.

4- Mauricê BOUCHOR: Mehfûr, Silêmanê FERHO kirdûye be kurdî, H° 47, 25 Tîrmeh 1942; R. 3 - 4.

5- Frank STOCKEN: Dê an Xuşik, Nureddîn ZAZA kirdûye be kurdî, H° 47, 25 Tîrmeh 1942; R. 3.

6- Se'dî ŞÎRAZÎ: Sê çîrok ji Gulistan ra, Farisîxwên kirdûye be kurdî, H° 57, 15 Août 1943, R. 3 - 4.

Bîbliografya û

Çîrokên Ronahî (1942)

Govarî Ronahî (1942) ke Celadet BE- DIRXAN le Dîmeşiq bilawî dekirde, sê cor çîrokî têda belaw kirawetewe: çîrokî hunerî, çîrokî folklorî (Kirmancî), çîrçîrok û çîrokî amadekiraw. Mixabin, heta niha, hîç vekolînekî rexneyî firawan li ser nawerokî em çîrokanêy Ronahî

nenûsrawê.

Emê lêre de tenê bibliografya ew çîrokanê pêşkêş be xwendewaranî Nûdem dikeyn:

çîrokî hunerî

1 - Celadet: Maçeka drankêr û cezayê wê, Hej.6, R. 18-19, 1 Sêpt. 1942.

2- Celadet: Daweta kêzê, Hej.7, R. 2-3, 1 Oct. 1942.

3- Celadet: Ji ê mêrtir ra, Hej.8, R. 8-9, 1 Nov. 1942.

4- Celadet: Xwe kuşt an hate kuştin?, Hej.9, R. 16-17, 1 Decembrê. 1942.

5 Celadet: Maçikên ku mirov pê dinvîstin, Hej.10, R. 3-5, 1 Janv. 1943.

6- Nêçîrvanê Hawarê (Celadet): çîroka seyên birîndar, Hej.12, R. 22, 1 Mars 1943.

7- Nêçîrvanê Hawarê (Celadet): çîroka seyên birîndar, Hej.12, R. 22, 1 Mars 1943.

8- Bişar Segman: Gewherên Bêtlêmyos (çîroka tarîxî), Hej.13, R. 11-14, Avril 1943.

9- Osman Sebrî: Terşê Şevê, Hej.14, R. 6-7, 1 Mai 1943.

10- Qedrî Can: Sehên zozanan, Hej.14, R. 251, 1 Mais 1943.

11- Osman Sebrî: Seyê ko, Hej.15, R.

5-7, 1 Juin 1943.

12- Hesên HIŞYAR: Yên ko dizanin, Hej.16, R. 3, Juin 1943.

13- Qedrî Can: Gulçîn, Hej.16, R. 5-8, 1 Juin 1943.

14- Cemşîd (Celadet): Tîmsahê heftlî, Hej.16, R. 16, 1 Juill. 1943.

15- Osman Sebrî: Beraz û Berazî, Hej.16, R. 11, 11 Juin 1943.e

16- Çîrokbêj: Ehmed Çelebî, Hej.17, R. 2-4, 1 Juill. 1943.

17- Osman Sebrî: Mijo û Xanê, Hej.17, R. 5, Août 1943.

18- Bişar Segman: Rahbê, Hej.18, R. 8-10, Sept 1943.

19- Çîrokbêj (Celadet): Şêro û Pîvaz, Hej.18, R. 2-3, 1 Sépt. 1943.

20- Melayê Şozê: Lê ne bê tifeng, Hej.19, R. 4, 1 Oct. 1943.

21- Çîrokbêj Celadet: Jin jî hene Jinkok jî hene, Hej.19, R. 2-3, 1 Oct. 1943.

22- Evdîlezîz Mêtwar: Kirasê bextiya-riyê, Hej.19, R. 7, Octobrê 1943.

23- Osman Sebrî: Têrlan, Hej.20, R. 12-13, Novombrê 1943.

24- Osman Sebrî: Jîna jinekê, Hej.21, R. 5-8, Dêcêmbêrê 1943.

25- Bişarê Segman: Keça Cleopatra (çîroka tarîxî), Hej.21, R. 13-14, Decembrê 1943.

26- Çîrokbêj: Cihû û kurê təcîr , Hej.21, R. 2, Dêcêmbêrê 1943.

27- Qedrî Ferîman: Cebrayil nêmerd û dexsok, Hej.22, R. 3, Janvîêr 1944.

28- Pîrbêj: Jina kêmxwarin, Hej.22, R. 14, Janvîêr 1944.

29- Çîrokbêj: Çûk û Pîrê, Hej.22, R. 2, Janvîêr 1944.

30- Efsanebêj (Celadet): Masiyê bê rastî, Hej.22, R. 16, 1. Janv. 1944.

31- Evdilkerîm Mela Sadiq: Şeva gayê zer, Hej.23, R. 4, Fêvriêr 1944.

32- Bişarê Segman: Dayîn, Hej.23, R. 5-7, Fêvriêr 1944.

33- Cemîlê Haco: Leyistika Şetrencê, Hej.23, R. 17, Fêvriêr 1944.

34- Çîrokbêj (Celadet): Çûk û pîrê, Hej.22, R. 2, Janv. 1944.

35- Emayê Cilinî: Mêrê ko bi jina xwe re nan naxwe, Hej.24, R. 4, Avril 1944.

36- Sebrî Brahmî: Serpêhatî, Hej.24, R. 5, Avril 1944.

37- Çîrokbêj: Wezîrê Eqilmend, Hej.25, R. 2-4, Mai, 1944.

38- Bişarê Segman: Boxoçêf (çîroka tarîxî), Hej.25, R. 13-15.

39- Bişarê Segman: Bêbextî, Hej.27, R. 21-23.

40- Cemîlê Haco: Keleha Xursê, Hej.27, R. 7-11.

41- Qedrî Can: Nêçîra berazan, Hej.28, R. 5-7. mars 1945.

çîroka Kirmancî

1- Celadet: Dîk û Kîso, Hej.5, R. 2, 1. Août 1942.

2- Celadet: Şêr û Kêrwêşk, Hej.6, R. 2, 1 Sept. 1942.

3- Celadet: Daweta Kêzê, Hej.7, R. 2-3, 1 Octobrê 1942.

4- Celadet: Mih û Şêr û Gur , Hej.8, R. 2-3, 1 Nov. 1942.

5- Celadet: Ker û heft Gur , Hej.9, R. 2-3, 1 Decembrê. 1942.

6- Celadet: Xêzna sê kosan, Hej.10, R. 2, 1 Janv. 1943.

7- Celadet: Dehbe û nêçîrvan, Hej.11, R. 2, 1 Fêvriêr. 1943.

8- Çîrokbêj (Celadet): Roviye Şer, Hej.12, R. 2, 1 Mars 1943.

9- Çîrokbêj (Celadet): Roviye qut, Hej.13, R. 2, 1 Avril 1943.

10- Çîrokbêj: Gur û Rovî , Hej.14, R. 2, 1 Mai 1943.

11- Çîrokbêj: Dûvê rep , Hej.15, R. 2, 1 juin 1943.

12- Çîrokbêj: Sêlika rovî, Hej.15, R. 2, 1 Juin 1943.

13- Çîrokbêj: Gurên çalê, Hej.16, R. 2-3, 1 Juill. 1943.

14- Brahîmê ÎSA: Şêr û mişk, Hej.18, R. 15, 1 Sept 1943.

15- Mihyêdîn Pehlewî: Qertel û kûsî, Hej.18, R. 18, 1 Sept 1943.

16- Çîrokbêj: Wêyna rovî li rovî , Hej.20, R. 2, 1 Nov. 1943.

17- H. Hişyar: Nimêj, Hej.20, R. 20, 18 Novembrê 1942.

18- Sibhiyê Diyarbekirî: Fermana gur, Hej.20, R. 19: Novembrê 1943.

19- Jandar Mirzêngo: Hirç û Şivan, Hej.21, R. 9, Decembrê 1943.

20- Çîrokbêj: Sêwîlê Sofî, Hej.22, R. 3, Janv. 1944.

21- Çîrokbêj: Fenên Dêw, Hej.23, R. 2-3, Fêv.-Mars 1944.

22- Ebdilmesîl Wezîr: çîroka Memê Alan, Hej.23, R. 9- 11, fêvriêr- Mars 1944.

23- Çîrokbêj: Quling û rovî, Hej.24, R. 24-25, Avril 1944.

24- Çîrokbêj: Wezîrê Eqilmend, Hej.25, R. 2° 4, Mai 1944.

25- Çîrokbêj: 'êlî ya bi tenê, Hej.26, R. 24- 5, Juin 1944.

26- H. Hişyar: Kûsî û Rovî, Hej.26, R. 21, Juin 1944.

27- Çîrokbêj: Rovî û gur, Hej.27, R. 2-3, Sept.-Août 1944.

28- Celadet: Dêra rebenê, Hej.27, R. 7-9, Sêpt.-Août 1944.

29- Çîrokbêj: Kîso û kivroşik, Hej. 28, R. 2, Mars 1944.

Çîrçîrok

1- Erfat: Xwe ji bavê xwe vedizî, Hej.7, R. 7, Octobrê 1942.

2- M. Beşîr Hesênî: Rê ji ber winda, Hej.17, R. 32, Août 1943.

3- Evdilêzîz Mêtwar: Girava jinan û girava mêran, Hej.17, R. 25, Août 1943.

çîrokên amadêkirî (Wêrgîraw)

1- Celadet: Ji ê mêtîr ra, Hej.8, R. 8-9, Novembrê 1942.

2- Celadet: Xwe kuşt ya hate kuştin, Hej.9, R. 16-17, Dêcêmrê 1942.

3- Celadet: Maçêkên ko mirov pê dinivîstin, Hej.10, R. 3-5, Janviêr 1943.

4- Hesenê Mistê: Di nav mirovên însanxwêr da, Hej.14, R. 41-15, Mai 1943.

5- Cêmsîd (Celadet): Timsahên hêftî, Hej.16, R. 15, Juillêt 1943.

6- Dilawêr Çarpînê: Nêçîreke pilingan, Hej.22, R. 15, Janviêr 1944.

7- Efsanêbêj (Celadet): Masiyê bi rastî, Hej.22, R. 16, Janviêr 1944.

8- Samaînê Sêrhêdî: Ziyarêta Mêlikê Misrê, Hej.27, R. 3, Août-Septembrê 1944.

9- Silêman Ferho: Qewreşa General (Ji çîrokên Casûsî), Hej.28, R. 4, Mars 1945.

10- Herekol Azîzan: çîra zanînê (Ji çîrokên yonanistana kevin), Hej.28, R. 22, Mars 1945.

**Bîblîografya û
Çîrokên
Roja Nû (1943-1946)**

çîrokî hunêrî

1- Sibhiyê Diyarbekirî: Temo û Çeleng (1), Hej.23, 4 novembrê 1943, R. 2.

2- Sibhiyê Diyarbekirî : Temo û Çeleng (2), Hej.24, 18 çîrya novembrê 1943, R. 2.

3- - Kamuran Bedirxan : Du nêçîrvan , Hej.35, 17 Janv. 1944, R. 4.

4- Brahîmê Mêtîni : Kurd û Mêhkêmê, Hej.37, 31 janviêr 1944, R. 2.

5- Qedri Can : Muhra Silêman, Hej.39, 21 Şibat 1944, R. 4.

6- Brahîmê Mêtîni : êz tê nê ma dikim, Hej.45, 17 avril 1944, R. 1.

7- Kamuran Bedirxan : Pîra sêhirdar , Hej.45, 17 Avril 1944, R. 2., Bêşî 2m: Hej.46, 1 Mars 1944, R. 3.

8- Silêmanê Hesenê Mercê : Qemerze-man (1), Hej.46, 1 Gul 1944, R. 4.

9- Silêmanê Hesenê Mercê : Qemerze-man (2), Hej.47, 8 Gul 1944, R. 4.

10- Silêmanê Hesenê Mercê : Qemerze-man (3), Hej.48, R. 4.

11- Qedri Can : Nêçîra berazan, Hej.48, 15 Gul 1944, R. 2.

12- Silêmanê Hesenê Mercê : Qemerze-man (4), Hej.50, 16 Tîrmeh 1944, R. 2.

13- Silêmanê Hesenê Mercê : Qemerze-man (5), Hej.52, 30 Tîrmeh 1944, R. 2.

14- S. Hesenê Mercê : Ûsîfê tenbûrvan (1), Hej.54, 13 Tîrmeh 1945, R. 2.

15- Silêmanê Hesenê Mercê : Êsifê tenbûrvan (2), Hej.55, 3 septembrê 1945, R. 2.

16- Brahîmê Metînî : Jin û mêrik, Hej.55, 3 Septembrê 1945, R. 7.

17- Silêmanê Hesenê Mercê : Feqîr 'êlî (1), Hej.61, 5 novembrê 1945, R. 3.

18- Silêmanê Hesenê Mercê : Feqîr 'êlî (2), Hej.63, 26 novembrê 1945, R. 1.

19- S. Hesenê Mercê : Feqîr 'êlî (3), Hej.64, 17 decembrê 1945, R. 3.

çîroka Kirmancî

1- Brahîmê Seyda: Çîroka Rovî û Jîjî, Hej.10, 5 Tîrmeh 1943, R. 1.

2- Mehmûd Omerî : Rovî û Gur, Hej.35, 17 janviêr 1944, R. 1.

3- Husniyê Merzêkî : Tîfî û fîl, Hej.41,

13 mars 1944, R. 4.

4- E.S.: Serborik (Paşa û berdevkê xwe), Hej.42, 26 Mars 1944, R. 4.

5- Îbrahîmê Seyda : Serpêhatî, Hej.50, 16 Tîrmeh 1945.

6- (Kamuran Bedirxan) : Ez jî ji cehe-nemê têm, Hej.55, 3 septembrê 1945, R.3.

7- (Kamuran Bedirxan) : Kew û rovî, Hej.55, R.3.

8- Kamuran Bedirxan : Mela û gundî, Hej.55, R. 4.

9 Kamuran Bedirxan : Şîfikahiya dîk û rovî , Hej.55, R. 4.

10- (Kamuran Bedirxan): Hekîm û sê keçik "1", Hej. 56, 24 septembrê 1945, R. 2., Beşî 2m: Hej.61, 5 novembrê 1945, R. 3.

**SIWARÊN
ÊŞÊ**

ROHAT

Di van salên dawî de li derveyî welêt bi zaravayê kurmancî carcar em dibînin berhemên gelekî baş têne weşandin. Em di nav van berheman de rastî nimûneyên hemû tehrên edebî tîn, wek; roman, kurteçîrok, lêkolîn, bîranîn, notên ger û seyranan. Yek ji van berheman jî pirtûka Fawaz Husên e ku berî çend mehan li Stockholmê bi navê *Siwarên Êşê* hat weşandin. Pirtûk ji çend kurteçîrokên pêk tê. Nivîskarê pirtûkê Fawaz Husên bi xwe kurdekî Sûriyê ye, gelek salên xwe li Parîsê derbas kiriye, xwendina xwe ya bilind li wir qedandî ye û niha jî li Stockholmê dijî.

Piraniya kurteçîrokên Fawaz Husên li ser jiyana xerîbiyê û encamên vê jiyana ne. Li alîkî Parîs, nişana mode, gulav, bînen xweş, melhem û kremên bedewiyê, dans, coca-cola, lêvên sorkirî, xatûn û xanimên ber neynikan. Li alîkî jî Amûd, nişana belengazî, zordestî, leşker, lêdan, rev û êş... Di jiyana

mirovêkî de afet û felaketa herî mezin bê daxwaz ji welatê xwe dûrketin e. Bi salan li welatekî xerîb wek "mêvan" mayin, eziyeteke herî giran e.

Di kurteçîrokên Fawaz Husên de tişteki bala mirov dikşîne, psîko-dînamîzma jiyana xerîbiyê ye, serobî-nobûna jiyana mirovan e. Şaş-metalî, kerr û gêjî û bêgavî dibe forîne jiyana van kesên belengaz. Ev mirov hem dixwazin vege- rin welatê xwe û hem jî nika- rin; ew di navbera du avan de dimînin, nizanin çi bikin. Bi kurtî ew mecbûr in heta roja mirinê jî, xerîbiyê wek barekî giran bi xwe re bikişînin. Mirov xerîbiyê wek êşekê jî dikare bi nav bike, ev peyva bûye beşeke navê pirtûka Fawaz Husên: *Siwarên Êşê*. Ev nav wisan jî bûye navê kurteçîroka pêşîn, peyva *êş* di çend cihên din de jî derbas dibe.

Di piraniya kurteçîrokên Fawaz Husên de xerîbiyê wek êşeke mezin cih gir- tiye. Çend kurdên ku li Parîsê dijîn, çawa em di vê pirtûkê de dibînin, êdî nîv- sax in û nîv-mirî ne. Ev kes bi salan li welatekî xerîb mane, lê belê hiş û mêjiyê wan li cihekî mayîn e. Bin- şîurê wan bi bîranînen za- roktiyê û ciwanîyê ve tijî ne. Hêvî, daxwaz, bîranînen

van salan demekê dikarin bînen jibîrkirin, lê belê ew winda nabin, hatine givaştin, li ser hev lod bûne û di beşekî mêjî de, di bin şîurê wan de hatine de- pokirin, ew timî jîndar in. Dema mesajên gazinkirinê peyda dibin, di vê depoyê de dînamîzmeke mezin peyda dibe, careke din ev bîranî- n ji cihê xwe dilivin û dileqin, ew mîna *non-stop* tim ber- dewam in.

Fawaz Husên di çend kurteçîrokên xwe de xwe gi- handiyê beşeke mêjî, hişê van koçeran, dinya û jiyana wan ya hundurîn bi me dide naskirin. Bi alîkariya kîjan mekanîzman gelo Fawaz Husên jan û êşên van miro- van yê hundurîn tespît kiriye? Dema mirov kurteçîrokên Fawaz Husên dixwîne, mirov dibîne ku wî bi taybetî ji xwe re wek ma- teryal sê tişt hilbijartine; *xewn*, *xewneroj* û *bîranîn*. Ew kesên ku xerîbîstanê dijîn tenê bi saya van mekanîzman dikarin xwe îfade bikin û piçekî ji wê êş û jana xerîbiyê bi dûr bike- vin, vala bibin. Êşa herî mezin bêguman hesreta vege- rê û welêt e. Ji ber vê yekê jî, piraniya kurteçîrokên Fawaz Husên bi naverokeke nostaljik ve hatine nivîsîn.

Di dawiya pirtûkê de

keseke (belkî nivîskar bi xwe ye jî) dixwaze bi xwendevanan re bikeve nav çend giftûgo û galgalan. Ev beş an jî kuteçiroka ku *Seriyê ku her dem ji bîr dikir* hatiye bi nav kirin, wek kurtebehseke vê pirtûkê jî dikare bê hesibandin. Tirs, xof, êş û jana ku dest ji pêşûra mirov bernade, di vê beşê de tê analîz kirin. Ev beşa ku wek paşgotinekê an jî wek apendixekê hatiye amadekirin, serobinbûna jiyana mirovên koçer bi vekirî eşkere dike. Dawiya vê pirtûkê wek dawiya jiyana vî mirovê *rêşaşkirî* ye. Çawa em dibînin *Siwarê Êşê* êdî serê *hespê* berdaye û nikare careke din wê bi dest bixe. Ez bawer dikim ku di jiyana mirovan de ji vê rev û rêwîtiya bêserî xerabtir tu tişt tune. Tabloya Edvard Munch ya bi navê *Qirîn* ya ku li bergê pirtûkê cih girtiye, vê perîşaniya xerîban gelekî bi vekirî sembolfîze dike. Dema mirov pirtûkê dixwîne, diqedîne û bergê pêşîn mêze dike, mirov dikare bêje ku êdî agir bi Parîsê ketiye û Parîs dişewite.

SAZEK JI ÇAVÊN KURDISTANÊ RE

Fethulla HUSEYNÎ

Gava nivîskarek bixwaze li ser berhevokek helbestên nû binivîsîne, ne girîng e ku timî bi çavên kîn ên reş rûpelên wê li hev bide, wêneyên qenc û bilind hilnegre, wan veşêre û bikuje. Herwekî tete zanîn tu kar û berhem bê kêmasî nîn in, ji lewra nivîskarê li ber berhemeke toreyî raweste, divê bi kêmasî bigihêje asta çavênê eyan yê ku li herdu layên dahênanan dimeyziîne. Ji van xêzên jorîn ez naxwazim nêzîkî berhevan bibim, ku yê xwendevan tu sudeyê jê nebîne û di pey re bexçê toreyî av nede, ne ji nêzîkî û ne ji dûr.

Ji ber wisa ez ê li dergehê mirovatiya diyarkirî bidim, ev hundurê xwe bi xurtî eşkere dike û hemû bendan diçûrîne, bê ku li ronîya sor bipirse û bê ku li hêviya şewqa kesk bimîne. Bêguman Jan Dost dest pê dike ji kul ûxemên ku bûne razin veşartî û tê de diçe ta

dawiya tehliya xwe ya hundurî ya ku di sînga wî de xwedî bûye, ta mezin bûye û cih girtiye. Ev bi xwe hestê helbestvanekî dûr e, ango di reşiya dûriyê de dijî û dûrbûn bi xwe menfaye û çiqasî xweş e/ û ne xweş e ku yek ji derveyî sînorên çêkirî binivîsîne, li ser rewşa welatekî jibîrkirî, milletekî wendayî, kar qedexekirî û li ser bobelatin beravêtî.

Jan Dost hemû helbestên vê berhevokê ristiye û ew bi bendên rojên reş ve girê daye. Ji lewra tu wî dibîne beriya her tiştî ji azadiyê re distirê û bi zimanekî tîfingê her diaxife, ta dikeve hembêza evîna germ. Û kîjan evîn? Evîna Helepçeya sermedî, di dil de bîranînên Kurdistanê vedigerîne, heta wêneyên wî yê helbestî mîna pelê daran di nîva payizê de hêdî-hêdî dikevin:

*Teşîrêse were tu rehê min
rehê vî dilê min
bike ta
birêse
birêse
bike destmal...*

*tu pê hêsrên çavên
Helepçe vemal. (R. 27)*

Û di helbesta ÎŞQ de JAN avjeniyê di navbera helbestên dildarên welat de bi xurtî dike, gene xwe dûrî seqema berfa sar bikin:

Di sermê de

di rojên pûk û berfê de
Li zozanên bilind û sar
dimîne partîzan bê ar
belê germayê distîne
ji lêdana...

dilê işqê welat tê de (R. 32)

Ji vê ahenga pêçayî bi keser û ahînan, tevî hisretên xwe dide hundurê xwendevan. Bi danheva wî ji navin pîroz û bi hebûn re, ev jî dikeve coka hezkirina windayî, di navbera salên 1988-1991'ê de ya ku timî lê digere. Ew jî dema nivîsandina JAN ji van helbestan re ya ku wan diyarî çivîkên nikilşewitî kiriye. Piston û Ormiya, Agirî, Laleş, Ilelebeç, Amed, Ferhad, Memo, Şêrîn, Zeradeşt, Ahûra, Babagurgur û hwd... Ev dihêlin ku çemê wî yê helbestê bigihîje deriyaya neteweyî, her avjeniyên û mêvan dikirin li ber bayê pêlên wî bileyzin û feryadên wî pê re bi awaz û newazan bibêjin.

Ji cilên xwe yê kesketarî, pêşmergan di bîra xwe de tîne, dixwaze di sînga xeleka dîlanên wan keve, li wê derê cihê Babagurgur, ta bi wan re ala serketinê hilgire:

Tenê arê Babagurgur
Weke aleke sor bihişt
da ku pêşmergan li ber ro-

nahiyê

teva govend bigeranda. (R. 13)

Û tevî wisan em bi Jan Dost re li ser sozeke rast dimînin, wekû (Bavê Siyabend) dibêje û rastiya wî bêhtir diyar dibe, di nivîsandina wî de, ji min re "Çavên Kurdistanê min du gul in, ji hêşir û nalînan, ez bi xem ji wan re distirê".

Belê JAN, ji çavên xweşik re bistirê, ji ber tu di rekeha helbestê de yî û em tev di gola xwîna reş de ne. De ka em bi hev re bînin bîra xwe: "Her sibeh çaxa Kurdistanê ji xew radibe, dest û rûyê xwe dişo, ne bi avê, lê bi xwîna pakrewanan. (R. 33)

Û li gel wisa Sazek Ji Çavên Kurdistanê re dimîne navekî nerm û hembêzkirî, durrî xirecir û kînan. Di dawî de dixwazim bêjim ku ev pirtûk ji 88 rûpelan pêkhatîye û bêtirî 20 helbestan tê de heye. Pirtûk bi zimanên kurdî û erebî hatiye nivîsîn. Ji van xêzan ez dibêjim pîroz be dîwana hevalê helbestvanan JAN DOST. Ji ber ku ev pirtûka han bexçê dahênanî av dide û di vê dema zuhabûn û hişkbûnê de çiqasî avdan xweş e.

7. 5. 1994, Heleb

PALA BÊŞOP

Lokman POLAT

Di edebiyata Kurdî de, herî qelsî xwe di hêla romana Kurdî de nîşan dide. Li gor pirtûkên çirok û helbestan, pirtûkên romanên gelek kêr in. Romanên Kurdî bi tiliyan tîn jimarîtin. Herçiqas pirtûkên çapbûyî yê helbest û çirokan kêr bin jî, li gor romanên Kurdî zêde ne.

Lê îro di vê rê de çend nivîskarên nuh dimeşin û romanên Kurdî dinivîsîn.

Xemgîn TEMÊ jî yek ji van nivîskarên nuh e ku bi Kurdî roman nivîsandîye. Navê romana ku Xemgîn Temê bi Kurdî nivîsandîye "Pala Bêşop" e. Xemgîn Temê ev romana xwe di sala 1983'an de nivîsandîye.

Romana ku Xemgîn Temê nivîsandîye di nav weşanên SARA da hatiye weşandinê.

Mirov ji bo pirtûka Xemgîn Temê "Pala Bêşop" dikare bibêje kurte romanek e. Pirtûk 76 rûpel e. Mizampaja pirtûkê gelek baş hatiye çêkirin. Bergên pirtûkê pirr xweş e. Wêneya bergê pirtûkê Z. Hesîp çêkiriye. Ev wêne, berê di

bergê kovara Nûdem-
hejmar 7- de hatibû
weşandinê. Wêne bi xwe
gelekî balkêş e.

Weşanxaneya SARA bi
sernivîsara "*Çêla berxweda-
nek ji kêrahiya evînî û
zanabûna keça Kurd*"
pêşgotinek nivîsandiye. Di
pêşgotinê de tete gotin ku:

—«*Di Pala Bêşop'ê de,
çêla keça Kurd a zana û dilo-
van Xebatê, çêla berxweda-
nek ji kêrahiya evîn û
zanebûna hişyariya netewî
ye.*»

Tema romanê bi kurtayî li
ser jiyana di gundekî Kurd -
ku li serê sînor e- de ye.
Navê gund Tilêlon e. Di vî
gundî de pîr tişt diqewi-
min, gelek bûyer çêdibin.

Xebat keçek jîr û zana ye.
Wexta zewaca wê tê. Diya
wê jê re dibêje:

"*Tu di mal de mayî. Tu pîr
buyî û kes ne hatiye ku te
bixwaze.*"

Lê, Xebatê qûma xwe bi
xortan nedianî. Wê nedix-
west ku bi xortekî sivik û
beredayî re bizewice. Wê
dixwest bi xortekî jîr û zana
û xwende re bizewice.
Xebatê dibistan xwendibû.
Gelek pirtûk dixwendin.
Gelek helbestên Melayê
Cizîrî, Ehmedê Xanî û
Feqiyê Teyran jiber kiribû.

Fatimê cîranê mala Xebatê
bû. Bîrayê wê Azad tê gund,
tê mala zavayê xwe. (Mala

Azad li bajêr e). Xebat û
Azad hev û du dibînin. Dilê
wan dikeve hev û du. Ji hev
hez dikin. Evîna wan di nav
gund de belav dibe.

Xebat ji bo ku keçek
hişyar e û gelek zana ye, bi
Azad re vekirî diaxife û jê re
dibêje:

—«*... Ez naxwazim ku di
nava xelk û alemê de paşê
fedîkar û bextreş bibim....
Ez ne ji wan keça me ku xort
bî min bileyizin û dawî jî,
bav û birayê wan, wan buki-
jin.... Heger tu dixwazî em
bigêhin hevdû û em bibin
yên hevdû, divêt tu soz û
peymanekê bidî min û
xwediyê soz û peymana xwe
bî.*»

Azad jî dibêje:

—«*... Ez naxwazim ji
alîyê min de tu bikevî şikê.
Ez ne kesekî welê me te
bêbext û rûreş bikim... Ez
soz û peymanê didim te, ez
çi carî te poşman nakim.*»

Demek derbas dibe. Evîna
Azad û Xebatê her diçe dil-
germ dibe. Dan û standinên
wê û Azad bêhtir dibe. Hemû
gundî pê dihesin ku wan dil
girtibû. Dengê çîroka evîna
wan çûbû ketibû guhê bavê
Xebatê jî. Bavê wê pê re dia-
xife û dibêje:

—«*... Te û Azad we dil gir-
tiye. Hân di nava devê wan
de bîne benîşt... Madam
Azad ji te hez dike bila bê te
bixwaze.*»

Azad li bajêr dijiya.
Mehek di gund de li cem
mala xwişka xwe dimîne û
paşê diçe bajêr. Dema ku
Azad diçe, ji Xebatê xatir
dixwaze û soz û peyman dide
pê ku dê bavê xwe bişeyîne
û wê bixwaze.


Havîn buhurî, payiz hat,
lê dengê ji malbata Azad
derneket. Çavê Xebatê li
riya Azad û malbata wî bû,
ku bihatana wê bixwestana.

Paşê çi bû? Çi bûyer hate
serê Azad?. Çira Azad girtin
binçav? Paşê çawan Azad
hat kuştin?. Ez van tiştan
nanivîsînim. Ji bo ku
xwendevan meraq bike û vê
pirtûka Xemgîn Temê "*Pala
Bêşop*" bixwîne, loma min
dawiya vê kurteromanê bi çi
awayî diqedî, nenivîsand.

"Pala Bêşop" pirtûkeka
xweş e. (Ev hêj destpêk e.
Ger Xemgîn Temê hewl bide
xwe û hinekî jî bixebite dê
hîn berhemên baş
biafirîne.) Naveroka wê ne-
teweyî û cîvakî ye. Zimanê
nivîskar sivik e, zelal e û
vekiyê. Gotinên zor û ne-
famkirî tede tunene. Yênu ku
ji xwendina çîrok û roma-
nan hez dikin, divê pirtûka
Xemgîn Temê "*Pala Bêşop*"
bixwînin.

19-7/ 94

BIBE ABONEYÊ NÛDEMÊ!



Ger hewesa te li ser helbest, çîrok, roman, rexne, hevpeyvîn, lêkolîn, huner, sînema û hwd. hebe, pêşniyareke me heye; bibe aboneyê NÛDEMÊ!

Ger tu dixwazî ji tevgera huner û edebiyatê ya herçar perçeyên welêt haydar bibî û edebiyata dinyayê ya kevnar û nûjen bi zimanê kurdî bixwîni, dîsan bibe aboneyê NÛDEMÊ!

NÛDEM dixwaze ji avakirina edebiyata kurdî re bibe alîkar, tu jî alîkariya wê bikî, bibe abone!


Ez dixwazim ji avakirina edebiyata kurdî re bibim alîkar. Ji kerema x we re min bikin aboneyê NÛDEMÊ.

Ji bo Swêd salekê 190 Skr. Welatên din 39 \$

Nav û paşnav.....

Navnîşan.....

Vê karta jor dagirin û fotokopiya wê li ser navnîşana NÛDEMÊ bişînin. Çer ku ew bigihîje me, em ê NÛDEMÊ di gel karta abonetiye ji we re bişînin.



BIBE ABONEYÊ NÛDEMÊ

NÛDEM
No 11 1994